



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 7 Hejmar - 35
Sermawez - Berfanbar 2010

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elixan LORAN

Mizanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Bergê
Arşîva Wyê

Şêwirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: (0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiye
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Xewna bêxçe - **Kawa NEMIR** / 3
- Nefesek maf - **Welat DILKEN** / 6
- Hilde Domin - **Tengezarê MARÎNÎ** / 7
- Dadgeh - **Îsmail HACANÎ** / 10
- Hobîvan - **Fredric BROWN** / 11
- Ji awirên zaroktiyê - **Rojhat ŞAXÎ** / 13
- Pênc çîrokên mînîmal - **Lokman AYEBE** / 14
- Zêmaran nehûne - **Hecî NEHSAN** / 15
- Arê şîn - **Feratê DENGİZÎ** / 16
- Bang- **Mem FERAT** / 17
- Kartopu Sokak - **Îsmail DÎNDAR** / 18
- Jan dadikeve ser vî bajarî - **Avaşîn BÊKES** / 21
- Dilê te bi min re ye - **E. E. CUMMINGS** / 22
- Molotofkokteyl - **Evdile KOÇER** / 23
- Bêtamî - **Ercan DOĞAN** / 24
- Sê helbest- **Mahmûd YAMALAK** / 25
- Du niqut jiyan - **ar-da JANXWAR** / 26
- Du dilop qehr - **Semra ÇELEBÎ** / 28
- Sê helbest - **Nesrîn EHMED** / 29
- Cemaeta kuştinên razdar - **Înan EROĞLU** / 30
- Du helbest - **Rêdûr DİCLE** / 33
- Dosye - **Şanoya Kurdî** / 34
- Kurtenêrînek li şanoya Daykî Niştîmanê - **Dêrsim OREMAR** / 35
- Bi kurdî şano kirasekî ji êgir bû - **Kemal ORGÜN** / 39
- Charlie Chaplinê kurdan, Şalîkoyê BÊKES - **Mehmet ÇAKMAK** / 42
- Paşxaneya dîrokî - **Muhsîn OSMAN** / 44
- Şanoyê çawa dest pê kir, li ku û çima - **Kawa ŞÊXÊ** / 49
- Kurterexneyek li şanoya kurdî - **M. Emîn YALÇINKAYA** / 52
- Kurtedîroka şanoya kurdî - **Kemal ULUSOY** / 53
- Birîna dilê min - **Ronî PÊXÊLSOR** / 55
- Jînenîgariya Arsênê Reşîr Polatov / 56
- Sê helbest - **Dilşêr BÊWAR** / 57
- Rovî gur û şêr - **Mehmet ONCU** / 58
- Min xewnek dît - **Adnan ÇAKI** / 61
- Wêneyek - **Şengul OGUR** / 62
- Hatîn - **Mehmedxan GULŞENOĞLU** / 63
- Bêhişo - **Xalit TARÎ** / 63
- Mem û Zîn - **Bahadîn ROBAR** / 64
- Sê soneyên evînê ji danê nivroyê - **Pablo NERUDA** / 65
- Ciwanekî 70 salî: Herbîjî - **Munewer AZİZOĞLU** / 66
- Xelata te - **Serhad KANEMİRÎ** / 68
- Bendixane - **Rohat Xemgîn GEVERÎ** / 68
- Rûdekî û hêza helbestê - **Cewad PALE** / 69
- Pemboya perî, pisika mala me ye - **DIYAKO** / 71
- Laçika dapîra Naz - **Fesîh ERDEMÎRCÎ** / 73
- Du helbest - **Zekî KAYAR** / 75
- Bêhna eydê - **Mesûd SERFIRAZ** / 75
- Sepetek hîv û nesrîn - **Hoşeng OSÊ** / 76
- Jiyana nivco - **Osman KAPAN** / 77
- Sê çîrokên mînîmal - **H. Kovan BAQÎ** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Dema mirov li rewşa wêje û gelê kurd û pergala harhar û barbar binihêre û ji ser van parametrayan bifikire, gotina Albert Camusê ku dibêje “Karê min nivîsandina pirtûkan e; dema ku mirov û gelê min bîr tehditkirin ji şerkin e. Hemû ev e.” tê bîra mirov. Albert bi xwe jî dibêje ku “der barê exlaq de ez bi çi zanibim, bi saya serê goga lingan e.” Îcar camêr radibe exlaqê ku stûna karakterê mirovahiyê ye ji goga lingan hîn dibe lê dewleta ku bi lingê xwe yê gemarî nikare were diwanxaneyê kurdan ji galoşdankên mîna TRT altyê çend galoşan dixwe lingên xwe û dixwaze derbasî diwanxaneyê kurdan bibe. Ji aliyê dîtir ve jî sazkarê Artûklûyê jî dibêje “Naezûbillah!” û “bi vê qûşê ew ê negihêjin Mûşê.” Bêguman ji mafê wan kesên ku di guhê gê dijîn e wê wekî pêşketinekê an jî şoreşekê bi nav dikin. Şoreş, Agir Adarê Pîrsûsî ye ku ji polîsan re dibêje “ez bi tirkî nizamim”, şoreş li Geverê ye, şoreş Azadiya Welat e ku çendî xebatkar, belavkar, nivîskarên wê hatibin kuştin jî hê jî li ser lingan e.

Qanihbûn marjînalbûn e, bi sînorbûn e, biryara xeniqînê ye! Îro roj heke Artûklû jî bo beşa wêjeya kurdî xwendekarên lîsansa bilind bistîne dê ev di devê dewletê de bibe benîşt û dê tu carî Perwerdehiya Bi Zimanê Kurdî neyê rojevê. Ji ber vê hinde jî lîsansa bilind li pişt dewletê radike û perwerdehiya bi zimanê kurdî jî diçe ber golikan. Me berê jî dabû xuyakirin em ê niha jî dubare bikin, kurt û kurmançî kesên ku çavên wan li Artûklûyê ne bila ji dêvîla Wyê jî xwe re li aveke din bigerin. An kew e yan xew e û her kes azad e di fikirên xwe de! Derew û xapandinên AKP’ê û POLîtîkaya dewletê yek bi yek aşkera dibin.

Jixwe têra xwe eyan û beyan e ku boykotkirina dibistanan adrenalîna dewletê zêde kir û li ser eniya wan xwêdaneke zîpîk zîpîkî çêbû. Dewlet jî dizane darikê kurdan û yê wê encax di meseleya dibistanan de jî hev bişikên, ji ber ku perwerdehiya bi kurdî kincê dewletê bi avê de berdide. Ligel van tiştan wa ye bersûcên(?) KCK’ê xwestin xwe bi kurdî biparêzin lê dadger û dozgeran nehiştin ku ev daxwaz bi cih bêt! Ji ber ku ev doz dozeke siyasî ye, dadger û dozger jî dizanin parastina bi kurdî jî bo dadgehê -ku mirov bi zimanê zarokan bibêje- bîvîkê ye. *Lê me li ber xwe da, em li ber xwe didin, em ê li ber xwe bidin.*

Vê hejmarê jî jixwe dosyeya me li ser “Şanoya Kurdî” bû. Me xwest em “Şanoya Kurdî” qet nebe bînin rojevê. Û di vê hejmarê de jî em CD’ya “Mala Dînan” an jî “Mala Extiyaran” a ku berhemê Koma Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ye ji wekî diyarî bidin xwendevanên xwe. Û me xwendevanên xwe yê li girtîgehan jî ji bir nekirin, ji ber ku girtîgeh CD’yan qebûl nakin em jî dêvîla CD’yê pirtûka “Mala dînan” û ya “Mala extiyaran” a M. Emîn Yalçinkaya wekî diyarî didin xwendevanên xwe yê li girtîgehan. Di vê hejmarê de jî bo ked û alîkariya wan em spasîyên xwe pêşkêşî Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û zimanhez birêz Hecî Haspolat dikin.

Di hejmara borî di hevpeyvîna ku Lal Laleş bi Kawa Nemir re kiriye de, di pîrsa dawîn de jî ber pîrsgerêkeke teknîkî bersîva Kawa Nemir qut bûye. Awayê qutnebûyî wiha ye,

“L.L: Çawa gotî, destpêkên me bi dawiyên me nizanin; em bîr di peyvê re derkevin! Tu wekî helbestkar, nivîskar, wergêr û edîtor, lê beriya hemûyan jî wekî helbestkar, mebesta jiyana te peyva te ye. Jêderkên peyva te çi ne?

K.N: Ez kurt lê xim! Dêsta min a dîr e; Îdira zarokatiya min e. Stenbol e; bajarê bédawî. Jîna min e. Jana qerase ya ku ez pê re zewicim. Kurê min e. Diya min e.”

Ji ber vê pîrsgerêkê em jî Lal Laleş, Kawa Nemir û xwendevanên Wyê lêborîna xwe dixwazin.

Meha borî du kedkarên ziman, wêje û dîroka kurdî Torî (Kemal IŞIK) û Îsmail GOLDAŞ jiyana xwe ji dest dan. Wek Enstîtuya Kurdî ya Amedê û Kovara Wyê em spasdarê keda wan in û em dibêjin; serê malbata wan û gelê kurd sax be. Em ê her li ser şopa wan bin.

Ji mîj ve bû ku me dixwest em dosyeyeke berfireh li ser “Têkiliyên wêje û polîtîkayê, wêjeya polîtîk” amade bikin. Va ye dema wê hat. Em jî hemû nivîskar û xwendevanên xwe dipên ku bi xebat, nivîs, pêşniyaz û wergerên li ser vê babetê beşdarî vê dosyeya me bibin. Ji bo dosyeya “Têkiliyên wêje û polîtîkayê, wêjeya polîtîk” herî dereng heta 15.12.2010’an nivîs bigihên me, em ê kêfxweş bibin.

Di sa bi heman awayî **Dosyeya Adar-Avrêla 2011’an “Li Ba Jinan Wêjeya Kurdî” ye. Herî dereng divê heta 15’ê Reşemîya 2011’an nivîs werin ber destên me.** Kesên ku dixwazin beşdarî dosyeyên me bibin bi awayekî xwe bigihînin me û haya me pê bixin em ê kêfxweş bibin.

Daxwaziyeke me ya din ji nivîskarên me heye, berî ku nivîsên xwe bişînin carekê be jî ji aliyê rastnivîs û mantiqa jiyane ve kontrol bikin dê gelekî baş be. Û wekî prensîb nivîsên ku berê di cihekî de hatine weşandin -malper û bi taybetî jî Facebook - em nawêşînin. Em hêvîdar in ku ev xal jî dê di bîra nivîskarên me de be.

Û em dibêjin ku Cejna we ya Qurbanê pîroz be. Bi hêviya ku êdî dilopek xwîn nerije!

Li benda azadiyê bin!

Xewna bêxçe

Kawa NEMIR

Van çaxan, kevokên beyanî li ser berfa wekî kevirê pûk tirsêtirs pê dikevin li ber lodên gihê, yan jî di nava qerselê de li çend lib genim digerin. Çend libên ku li ber nikulên wan ên reş dikevin reşreşkîn in. Reşreşkîn bin jî, heke du sê liban bixwin, heke bi pisika jar î spî ya li ber sêncan teliyayî zû bihisin, ji nişkê ve per û baskên xwe ji qeşaya berbeyaniyê dadiweşînin, pêk ve bi firê dikevin, diçin li kevirên qewartî yên xaniyên Hayan datînin.

I

Tariya ku ketiye milê spîtiya berfa kurşe, quncikên nepenî yên di nava daran de disû. Her wekî zimanekî deriyekî darîn ê ji mēj ve girtî bi ser bēden-giya tîr de bizivire, wateya bēdengiyê ji berevajî de ji nû ve ava bike, dizivire û bayê sar xwe pizevedike. Giyanê peyayekî ye, ku ji mēj ve ye mirî ye - çik û çirûsk ji şûrê wî yê rewneqdar diçe û sergeveziya wî jî, ji berê û paş de ji wê yekê tê - di ser hemû war û girikên li bêxçe re gav dike. Nayê zanîn bê ka kê ew hildabû biribû xistibû nava deryaçeya xwînê; tiving, pelesqe, cil û bergên wî yên xakî, potinên wî yên her di heriyê de çikiyayî û giran û kumzîrxê wî lê giran hatibûn, peya bi mirina ku bi kesên li ber sikratê ne şêrîn tê şa bûbû, di nava hêwirzeya serdema xwe de xeniqîbû, cendek lê bûbû def, bûbû xurê kurmik û kêzikan. Nayê zanîn bê ka kê ew peyayê bextreş li wê dera hanê, li naverasta baxçeyê ku her diçe li ber çavên zarokekî pozxîtîk berfirehtir dibe, veşartibû. A rast, ji wî peyayî bi xwe û pê ve, haya tu kesî ji bayê Felekê tune, ku peyayekî wextekê ruhşêrîn bû li vê derê, di nava reh û rişên darên reş, spîndar û qeleme û darebiyan de bêhnna xwe vedide. Havîn be, dema ku yek rabe bi roj berê xwe bide Mala Qudretê, pişta xwe bide

xaniyê ku bi kevirên reş ên ji çiyê anîbûn lê kirine, bi qasî sed mêtroyan bi dengê çirpîniya çilpî û gêziyên hişk û şaxên ji sala çûyî de ji daran ketî û hişkbûyî yên di nava bêxçe de bimeşe, ji cihoka ku tixûbekî ji dehlê re çêdike û bi wê de dest pê bike spîndar û darebiyên hêşîn bir bike, ew ê hema, ne kêr ne jî zêde, di naverasta vî biwarî de, rasterast li ber gewdeyên stûr ên daran, bi qasî ciyê dirêjbûna bejna mirovekî, erdekî tepbûyî peyda bike.

Heke yek li bîranîna baxçeyekî wiha, ku li ser zikê tehtewêlkî yê deşteke bê payan mezin, hema bibêjin, li çolistaneke sorgezê hatibe hêşînkirin, bikole, ciyê baweriyê ye ew ê nikaribe bigihîje çu agahiyeke ku bi kêr bê. Ji ber ku 'zîlamên vê derê' ji berê û di paş de ji bîr dikin; ji bo ku bijîn, ji bîr dikin; ji bo ku xwe têr bikin, xwarina ku duh xwaribin ji bîr dikin; ji bo ku bikaribin bi kêr, xencer û soraniyên timî tûj rabin rikêfî hev bikin û ji bo ku bikaribin ne li tu devereke zemên û mekên xwe star bikin, tu carî û tu carî nivîs û belgeyên ku bikaribin govaniya afirandineke wan a çawalêhato bikin li dû xwe nahêlin.

Duristkirina wateya vî baxçeyî jî, bo kesekî dahatûyê, bo kesekî ku bikaribe pêşiyê bînahiya xwe biparêze, paşê bini-vîse û tomar bike hiştine.

Ev zîlam jî, her wekî koremişkê çîroka wî mêrikê sercûcîk î tengezar bi awayekî bê na di hundirê gējgerînkî qul û qewêrên hêlîna xwe de bi salan here were, -wekî hûn ê tê derxin bê çendî dijwar e yek rabe çîroka sebr û arama koremişkekî ku bê westan û rawestan dikole bi-bêje û binivîse - ev zîlam jî, çav li rê qerimiye yek rabe bi ser tariya ku ketiye milê spîtiya berfa kurşe de mûmekê vêxe û dest pê bike xewna bêxçe gilî bike.

II

Deşt sebr û arameke bêpayan î bêna dixê dilên zîlamên van deran. Deşt li ber û berê xwe dimeşe, digindire, hol dibe, di navbera palên çiyayên li başûr, rojhilat û rojavayê girtî û çemê ku bi şandilxwazî û bi dilê xwe bi bakur ve hildikişe de diheje, vediheje. Xewna zarokan e, ku bihîstibin trênen dirêj î dirêj hene, mîna pêlîstokeke ku li hêwaneke germ, li ser xaliçeyê Herkî gerî gerî çivan bide xwe, li ser şiveriya xwe ya hesin meydanê bike, di nava dehl, bax û baxçeyên deştê re diçin xwe li tixûb dixin. Lê belê li deşta ku tê de bêdengiya li ber tavê bi berdewamî disincire, paşê dihele, derbasbûna trênekê ji xewn e mîna baxçeyên wê. Zarok bi sê dengên gazî hev dikin, kom bi kom, li dû pehniyên xwe yên bi toz û gerdê ve çûyî berê xwe didin dirêjtirîn şirîta ku ji rojava de dagêr dibe tê, li ber û berê zikê deştê û di nava bêhna hirmî, sêv, gêlaz û bostanên mezin re hêdî hêdî vêsa xwe digire, paşê ber bi berpālên çiyayên li başûr ve hilgêrî bilindahiyên dibe; wekî garanekê ku bi bayê bezê ji tap û berpālên zozanekê de xwe di çemê li jêrê wer bike, berê wan jî li wê riya wekî şirîte ye, ku bi navê xwe *Riya Natoyê* ye, piştî ku ew ji poz dikute riya xwe ya bilind, xwe li tixûb dixê, di nava Kardox û Agirperestan re derbas dibe, qonaxa xwe ya bi roj û mehan hildide dibe heya Îran û Tûranê. Tenanet şahî û mihricana piyên xwas ev rê ye, ev riya ku deşt ji binê zemanan û vir ve ye kiriye du par; para pêşîn a wî qewmî ye, ku jinên wan şayanî behsê ye di çaxên xwe yên xamatiyê de bi bedewbûna xwe ve ne kêmi keç û bûkên cin û periyên in, lê di heyama pîrbûna xwe de her yek bi têra xwe kok dibe, goşt û bez digirin, ku bîzê mirov naçe li wan binihêre; zimanê ku dipeyivin jî, tixûban datîne ji para duyên re, ya ku bi giranî li başûrê vê riya şirî, li nêzikî serdeşta çiyayên li hawîrdorê dêmanî ye. Ev qewm, nexasim ev qewm, ji qal û belayê de bi hebûna xwe ve tune ye, ji xwe re zivir e, tu tevkarîya wî di avabûna deriyên şahane yên qesr û qonaxên Heyna Babilê de tune. Balkêştirîn û beloqtirîn xeyseta wî qewmê ji ahenga

zimanê xwe aciz ew e, ku ji bîr dike. Qesirbendiya ku ji bav û kalan girtibe ji bîr kiriye, berat û fermanên bi mohra şimayê hatibin mohrkirin daye ber talana ku bi xwe ji sêrî de hîn bûyê. Berbiçavtirîn taybetiya wî qewmî ew e - ne wekî cîranên xwe yên biyanî yên li Bakur - ku tu navên daran û gulan nizane. Tenanet şarezatiya wî qewmî ew e, ku dikare sarcîn û qelaxan çêke. Ka kî pê dizane ku bêhna mirî ya zerê kayê û reşê qerselên şil û rêxa genî ya ku seranserê baxçeyekî kûr î hêşîn vedigire tiştêkî çî qasî mezeloqî ye, ku bi nava salan de diçe, fena ronîyeke tenîsk dinizile bînahiya kesekî ku li wir ji dayîk bûbe û li wir xwe spartibe rehma axa xwe?

Gava ku yekî rabû bi roj berê xwe da Mala Qudretê, piştî xwe da xaniyê ku bi kevirên reş î ji çiyê anîne ava kirine, gava ku hêdî hêdî, li gel kêf û şahiya ku teyr û tilûrên li deştê dixin guhên mirov bi nava naverasta bêxçe de çû, ew ê cîgehê wî peyayê bextreş î bêsiûd î dêran hema di binê erdekî tepbûyî de peyda bike. Beriya ku ev baxçeyê bûyî cîgehê wî peyayî hebû, deşt pêgeha nalên hespên singkûrik bû. Sewta wan dengbêjên kor û beytbêjên ku elama heyamên berê belav dikirin, nedigot ev tixûb e, ev şax û mesîl e, ev jî çol û çiya ye, li ser serê erdê xixîxalî diçû û hey diçû. Wê hingê, remleke xurt hebû ew hoz û binemal giş di zimanekî û zemanekî de digihandin hev. Lîstikên zarokan, mamik, gotinên bav û bapîran semtika li ser hev dihatine nijinandin, çîrok û çîrvanok di nava qiyametê tomarên devkî de dihatin nûrandin. Cisnên hesp û mehînen torin bi rê û zê bi şevan dihatin derevekirin. Qewmê axçikbedew li ber û berê çemên bi xuşxuş û li ser deştên ku poz dikutan xeta asoyê ji xwe re peristgehên xwe yên qewîn ava dikirin, ji rojên pêsirtengiyê û rev û bazdanê re di jêrzemîn û bîrên tarî de zêr û zeber didane hev. Paşê ev qewm giş bi hev re dibûn dûkel, heyamên ku li pey wan diman ji qewmê sereş re dibûn xezîne û define di wan çîrok û kilaman de. Va ye ev peyayê me yê li vir ê morîka xewê ketî guh, beriya guherîneke bi wî rengî bi lez û alozkî pêk hatî, peyayekî

pozberan î enîfireh bû di nava êl û eşîrên vê deştê de, bi navê Dikran dihat naskirin, çav li rê qerimiye yek rabe bi ser tariya ku ketiye milê spîtiya berfa kurşe de mûmekê vêxe û dest pê bike xewna bêxçe gilî bike.

III

Qeşayê, loda li ber derê mala ku bi kevirên reş î ji çiyê anîne ava kirine girtiye, ji çend çivikên ku li ser şaxên darên qeşiyên şelaq û sêvên zivistani qincilê xwe dikin û pê ve çu nîşaneyê zindîtiyê tune. Lod yekane navend e, ku li ser berfa kurşe tîrêjên lawaz ên taveheyva zivistani dikişîne ser xwe. Şeş dagar erdê ku baxçeyekî gur, xaniyekî bi kevirên reş î ji çiyê kişandine anîne ava kirine, sûreke ci bi ci kavi, bi dehan darên fêkiyan ên pîr, gomeke ku tep bûye, pînikeke mirîşkan di navbera derwazeyê hesin î gewr û cihoka ji destpêka bêxçe re tixûb de, xanîkê biçûk î tê de kaniyeke pîça wê şikestî, ku sal pê ve ava wê cihokê dide û li nêzikî wî ji ev loda zêrîn î di naverastê de.

Bêdengî tira berdewamiyê ye li vê derê. Tu dibêji qey destê tu kesî bi vê derê nebûye hîç, tu dibêji qey peyayê ku di binê xweliya bêmovik î bi berdewamî dirije hundirê qoqê sêrî de yekane bûnewer e, ku bê deng û his, bi hebûna xwe ve, li seranserê bêxçe gişî lîs girtiye. Hê ji kes nayê mûmekê bi ser vî girê hilweşiyayî de vênaxe, hê ji kes ranabe deriyê zer î ji dara gûzê yê xaniyê ku bi kevirên reş î ji çiyê anîne ava kirine wiha piçekî dehf nade, awirekî bernade ser vê çolistana sar î spî.

Dêran bi ser wî kesî bikeve di nava xiştîniya xwezaya hişk û dena zivistani de tenê mabe.

“Gelo niha Şehîd serma nake? Êvaran, di vê şeverêşa giran de, ku ji roniya tenik a heyva delal û pê ve çik û çirûsk ji tu tiştî naçe, ew ji çiyê ku tê de dirêj kirine hêdî hêdî radibe, bi her hişyarbûneke wî re jî serê wî li kêlê gorê dikeve û careke din li xwe hay dibe, wekî yê mirî ew bi xwe ye, di nava sixletiya darên bejnîlind de agirê xwe dadide; mûma xwe vêdixe. Lê gelo niha Şehîdê me dîsa serma nake

qey?” serî di nava her du destên biçûk de, li ber pencereya ji derve ve piçekî qeşa girtî, li ser kursiya kevn î hejhejo ya rûyê wê mexmer rûniştî, wisa di dilê xwe de digot Rizganê heft salî. Di nava spîndarên li pêşberî xênî de, roniyeke tenik xuya dikir; bi hemû layenên xwe ve ev bûyera ku her şeveke zivistana har rû dida li bêxçe, xew li Rizgên haram dikir û vî lawîki watenine nû ji dil xwe de dida vê mûma ku her şev di wexta xwe de vêdike. Ji xwe re kiribû kurm, ji saetê de reng û pê de, piştî ku malî radizan, dihat ber pencereya ku sur û sermaya tûj di keviyên wê re bi dengê tenik gujinî dikir dadiwestiya, paşê kursiya ku bi kişandina pêşîn re çirîniyeke dilşewat û tirsnaq pê diket dikişand ber wê derê, serê xwe yê hebekî mezin dikir nava her du destên xwe, eniya xwe nêzikî şûşeya pencereyê dikir, çavên xwe dikusirande wê devera ku mûmek lê dihat vêxistin. Wê şevê berfê bi milên xwe yên xurt deşt girtibû, movikên bajarê li ser deştê tev de qerisibûn. Şemala heyvê ku dikete ser, wekî camekanên dukanên şev nivê şevê bêne derevekirin û cam û camekanên hûrhûrî li ser berfa kurşe belav bibin, wekî heyveron li wan bikeve, erd dihîsî. Kuçe û kolan vikîvala mabûn. Bajarê giran perdeya bêdengiyê bi ber xwe xistibû. Bîstê Adarê, nivê şevê, seqemeke nebînayî ji hundirê hêwana xênî ve, ji ber germa hundir di cama pencereyê de diheliya.

Diya Rizgên perdeya pencereya odeya xwe ya berê wê bi kuçeyê de ber xist. Berfê dîsa dest pê kiribû. Mêrê wê yê bazirgan hê jî ji Stenbolê nehat. Bi tenêtiya xwe hisiya. Kuliyên berfê li ber ronahiya lempeya kuçeyê dibûn şîn, dadihatîn. Newqa wê jan dida. Duh cîrana wan a Ecem revandibûn Erziromê, ser doxtir. Roviya wê ya kor...

Berê xwe da hêwana fireh.

- Kurê min, te hê pal nedaye?!

Rizgan bi xwe hisiya destê diya wî li ser sermîla wî ye. Ji çiyê xwe liviya, xwe pizevekir, kursiya kevin a bi mexmerekî sor nixamtî kire çirînî.

- Lelê, Şehîdê me îşev dîsa mûma xwe vêxist. Ku tu bi roj diçî nava spîndar û

qelemeyan, ne gorek, ne kêlikek heye. Lê, bi şev van çaxan, meriv ji vir de lê dini-hêre, ew şemal di nava daran de xuya dike.

Keziyên masûlkeyên newqa wê rakişyan. Ji janê duta bû; bi dilpiyarî dest di stûyê Rizgên re bir.

- Kendikê min, ji şehîdan nayê xeberdanê. Nebî tu dîsa bi roj bi ser de herî, pêlî ciyê Wî biki! Heke tu Wî aciz biki, wê bihar dereng bê deştê.

- Lelê, wê sibehê bihar bê, ne wisa?

Diya Rizgên di navbera du çeman de tî ma. Ji kurikê xwe yê heft salî re çi bigota, wekî wî pê bawer bikira?! Malkambaxa Ropo* ceyrana bendava deştê difiroto Nexçivanê, ew her şev di tariyê de diman. Ceyrana taxên eceman qut nedibû. Ew diman, mûmên ku zû diheliyan diman.

Du guliyên xwe yê kej da hev, laçika xwe ya zirav î spî girêda.

- Tu here zû razê, serê sibehê di çîçîka sibehê de rabî. Teyî ew dareqeysiya şelaq heye li ber dîwarê bêxçe, sibehê tu yê bibînî wê darê kulîlk vekirine, çîlqerqaş bûye, bêhna xweş lê ketiye. Yeqîniya te ji lela te heye, ne wisa?

- Lelê, Xwedê rihetiyê bide te. Serê sibehê, ne wisa?

- Erê erê, serê sibehê, Rizganê min.

Rizgan gava ku rabû çû ser nivînên

xwe, diya wî ya çavsût mûm ji teniştê pencereyê hilda, ber bi odeya xwe ya razanê ve çû. Ev evdê Xwedê çima venege-riya ji Stenbolê nehat? Ji tîlefonekê re çi?! Gelo çi bi serê cîrana ecem de hat? Xwedê dizane kelpîçên germ danîbûn ser zikê qijika qijik, xwe negihand ber kêrê...

Newqa Sorê jan da.

Beriya ku têkeve odeya razanê, rawestiya, pîfî mûmê kir, damirand. Mûm danî ser kevnemaseya xwarinê. Di ser sermîla xwe re zivirî, ji dûr ve, di pencereya hêwanê re li derve nihêrî. Dît ku ew şemala tenik a ku ji ciyê Şehîd de xuya dikir damiriye. Sorê, bê ji ber sermaya derve bû, an jî ji ber tirs û girama ji bo Şehîd, dîsa tê dernexist, lerizî.

* **Ropo:** Li herêma Serhedê, li şûna Romê, Roma Reş tê bikaranîn. (K. N.)

Nefesek maf

Welat DILKEN

Têr nehatiye êmkirin

Hêviya serbestiyê

**Lew, ji serdestiya xelkê diçêre
devê bindest**

Hemû çîrokên me yên pêşbirkî

Li ser sergoyê ku mirîşkek

**Beramberî sed Egîdî ye toz û
dûman in**

Hemû aferîde bi nefesê re

Hatine mehrkirin

**Ey cîhan, a me jî bo çîrokek baş
û serkeftî**

Li hebûna te nefesek divê

Hilde Domin

Amadekar: Tengezarê MARÎNÎ

Di 27.07.1909'an de ji dayik bûye, lê ew dibêje di sala 1912'an de ji dayik bûye.

1929: Lîseya li Kolnê bi dawî aniye

1929–1932: Xwendina bilind li Heidelberg, Koln û Bonnê Hîqûq, Sosyolojî û Felsefe xwend.

1932: Koçî Romayê dike

1935: Li Zanîngeha Floransayê li ser “Pontanus û Machiavelli” dersan dide û li wir doktoraya siyasetê werdigire.

1935–1939: Li Romayê mamostetiya ziman dike.

1936: Bi Erwin Walter Palm re dizewice.

1939: Reviya û çû Îngiltereyê; li wir heta sala 1940' ma û li Koleja St. Aldyn'sê mamostetiya ziman kir.

1940: Berê xwe da komara Domînikê; li wir wek wergêrekê û wênekêşkê kar kir.

1947–1952: Li zanîngeha Santo Domingoyê mamostetiya zimanê almanî kir.

1951: Piştî mirina diya xwe, Dominê dest bi nivîsandinê kir.

1954: Vegeriya Almanyayê. Hilde Palm navê xwe guherand û kir Hilde Domin (ji Santo Domingo hatiye).

1957: Yekemîn car helbestên xwe di kovaran de weşandin.

1961+: Mîna nivîskareke azad diji.

Xelatên wergirti:

1971: Li Meersburgerê xelata Drosteiyê

1972: Madalyaya Heinrich Heineyê

1976: Xelata Rilke

1983: Xelata Nelly-Sachs, Madalyaya Richard-Benzli li bajarê Stadt Heidelbergê

1988: Xaça rûmetê ya eyaleta Nordrhein-Westfalenê

1990: Madalyaya rûmetê ya eyaleta Baden-Württembergê

1992: Xelata Friedrich-Hölderlin

1992: Xelata Heidelberger bo toreya derbederiyê

1992: Madalyaya Carl-Zuckmayer

1993: Xelata Sinsheimer ya bajarê Freinsheim

1993: Profesora rûmetê li eyaleta Baden-Württembergê

1994: Mezintirîn xaça rûmetê ya Almanyayê

1995: Xelata toreyê ya weqfa Konrad-Adenauerê

1999: Xelata toreyê ya Jakob-Wassermann

1999: Xelata welat ya eyaleta Nordrhein-Westfalenê

Bang meke

Tiliya xwe deyne ser dêv bang meke.

raweste li ser rêkevikan.

pêdivî bû, te xwe dirêj bikira li ser tozê.

êdî tu dê li asîman bibînî

û yekî di gel kolanê,

û dê xwe biguhêze ber bi te ve

dikare biçe mîna ku nehêle ew tu kes vegere.

bi hêsanî bi pêş ve diçe,

dema tu xwe dirêj bikî, mîna dema tu radibî,

dema tu mikur nayê weke ko tu bang dikî.

binihêre ewr dikişin.

bersivmend be, hişk negire.

xwe dibişêvin.

tu ji pir hêsanî yî.

tu ji dê berdewam nekî.

sûdeya tirshebûnê nîn e

berahîka berdayîbûnê,

dema ba bilind dibe

ew yê ewr dinixumîne ye.

Devê te li ser ê min

Devê te li ser ê min.

min hemû şop winda kiribûn.

hezar çiçekên biçûk

kovikên xwe vedikirin

li ser laşê min.

Te bi nazenînî ez maçî kiribûm

û çûbûyî.

Şermezariyeke ziwa mîna êgir

sor radibû

li ser zik û singê min.

Vekêşan

Mafên min (kê îro baweriya xwe pê anîbû?)

ew yekem car guleke geş û bel bû

mişt perwane.

ji nişka ve, gişt bê amade bûn,

mîna yek biterpile û bikeve,

wê belgên xwe weşandibûn
 rût û rengzer bû:
 destê mirovekî
 mîna gişan.
 têtê bîra te.
 qaşûla çephêla min,
 ew a balindeyê te xeniqandibû,
 şikest.
 tu dizanî, çi qas pîj
 di nav baxê me de mabûn.
 ev rast e, min dikaribû wê demê
 di diwarekî ji yên mewan de xwe bişêlînim.
 ji mêşhingivên te re.
 demsal
 kêmwate bû
 berî vê rojê
 ya min destên xwe
 li ser mêzê danîbû,
 û ew vala bûn.
 Ji hingê ve, bûm bersivmend,
 ez bi tûrik diçim bazarê,
 cihê tê de şîn û birîn dibe,
 û ji te re lalîk û piyale kiribûn
 mîna jinemaleke rast.
 Lê dema tu bigirî
 û bê hêvî
 di xewê de gazindan bikî,
 pişt re di dilê min de gewre dibin
 êşebaskên biçûk,
 û ez bi bê aramiya wî hest dibim
 di qirika min de,
 ya ji ber hilma min derdikeve

Levhatin

Li berahîkê min alên spî dîtibûn
 û rengavêti bûbûm, ez hez nakim bi ser
 bikevim.
 belê bi vir de kevokên te şemitîbûn,
 wisa milayîm
 te kotirên spî hinartibûn
 ji te bo min,
 kotir li dor kotirê,
 gişt min hilm nekêşabû,
 ode ji hundur ve spî bû.
 min dest di ber xwe re berdabûn:
 şilbûna pûkên berfê
 ji rondikên te
 wan firmêskên min vexwaribûn.

Zivistan

Balinde, mewanê reş
 di pêxin rût de.
 dar bi çavmîçînkê bi min re dilizin,
 ez diçim mîna nav mirovan
 ên hizrên xwe vedidizin
 û ji kerema xwe şixinên tarî
 li derdora navê wan.
 Ez bawer im ku ew dê bel bibin
 - hundir kesk e-
 ku tu ji min hez bikî
 û mikur neyê.

Êvara dilmayî

Çawa dişem te bidim ser milê xwe
 û di nav sûlavê re hilgirim
 mîna ku ez Chrisopherê pîroz bûma
 û wî av ji ber min paqij bikira?
 ez, ew ez ê giraniya êvaran
 nikare hilde
 dema evîn ji nav singê min biçirise
 veneşartî, mîna qêrînekê ji Yasmîn
 ew, a mirovan li kolanan aciz dike.

Çeper

di guldanka
 tenîştên xwe de
 dixwazim çavên te biçînim
 berahîka belgên zêrîn biweşin
 û me binixumînin.
 Da ku ew di biharê de
 bi binefş û nêrgizan re
 mijankên nû vekin.

Hemû keştiyên min

Keştiyên min
 keştîgehên xwe ji bîr kiribûn
 û pêyên min jî rê
 ne têr bûn û ne jî birçî dibûn
 êdî, rabirdû ji nîn e
 û dahatû jî,
 hema texteşanoyek bi roj.
 tenê biyava biçûk
 û tenik
 di navbera te û min de,
 ya nayê kêmkirin

dema te vedixwar û bi sixêfên Heyamî
derî li ber rehma xwedê digirt
min di serê xwe de hesabê “gelo ez ê ji ber te çend namebestan lêkim” dikir

lê tu kamûflevanekî pir serkeftî bû

carê dengê hîkehîka hestên te yên di tarîtiyê de,
xwe li singê min ê sansurkirî dilefand
û bi rîtueleke giran
êdî her du dilan bi hev du re diavêtin.

ez bi dengê strana te ya welatparêz
ji ber hestên xwe yên çarîk sedsalî
dipekiyam
dem dipekiyan
demjimêr dipekiyan

ji dil û bera bi jiyana xwe dihesiyam
car din jiyane ji min hez nedikir
ez lê xwedî dernediketim

pênûs bê ked ji destê min diket
heyv diket
stêrk diket
arîk diketin

min zeman û ziman ji holê radikir
stûyê qebîleyên nûjen li ber yên hov xwar dikir

û ez dibûm homoyeke xwelîser
di şikefteke mişt spîral xêzkirî de
şerqê şeveqekê
ji nû ve û ji dil dijiyam
ne zeman hebû û ne jî ziman.

namebest

berçema m.

Dadgeh

Îsmâîl HACANÎ

Cadeya difûre, dergehên xwendingehan mane daxistî û xwendekaran berdewamî da mangirtinê, pel ji manşêtên rojname û kovaran diweşin. Mela li mizgeftan, gewrî li xwe dirandin û çengên dêran kuh bûn ji jenînê. Şêx û pîran deriyên Laleşê û mezarê Şerefedîn berdan. Holika rojnamevanan e, bi deng û behsên teze re nagihên, peyamên bi lez ji ser şaşên televîzyonan tên xwarê, berpirs bi peyvên nazik, sozên germ û derewan ve diriyan. Serokê hikûmetê ji bêjêran pirtir tê ser şaşên televîzyonan da piçekê ji kerb û tengijîna cemawerî binin xwarê. Desteka "UN"ê ji bo cara sisiyan rûniştine xwarê li ser tawana goristanê viya hinavê mirovatiyê hejandiye.

Ew serê mehekê ye, xelkê miriyên xwe yên berî dû salan jî, ji wê goristanê anîne der û veguhastine goristaneke din, bi sedan kilometreyan ji wê dûrtir. Hindekan jî, destên xwe dikirin kovik û bi guhên hevalên xwe ve dinan û pistepist dikirin. Tu dizanî dayîka filanî û xwîşka filanî li wê goristanê veşartî bûn? Hindekan jî, ew mehek bû tiliyên wan li ser celebê bûn û zêrevanî li kêlên miriyên xwe yên mê dikirin.

Li hola dadgehê rê nema ji ber peyamnêr û rojnamevanan. Daxwazkerê giştî tiliyên xwe bi nik tawanbarî ve birin û bi toneke pirture, ev nemirovê ha yê bi rengê mirov, hûn dibinin di qefesa tawanê de kirzareke hovane di der heqê mirovahiyê de kiriye. Hîç tawaneke wekî wê di dîroka mirovahiyê de

nehatiye kirin, hîç sizayek nîn e di yasayê de ev dirindeyê ha li ser bê sizadan. Sêdaredan bo vî hovê hanê kêma e, lewma em daxwaz dikin ku bihête pirtirpirtir di gehan re.

Di nav şifşan de bi ser xwe ve hat, wekî şervanekî westiyayî, çavnerînek li hemû rûniştîyên holê kir û got: Dadvanê birêz ez ev kesê beramber we yê xwedê dayî, bi ciwantirîn şêwe her wekî wî di pirtûka xwe ya pîroz de kerem kiriye: "Weleqed xeleqna el insan fî ihsin teqwîm" (me mirov ciwan daye) hatime zirbehrkirin ji hemû hez, viyan û xuriskên xuristiyên jiyane, vê civakê dev, dest û piyên min bend kirine bi navê guneh, şerm, tîtal û rewîştan. Dadvanê birêz, min mafê dikilekî jî nîn e, gava heza xwe bi cih tîne, bi azadî mirîşkekê li ser gîfkekê difisîne. Min mafê kerekî jî nîn e ku her cih û demê viya bi azadî dizire. Min mafê biçûktirîn kêzikekê nîn e gava difire bê paseport, vîze û nasname, çi sinor nîn in hezên wan ragirin. Bi tenê ez ê mirov hemû tişt ji bo min qedexe ne, ez xwe gunehbar nabînim, heta bêm sizadan, belkî jî ya hêjayî sizadanê, ev civak e. Ya bi saxî hemû tişt di mêşkê min ê mirov de fetisandine.

Dadvanî serê xwe bi nik layê rastê û çepê ve bir û piştî pistepistê dadvanî çekûçek li maseyê da û got: Dadgeh, me biryar da di vê rûniştinê de ev kesê hanê yê bê guneh bihête azadkirin û şûna wî civak bi tundî bihête sizadan.

Hobîvan

Fredric BROWN
Wergera ji îngilîzî: Bilal ÇELÎK

“Min gotegotek bihîst,” got Sangstrom û serê xwe zivirand û li dora xwe nihêrî da ku bi temamî piştrast bibe ku ew û dermanfiroş li dermanxaneyê biçûk tenê bûn. Dermanfiroş zilamekî biçûk ê xwarûvîç ê weke cinan bû û temenê wî jî ji pêncî bigire heta sed saliyê tiştek bû. Ew tenê bûn, lê belê Sangstrom bi heman şeweyî dengê xwe nizm kir, “min bihîst ku jehreke bêhempa li gel te heye.”

Dermanfiroş serê xwe hejand. Di dor dezgehê re hat û deriyê dermanxaneyê yê pêşîn kilid kir û piştê ber bi deriyekî li paş dezgehê ve meşiya. Wî got, “Min jî dikira navbera qehweyekê bida. Ka tu jî were û bi min re piyanekê vexwe.”

Sangstrom jî, di dora dezgeh re û di derî re da pey wî û çû jûreke paşîn ku ji asraqê heya erdê bi refikên tije şûşe hatibû dagirtin. Dermanfiroş fişa qehwedankê kirê, du piyan peyda kirin û dan ser maseya ku li her hêlekê sendeliyek hebû. Wî sendeliyek nîşanî Sangstrom da û bi xwe jî li ser a din rûnişt. “Niha,” wî got “Ji min re bêje. Tu dixwazî kê bikujî û çima?”

“Ma ew girîng e?” Sangstrom pirsî. “Ma ne bes e ku ez heqê wê bidim”

Dermanfiroş bi destê xwe yê ra-

kirî axaftina wî birî. “Belê, ew girîng e. Divê ez yeqîn bibim ku tu tiştê ku ez dê bidim te, heq dikî. An na...” Wî milê xwe jê dawêşand.

“Baş e” Sangstrom got. “Ew jina min e, sedem jî...” Wî dest bi meseleyeke dûdirêj kir. Beriya ku ew axaftina xwe tevde biqedîne, qehwedankê peywira xwe qedand û dermanfiroş demeke kurt axaftina wî birî da ku qehweyê bîne. Sangstrom meseleya xwe qedand.

Dermanfiroşê kinik serê xwe hejand. “Belê ez carinan jehreke bêhempa amade dikim. Lê ez wê bê pere didim; ez ji bo wê pere naxwazim heke ez bifikirim ku rewş hejayî wê ye. Min alî gelek kujeran kir.”

“Baş e” got Sangstrom, “Wê bide min nexwe.”

Dermanfiroş jê re bişirî. “Min jixwe ew da te. Dema qehwe amade bû, min biryar da ku te ew heq kiriye. Ew, her wekî min gotî, bê pere bû. Lê belê ji bo jehr-kujê ez ê pere bixwazim.”

Gûn ji Sangstrom çû. Wî ihtimal dabû xapînê yan jî hinek cureyên arîşetiyê, lê wî ew yek hêvî nekiribû. Wî ji berîka xwe damançeyek kişand.

Bû tîqetîqa dermanfiroşê kinik. “Tu newêrî wê bi kar binî. Ma tu yê bikaribî jehr-kujê bibînî -wî destê xwe ber bi refikan ve hejand.- di nav



bi hezaran şûşeyên hanê de? An jî tu yê karibî jehreke zûtir û bihêztir bibînî? An jî heke tu dibêji qey ku ez fortan didim û tu bi rastî nehatiyî jehrandin, berdewam bike û li min bixe. Tu dê bersiva xwe di hundirê sê saetan de dema ku bandorê jehrê dest pê kir, bigirî.

“Ji bo jehrkujê çiqasî dixwazî?” Sagsstrom bi himehim got.

“Ne pir zêde. Hezar dolar. Dawiya dawîn, divê mirovek jiyanê xwe bidomîne. Her çend hobiya wî pêşilêgirtina mêrkujîyan be jî, ew dikare ji wê pere jî qezenc bike, ne wisa?”



Sangstrom kir himehim û demançeya xwe danî nêzî xwe û cizdanê xwe derxist. Dibe ku piştî ku jehrkuj girt, demançe dîsa bi kar bianiya. Wî hezar dolar yek bi yek hejmart û danî ser maseyê; giş jî sed dolar bûn.

Dermanfiroş ji bo ku pereyan bigire qet

nelezand. Wî got, “Tişteki din, ji bo ewlehiya jina te û min. Tu dê derbarê mebesta xwe de- derbarê mebesta xwe ya ewil ku, bi baweriya min, te dixwest jina xwe bi-kuji de, îtirafekê binivîsî. Dûre tu dê bisekinî heta ez biçim derve û ez îtirafa te ya der barê kuştinê de ji hevaleki xwe re bişînim. Ew dê wê weke delîl li cem xwe bigire li hemberî ihtimala ku tu biryara kuştina jina xwe bidî. An jî ya min.”

“Dema min ew da postayê dê ji bo min jî ewle bibe ku ez vegeim vir û jehrkujê bidim te. Ez ji te re kaxiz û pênûsê bînim...”

“Ha, tişteki din, lê belê ez li ser vê pir israr nakim. Ji kerema xwe re gotegotên der barê jehra min a bêhempa de belav bike. Tu yê biki, ne wisa? Meriv qet nizane, birêz Sangstrom. Jiyanê ku te xilas kirî, ger dijminên te jî hebin, belkî ya te bi xwe be jî.”



Ji awirên zaroktiyê

Ji bo biraziya min Bêrîtanê

Dibêjin piştî min te jî bar
kiriye ji şûnwaran
Ji te re jî nebûye yar
Warê ji mîrateya zaroktiya min mayî
Bi çûna te re jî
Dar û berên terazînên zozanan
xem girêdane
Çiyayan dev ji parêzvaniya xwezayê
Û gulistanên te jê koçkirî berdaye
Stêrk bi tîrêjên rojê re ketine hevrikiyê
Ji ronahiya rojan xeyidîne
Ji ber hesûdiya çavên te yên reşbelek
Û awirên te yên şermok
Piştî te siya xemeke giran vegirtiye
Ser rûçikê jiyane
Gul û kulîlkên ji rengê te
Biryara bi dawîanîna temenê
xwençegulên xwe wergirtiye
Karxezal daketine ser mêrg û kaniyên
Bi bîrhatinên te dagirtî
Û çêrîna çêregehên bêhna te lê mayî
Li xwe qedexê kirine
Kewên dengzirav xwendina
li ber destê sibehan
Li xwe heram kiriye
Revdeyên kewên ribat ji peravên çem
û karêzên sarnûsan vekişîne
Xwe spartine berzahiyan
lat û zinarên asê
Dirûngehan ji ber xeman por spî kiriye
Dehl û deviyan pelçim werandiye
Ligel payîza pîrekal
Dexezariya başokên dexez berz bûye
li der û dorê

Û li ser kevok û qumriyên paknijad
Teyr û tebayên xemgîn stûxwar bûne
Di nav xwezaya ji rengên
te bê par mayî
Sonda pevşanebûna
azwerî li canê xwe xwarine
Beytikên evîndar jî di pey te de
Agir bi şûnhêlînên xwe xistine
Bi vîna ku dê êdî tu caran nekevin nav
Danûstendinên zayendî
Digel ku biryara qirbûna
nijada wan be jî
Bi koçkirina te re xemgîniyekê
serî radikir
Wekî bobelateke xewnak
Bi ser jiyana min de dadinizilî
Kesera dilê min gur dikir
Ba û bahoza di pey çûna te re rabûyî
Li war û wargehên te li dû xwe hêlayî
Şaxa wêran û xikûxalî
Hêviyên geşbûyî diçilmissîn
Li qeraxên girava dilê min
Li şûndewsên di pey te re
mabûn diaxivîn
Li nav zeviyên bîranînên te
Bayê bêrîkirina te dilê min dialast
Tenê awirdîmenek ji zaroktiya te mabû
Li şenwarên lîstikên te
Ji biskên te yên bîşengî
Ji kenên te yên şîrîn
Ji awirên te yên şermok
Diyarî mabûn li pey yarîgeha dilê min
Bêrîvan...

Rojhat SAXÎ

Pênc çîrokên mînîmal

Lokman AYEBE

Xwekuştin

Bi mêşekê re ket wî şertî ku, bê ji wan kê dikaribû hîn zû xwe ji şaneşîna mala wî ya qata heftan de bigihanda erdê. Pêşbirkê dest pê kir û bi bayê bezê re xwe bera valahiyê dan. Encam; yek ji wan mir û ya mayî jî li ser xwîna yê mirî danî.

Firqeta bi havînê re

Dema payîzê nola gurekî har dabû dû wê û wê jî lingên xwe di nava pelên zerbûyî de dikişkişand û diçû, min bawer nedikir ku di vê zivistana sar de ez ê ew qasî bêriya wê bikim.

Xwe-lîdank

Xweliya heft gundan li serê min be! Ku jixwe lê ye jî... Qe bila carekê bi tenê be jî, gava weke yareke dilsoz bi arê hînavê xwe, serê xwe datîne ser singê min, bêtî ku stûyê wê bişikênim, dikaribim wê tevî ara wê di nava dilê xwe de vehewînim.

Siûd

Biryar dabû ku xwe bikuje, lê belê newêribû û destê wî li wî negeriyabû. Wî jî rabûbû jê nod û nehên wan ên dengî û yek tenê jî bi saçmeyî, sed gule kiribû û ev her sed gule di kîsîkekî de tevli hev kiribû.

Îcar her şev, berî razê û bêtî ku li guleyan binihêre, bi electexmînî guleyekê dixê devê lûleya çifteyê û di singê xwe de diteqîne. Êdî ew û siûda xwe.

Siyabend û Xecê

Siyabend dest xist qirika Pîra Felekê û jê pirsî; "Ka bavê min, ka diya min, ka xortaniya min?" Felekê jî ber wî bezand, wî li dû wê lezand. Da dû û çû û hey çû.

Xecêya reben jî weke goreya fereke wê winda bûbe li dû wî ma û hey ma.

Zêmaran nehûne

Hecî NEHSAN

Di bîbikên çavên te de raperîneke reş li min dinihêre. Dilê min di nav xweliya tasvasên lalûte de di ruhekî bê can de digere. Teniya nîgaşan di heqîba temenê lal de diqemişe.

Di kefa destên min de şopa lêvên sîtavkekê, wekî birîneke tamxweş û straneke êrîn bangî ferîşteya baranê dike.

Min bi tehma pûngê hêsirên te yên derewîn vexwarin û têgihîştin ku her evînek bo xwe rêçikekê xêz dike. Lewma me çîrokên xwe xilmaş nehiştin, lewma demsal bi şîrînî di nav destên me re şemitî, lewma me rûpelên jiyane yeko yeko bi pêçiyên xwe yên kizirî qelaptin.

Nêrîn li erdê ketin wexta min ji kaniya dilê te şerbeteke tehl vexwar, wexta min ji singê te bêhna sêvên vêsandî hilgirt, wexta li ser rûyê te bihareke bi heft rengan digeriya, wexta minminik ji kenê te dişewitîn, wexta çavên te bi wateyên kedî di evîneke şil û pil de geşt vedidan, wexta demê stêrkan ji ber şevê direvandin û wexta koçeran konên xwe ji sorê guldexwînê vedigirtin.

Li rûyê helbestê ket çirûska peyvê.

Bi ser xwe de digirîn çiya, bi kuxîna berbangê şiyar bûn belalîzk. Straneke hişk pişîka dengbêjekî dipelişand.

Me êdî stranbej ji dengê lingên wan dinasî.

Dinya ket bin siya xewna me, xew reş bû di şepilîna çavên nêrînwestiyayî de.

De hestên min ên êtûnî bi bêjeyên rîtmîk veçinandin, te ji dilê min ê rengîn gulên xîzk boyax kirin.

Demê ji xwêdana min dimêt, lê nebûm kedkarê peyvên xwînrej. Esl û feslê birînen min ji rengê gilyazê bû.

Pirî caran min rûyê te bi ruhê zaroktiya xwe dimalişt. Ew rûyê te beybûneke sinix bû li pey firîna xalxalokan.

Ez niha çî bibêjim dê şihîna hespekî kincirî ji temenê min biwere û dê guliyên te yên şemitok ji destên min birevin. Leylanokên hêvijî meytên xwe di bibilîsîna çavên min de hêvotin û gewrekî nûhirî, dinihure xayisa xewnên min.

Çima tu wisa ji dil qesemê bi keziyên xwe dixwî û lawaniya min didî ber meqesa çîrokên zîvîn?

Êdî here.

Silavekê ji xofa henasên şîngirtî hilîne, lê bila dilê te zêmaran nehûne. Xilxala azadiyê bi meşa xwe ve bieliqî. Bila perperok ji dilê te biweşin û bila porê te zer û zer biherike.

Navekî nû li jiyane bike.

Stranên şil di dilê min de hilîne, serê min westiya.

Ez di kolana stranên sermedî de terpilîm û min destê xwe avêt mirina herî ciwan. Ji bo delaliya te.

De ka tu jî, ji bo min sibehekê ji hinavên xwe derîne û helbestan ji newaya se-defên AZADÎyê bihûne.

Arê şîn

Feratê DENGİZÎ

Navê Pirtûkê : Pevşabûnên Şîn
Helbestvan : Ehmed Ronîar
Cure : Helbest
Weşanxane : Weşanxaneya Lîsê
Çap: : Çapa Yekem 2010
Rûpel : 60

Bi sembolan helbestnivîsîn bi ya min ji me kurdan re nû ye, yanî bi qasî ku ez dizanim. **“Rono”** sembola Ehmed Huseynî, **“Masi”** sembola Berçema Mişrîtan e. Sembola Ehmed Ronîar jî **“Şînyarya”** ye. Min pir ji Şînyaryayê hez kir.

“Şînyarya” du tişt xistin bîra min; Arê şîn. Ma bê **“ar”** sebra min, sebra me kurdan tê! Tev **“ar”** ê **“şîn”**... Yanî şînahiya arê gur ê li çiyê. Ku ar gur dibe, agirê darên berû yên hişk û bêqaşik, serê alazên wî, serê rivînan tev şîn in. Û ev şînahî ruhê agir e, ruhê domandina wî, ruhê hebûna mirov e. A va ye ev şînahî ruhê hebûna me ye, ruhê evîne jî... Ma ne ev agirê çiyê, ruhê hebûna me ye!
Min ji vî **“arê şîn”**, ji vê **“şîn ar ya”** yê hez kir.

Û ya din; ma jiyana me kurdan bê **“Şîn”** dibe! **“Şîn”**a ku agir dixê kezêba me, kezêba dayikan dişewitîne. **“Şîn”**a ku **“ar”** dixê dilê me û kezêba me dike tiraf. Her roj yek, du, sê... Neh beden dibin **“şîn”**a **“arê”** vê xakê. Ma ne em her roj di **“şîn”**ê de ne!

Dinyayê **“şîn”** liyaqî jiyana me kurdan di-tiye. Lê em qebûl nakin... Her çi qas em qebûl nakin jî, **“şîn”** di dilê me, di jiyana me de ye û wê azadî wiha bê. Azadiya serbixêlî! Lê min ji vê **“şîn”**ê hez nekir.

Hûn ê jî ji **“şînyarya”** yê hez bikin! Ez bawer im. Ji kerema xwe seriyekî bidinê.

Pirtûk du beş e; “xeyalek bû” û “sergoyê jiyanekê”. Ligel kêmaniyên mîna **“...di dewsa wan bîranîn de diêşim”** (rp.27) bi ya min **“ji dewsa wan bîranîn diêşim”** bûna wê rastir û xweştir bûya û **“aniha li deryayan dipirsîn”** (rp.41) belkî ji çapê wisa bûbe jî, lê divê **“a niha li deryayan dipirsîn”** bûna; helbestên Ehmed mirov dikişîne avgerînkên kûr. Mirov ji ser hişê xwe diçe li hember van rastiyên jiyana xwe. Wek hespê ku bê serî bibeze berê mirov dikeve bezê. Dest û dilê te sax bin helbestvan. Ev ciwanî **“şîn”**a dilê me vediguherîne **“şa”** yiyê.

Dixwazim du beşan ji helbestan par ve bikim;

“amed
bê navber mirovên ku kêr dibin
hene!

nava wan bi kolanên ji min ne
biyan

û
vala tijî bûne...
tu zanî?

vê navberê hemû masiyên ku
min ew ji aqwaryûman nas kiribûn

aniha li deryayan dipirsîn”

“bê çare biherikim behreke bê ser û ber
ku wekî hînbûnekê jî ne-

hesibînim...

belkî bîranîneke xwînî di şîna min de
were bîra te şînyarya
tiştê di dilê min de tiştêkî din e”
Bêyî van helbestan nemînin.



Bang

Tingîniya bêdengiyê ye ya li baniyan diqerisî
Dema kulîlkên sor, dilerizîn em
Rûyê te li bakur, rûyê min li başûr
Ji ba min heta ba te çiqasî bûye dûr
Ez qesra te me, tu qesra min î
Gelo ne zilm e ev qas tenêti?

Lê lê...

Dibêjin tevli refan nafirîn teyrikên vî zemanî
Biyaniyên dûr şanî dikin çavên te û stêrka bakurî
Qet aram nebe kuçeyên vî welatî
Giyanê evîne tevlihev e, tim bi ewr e
Kuçe bi kuçe pîroz dibe ev nakokî

Lê lê...

Derwêşên vê erdnîgariyê pir xemdar in
Neçar e her mirov li çar rêyên vî bajarî
Ez hepsa te me
Tu hepsa min î
Gelo kîjan demsal e azadî?

Mem FERAT

Kartopu Sokak (*)

Îsmâîl DÎNDAR

Di vê saetê de, ku ne mecbûrî bûya kesî lingê xwe nediavêt derve. Ji piştî taştêya paleyan û heta bi esra teng çîqeçîqa germa havînê bû li vê bajaroka ber xetê. Bi heman dirûvî, ji heman mirovan pêkhati, bajarokeke din hebû li tenîştê. Eyn weke du zaro-kên cewî. Her du bajarok bi xeteke têtê ji hev hatibûn birîn. Mîna zebeşekî bi kêra ka-lanî bikin du qet.

Germa tîr, şênîyên bajarokê kiribûn hewş û hundiran; li ber siya wan dartamên ku hewş û diwar bi şax û pelên xwe nixuman-dibûn. Loma, vê gavê, dikandar li ber siya herî xweş a dikana fêkî û zerzewatan rûniştibûn. Ev der serê kolanê bû. Xwediyê dikanê holikeke ji çiloyê darên berû yê Çiyayê Bagokê çekiribû. Xortekî, tûrikek di dest de, yek li piştê; piştî silavê got:

- Gelo, Kartopu Sokak li ku derê ye?

Di nav wan de yê mezin Berber Qaso bû. Ligel awireke pirsyar weke ku bêje 'tu ji ji ku derketî' got:

- Rasterast here, piştî bi sed metroyî tu yê lewheyê bibînî. Û piştî ku ew xortê xwediyê pirsê ji wan bi dûr ket, axaftina xwe domand:

- Bi şeref carinan ji qehran ez dikim bite-qim loo.

- Çima gidî, çi bû dîsa?

Remoyê xwediyê qehweyê bû, yê ku pê re pê re pirsaxwe gihand Apê Qasoyê Berber.

-Ê de were û dîn nebe! Temenê min giha şêstî, nayê bîra min yek carekê bi qasî ku berfegulok bê çekirin, berf barî li vî bajarî. Radibin, navê kolana hişkî ziwa ya ku carekê tenê ji berfê xwe lê negirtiye datînin "Kartopu Sokak"

- Ma ev tenê ye yê ku mirov diteqîne Apê Qaso? Hema rojekê, ji serê sibehê heta bibe êvar, em ji kesên ku di vê kolanê re derbas bibin bipirsîn, gelo hûn dizanin "Kartopu" çi ye? Ji sedî çend ew ê bizanibin gelo? We-latekî wisan ku mirov û kolan ji hev fêm nekin.

Xwediyê vê gotina ji xwe razî, Mistoyê

kurê Hecî Mihê bû. Hecî Mihê, ev çil sal in ku nîviyê cawê vê bajarokê wî difiro. Misto kurê wî yê mezin bû. Ev çar sal bûn ku wî zanîngeh kuta kiribû. Di serî de Misto, malbat bi yek carê li hêviyê bû ku bibe mamoste, mamosteyê dirokê. Di her cara ku weke dikê qoqo xwe noqî şitexaliya dikandaran dikir, bavê wî digot;

- Ma Misto tenê mamoste ye kuro, ew profesor e, profesooooor. Ma gelo tiştek heye ku ew nizane, looo.

Û piştî ku "La ilahe illeallah û Muhammed Resulallah" eke ji kezebê dikişand gotina xwe weke pirê caran bi sixêfan didomand:

- Mêrê diya min, dora şitexaliyê nade kesî lê ev çar sal in di imtîhanê de bi ser nakeve. Tirsax min ew tirs e ku heta ez sax bim ew ê bela serê min be. Weke ku ev ne besî min e, bi ser de ji wî ez çirandim yawo.

Lê di vê kêliya ku xuya bû, dê şitexalî bibe bender û dê her kes melhêba xwe lê bixe de, bavê wî hê nehatibû dikanê. Û jixwe Misto ji bi vî yekê zehf kêfxweş bû.

- Xalê Qaso pir rast dibêje. Weke ku gotî, carekê ji berf li vî bajarokê nabare, navê kolanê dikin "Kolana Berfegulok". Lê ma ev tenê ye ya sosret, sosreta mezin ew e ku navê kolanê ne bi zimanê vî welatî ye. Navêkî wilo ku piraniya kesan nizanibin tê çi wateyê.

Ji bo Misto derfeteke ku her car nediket dest bû. Mijar, mijara wî bû û bavê wî ne li civatê bû. Xwest tiştin din ji bibêje lê Sebriyê xwediyê dikana fêkiyan, têra xwe bédeng mabû û êdî dor dora wî bû.

Qasoyê Berber devê tûrik vekiribû û şitexalî li ser hev kom dibû. Berdestkê Remoyê Qehwefiroş hişt ku navbereke kin bikeve nav axaftina ku hin bi hin kûr û gur dibû. Sebriyê fêkîfiroş, çaya ku danîbûn ber tev-dida û bi giranî xwe li şitexaliyê germ dikir:

- Çavo ma ecêbên ku em tê de ne, ev tenê ne. Ma li ser rûyê vî dinyayê ji me belengaz-tir kes heye gelo? Ma ji vî yekê kambaxtir tiştek heye ku, em bi rihetî nikarin merivên

xwe yên ku dused metro dûrî me ne, bibî-nin. Ma kes zane, di vê xeta ku dilê me kiriye du qet de, çend kurebav hatine kuştin û çend birîndar bûne û çend seqet mane?

- Bi serê van camêran tu rast dibêji, ma li ser vê erda dewlemend heta îro kê gezek nan bi rihetî xwariye û gotiye 'xwezî bi vê kêliyê'

Qasoyê Berber bû, yê ku xwe negirtibû û şitexaliya Sebrî biribû. Çawa be serê pêşîn wî devê tûrik vekiribû û dest bi şitexaliyê kiribû. Lê ji wî bêtir, Misto di cihê xwe de xwe nedigirt. Helkehelka wî bû, dixwest bi zanî-nên xwe yên zanistî mohra xwe li civatê bixe:

- Erê hûn hemû rast dibêjin, lê divê mirov dîroka xwe baş bizane, kesê ku dîroka xwe nizane, ew nikare tiştên îroyîn û tiştên ku wê siberojê biqewimin ji bizanibe. Ma têla bi dirî em kirine du qet tenê? Ji xeynî yên ku li dinyayê belawele bûne em bûne çar qet, çar!

Qasoyê Berber têra xwe aciz bûbû. Misto, him rêya axaftinê nedidayê, him jî tiştine entîke ku wî qet bîra wan nedibir digotin. Bi wê hêrsê, ji ser kursiya piçûk rabû ser lîngan:

- De kêlikekê devê xwe bigre Misto!

Peyv ji devê Qasoyê Berber bi zirt derketibû. Li hêrsa xwe poşman bû. Piştî ku 'La îlahe illallah, Muhammed Resûl Allah' eke kûr ji kezebê kişand; xwest hinekî dilê Misto xweş bike:

- Misto, birazî! Ez heyrana te me, li min meyze. Erê te xwendîye, em ji xwendin û zanî-nên te re tiştêkî nabêjin, lê em dîroka wî welatî roj bi roj dizanin. Hema ya hêsan ez ji te re bêjim. Bavê min di çêkirina Pira Alman de xebitiye. Dewleta Alman ji bo xwe bigî-hîne çalên petrolê çî kiriye û çî nekiriye. Ji roja pêşîn ve, yekîtiya me nîn e û bi ser de ji em gurê hev in. Loma welatê me bûye gêra her kesî.

Dema Qaso destê xwe avête berîka êlegê xwe ku qutiya tûtînê jê derxîne, Remo weke pisîka ku xwe bavêje ser mişk, hefsarê axaftinê girt destê xwe:

- Ne Alman, ne Êrîs û ne ji quzilqurtên din, yek jî ji bo xêra me xwe nalivîne. Hemû li ser a xwe ne. Cîranê me çil sal ji dewleta Alman re xebitî, neviyê wî di Newrozê de, bi tenqên Almanan ku belaş dane dewleta tir-kan, li ser pira nû hat kuştin.

Hê Remo axaftina xwe nebiribû serî, Sebrîyê fêkîfiroş xwe ranegirt û weke ku axaftina Remo temam bike, dest pê kir:

- Laşên kuştîyan, li ber Çemê Bunîsrayê çûn. Piştî bi çend rojan, heta ku cendek ji nav aqarên Binxetê anîn. Ji van dewletên mezin, yek jî ne dostê miletê bindest e. Ma hewceyî tiştêkî din e, din jî bi vê dizanin.

- Ha, ez jî dixwazim vê ji we re bêjim. Apê Sebrî rast dibêje. Lê divê pel bi pel em bi dî-roka xwe zanibin. Ku em dîroka xwe nizani-bin, em jî gaveke dewletên dagirker û mêtînger fêhm nakin. Bala xwe bidinê we-latê me sê caran li hev par kirine. Di her carê de hê bêhtir em hûr û hela kirine.

- Kuro bes e, dîrok dîroka te, te mêtîyê me bir. Aha, wa ye, dîroka me di quzê kerê de, di wê lewheya ku li ser nivîsandine "Kartopu Sokak" de ye. Ma em jî tiştêk in kuro? Ku em bi qasî serê derziyê xwediyê rûmetekê bûna, navê bajar û gundên me, navê kolan û cihên me wê bi zimanê me bûna.

Qaso tiştêk ji axaftina Misto fêhm nekiribû loma vê carê hê bêhtir hêrs bûbû.

- Yabo qurban, carinan em bi Hecî Mihê re dixeyidin. Em dibêjin tu dilê Misto dihêlî, tu li nav civatê erza wî dişikînî. Nahêle mirov biştexile. Vit û hey vit. Ava Çemê Bunîsrayê bisekine, hedan bi canê Misto nakeve.

Lê Misto qet xwe neda paş, wî kiribû dilê xwe û mohra xwe kiribû dest.

- Erê, ez nizanim bê çima ew qasî li zora we diçe. Hûn xwe nas nakin. Çi bi serê me hatiye, çawa dinya li me bûye tofan, qet hûn serî naêşînin. Ku mirov ji we re dibêje jî li zora we diçe. Ez dibêjime we fenên ku îro li me dibin werîsê wan digihîje berî sedsalan. Ka hûn dizanin Qesra Şîrîn, piştî Sykes û Picot û ya dawîn û herî kambax Lozan ji bo me tê çî wateyê, ma hûn dizanin?

Qederekê deng ji kesî nehat. Wekî ku Misto di axaftina wî de mafdar dîtibûn. Kêrê devê kesî venedikir. Lê ne bi gelekî, Hecî Mihê, bi silava xwe ya bi dengêkî bi-lind ku got, 'Eselamun aleykum' bêden-giya heyî, ji nişkê ve bi dawî bû. Hecî Mihê jî li ser kursiya piçûk rûnişt. Tenê Misto li ser piyan bû.

-Çima hûn wilo bédeng û xemgîn in lo. Dîsa prefesorê me çî ji we re digot?

**Kartopu Sokak: Kolana Berfegulok*

Azadiya Welat

Bi dema weşana nû

1
Cotmeh

Li bayiyan e

✓ Bi krînkên pirtûk û sinemayê
✓ Bi lêkolîn û dosyayên taybet ên çandî
✓ Bi quncikê tenduristiye
✓ Ji Neolîtîkê heta roja îro diroka Kurdistanê
✓ Ligel nivîskarên xwe bi hin nivîskarên nû; Şerefxan Cizîrî, Dîlan Aydın, Rafîda Yetkîner, Mihemed Ranaî, Mazhar Gunbat, Dr. Remzî Azîzoglu, Mehmet Şahin, Memad Drewş, Ronî War, Abdulkerîm Bîngol, Xelîl Xertgîn...



Rojnameya we ya tekane rojane û kurdî Azadiya Welat ji bayiyan bistînin...

Jan dadikeve ser vî bajarî

diyarî ji bo giyanê nemir Îsmet Ablak

Raweste!
Raweste û neçe hevalo!
Ger tu biçî dê jan dakeve ser vî bajarî
Wê bibe şewat
Ev giyan, ev beden
Ez ê bimirim di tenêtiya te de
Li ber êvarekê
Û ranagire dilê min
Bi hesret û kedera te
Dinalin hêsirên min
Bi ser de jî dîl im
Li vî bajarî ji bo te
Çi dibe wêrane nehêle!
Bi tena serê xwe vî dilê min
Li van deran birîneke mawzerê ye li ser singê min
Ev girtîgeh
Û nayê jiyîn bê te
Meçe hevalo! Meçe!
Li benda me ne
Xewn û xeyalên di rabirdûyê de mayî
Wextê min li pey te zêmar dilorandin
Bi hizirdarî
Xem û keder dadinizilî ser vî bajarî
Wek pêleke ewrên reş û tarî
Meçe hevalo!
Me tenê nehêle li van deran
Wiha bêdeng û bê pejn
Neterikîne dilê xwe yê di rojên raperînan de
Bi evîndarî serhildayî
Ma ne ez sondxwarê rêça te bûm
Bi inyata hemû zextên azardîde
Min mist bi mist vedixwar
Hemû rojên bi êş û azar
Lê te?
Te ji mêj ve terikandibû ev bajar
Di pey te de sir û seqemeke qerisîner
Danizilî ser rûyê jiyane
Weke birîneke jandar

Li singê min der bûbû
Di pey şûna te de
Hemû kul û derd
Xem û keder bûn para min
Vêga jî tikûtenê me
Bi tena serê xwe
Di şevên vî bajarî yên sir û seqem de
Û vedilerizin xewn û xeyalên min
Hêmin dê biçî
Here hevalo here!
Oxira te ya xêrê be
Here û êdî venegere vî bajarî
Neêşîne xeyalên min ên di bîranînên birîndar de ve-
şartî ne
Li serê her şeqamê
Û her kuçe û kolanê
Tu yê pêrgî rondikên min ên birîndar werî
Li ser her peyariya van kuçeyan
Rêhevalekî wînda radiweste
Bi dilekî birîndar
Xwîn diherike
Tegez vêga vemirîne hemû lambeyên
Kuçeyên vî bajarî
Taveheyv vedilerize
Di koncalên vî bajarî de
Berf dibare li şevên xwe
Heval bê wext koç dike
Ji xewlegehên vî bajarî
Çendîn bihar rondikan dibarînin
Di pey te de çavên xembar
Ev bajar bi xefik e
Xwîndar e
Vegetîn e
Bi xem û xembar e
Bi êş û jan e
Êş û mirin e hevalo!
Êş û mirin....

Avaşîn BÊKES

Dilê te bi min re ye

dilê te bi min re ye (ew di nava dilê min de ye)
bê wî nabim qet
(her diçim ku tu diçî wir,
delala'm; her min çî kiriye te kiriye, evîna'm)
Natirsim
ji qederê (qedera'm tu yî, şîrîna'm)
tu dinyayan naxwazim (xweşik'a'm tu yî dinya'm, rastiya'm)
û tu yî ya ku heyv tim qala wê dike
û ya roj wê her çî bistrê jî, tu yî

va ye raza herî kûr ku kes pê nizane
(va ye qurmê qurmê û kata katê
û ezmanê ezman ya darekê bi navê jîyan; a ku bilindtir dibe
ji ruhê dikare hêvî bike yan jî ji hişê ku dikare veşêre)
û ev mucîze ye ku stêrkan ji hev dûr dihêle

dilê te bi min re ye (ew di nava dilê min de ye)

E. E. Cummings
Wergera ji îngilîzî: Lenya DILA

Molotofkokteyl

Evdile KOÇER

Pismamê min ê nivîskar gelekî hez ji çêr û nifiran dikir.

Heke te çêr û nifirek jê re bikira kêf dikir, zewq jê distend.

Jixwe ji ber vê yekê rabû dest bi amadekirina antolojiya çêr û nifirên kurdî kir.

Çi qas çêr û nifir seh bikira, yan jî bixwenda wê ew li ser kaxizekî biçûk binivîsanda; bixista şûşeyekê û devê wê bigirta.

Lê rojekê bi cîranê xwe re pevçû.

Pismamê min vê carê tehemûlî çêreke

cîranê xwe nekiribû.

Ser û bêvila wî di xwînê de hiştibû.

Berê xwe dabû malê.




Ew şûşeya çêr û nifiran tijî benzîn kiribû.

Û pê mala cîranê xwe şewitandibû.

Berî du rojan ji girtîgehê derket.

Min hez dikir ku jê bipirsim ka ew çêra ku cîranê wî jê re kiribû, çi bû ku ew çend pê aciz bûbû.

Lê ji tirsan min nekarî.



Bêtamî

Ez bi wê tamê dizanim
Ew tama ku ji ziravê qetiyayî
Bi ser kezeba dîrokê ve rijiyayiye
Û pîroziya Adarê rast nenivîsiye

Ew tama ku bi gotinekê re
Ji kezebreşiya hinavên te filitiye
Û mîna zîroyekî qelew
Bi asîmanê dilê min ve zeliqiye

Ez bi wê tamê dizanim
Ew tama ku zimanê dayikê
Li min kirine jehra koremaran
Û gilêza devê xwe didin alastin

Ew tama ku te kêfa helbesteke Nerûda
Di qirika min de dihişt
Û hemû stranên evînkuj
Diyarî vî dilê ku
Bi te ve maye dikir

Ez bi wê tamê dizanim
Ew tama ku mirov bi azadî
Çêran ji dafika dilê xwe dertîne
Û dide tilîliyan
Ji bêtamiya dîrokê re

Ew tama ku min bi kulman
Ji kaniya dilê te jiyan vedixwar
Û dibûm serxweşê silavekê
Ku hema vê gavê ez li bendê me

Ez bi wê bêtamiyê jî dizanim
Loma diçim û tîm
Ji te vedigerim

Ercan DOGAN

Nêçîrwan

Xwe veşêre
xezalê

skêncên navtengan dibarin
porê te yê li reha xwe qutbûyî
dinizile ser jana min
ez ji te dûr
tû ji çiyayan dûr

xwe veşêre
karxezalê

awirên çavan dibarin
min destê xwe
bi rondikên selpakfiroşan şûşt
helbestvanekî xwe daliqand

dayikekê kezeba xwe kizirand
refên çiyayên penaber borîn

xwe veşêre
çavxezalê
evîna min
kete hubra pênuşê

Nasname

Ev ez im
Mişextê bajaran, qaçaxê dinê
Min baskek hebûya
Ez ê bibûma şînahiya asîmanan
Û min ê ji xewnên giran
Welatek azad bikira

De bila bajarek bête mûmyakirin
Peykerek ji şûna xwe bileqe
Ev ez im
Carina tenbûreke şikestî
Carina hêrsa xwekuj

Zayîn

Destekî min Zerdeşt e
Xwe ji dûayan
Ji yezdanên tariyê dispêre
Destekî min Vîştaspa ye
Keyayê bajarê wînda
Û ji rûpelên dîrokî dûrmayî

Destekî min feylesof
Yek ji keya
Gava ku digihîjin hev
Ez dizêm

Mahmût YAMALAK

Du niqut jiyan

ar-da JANXWAR

De zû rabe xweliserê! Ma tu xewarî bûyî! Roj çûye devadeva! Tu hîn di xew de yî! Tu yê bi vê rewşa xwe herî kar! Wele me ediland. Em ê bi vî halî, xweliyê bi serê xwe de bikin. Cihê em ê herin kar, ne weke karê li vir e, li wê derê ji şeveqê ve radibin û roj tarî dibe hîna vedigerin malê. De li gor vê xwe amade bike û kêmaniyên zexîreya xwe ji niha ve tamam bike. Bila tu kêmaniyên te nemînin, li cihê ku em ê herinê her tişt bi pereyan e, kesek tu tiştê xwe bi ruhê me nade, bi qasî serê derziye jî. Hewê behicî û gotê “Ka me xwe bi çi varqilandiye? Ev peyvên gewî çi ne tu dikî? Ma tu dîsa vê sibehê şer dixwazî. Ma ji teba ye? Ez nikarim xwe li ber agirê ji devê te diherike biqemirînim û xwe biqehirînim, dev ji min berde. Ne tu bî, ne ji çûyîna te be!

Kevaniya malê wê çi bike, wê çi neke! Hundirê mala wê bûbû pelîsxane, ev deh roj bûn amadehiya xwe ya çûyîna xebata çolê dikir. A wê îroj here yan wê sibê here, qet pêşiya wan ne sayî bû tim bi mij û dûman bû. Alav malavên xwe dida hev. Digot “Ha, em ê îroj herin ha sibê herin.” Lê dibû êvar hevserê wê dihat digot “Weleh min îro telefon kir, gotin hefteyeke din” Lê dawiya hefteyan nedihat, hefteyên wan serê wan bixwe.

Hewê, pelîsxaneyê li hêwanê berhev kir û da hev, xist kulînê. Ji bona rêwîtiyê kîsê arvên amade kir, du legan ard vala kir, moxil kir û du test hevîr li zik hev kir, hevîrtirşê xwe pê de kir û li cihekî tarî legan pê de kir. Çend tejk û pot avêt ser. Ber bi derve ve bazda çû, dora xwe danî ber tenûrê, hejikê xwe bir li ber dora ku bi darikekî xistibû nav qelişteka qora kevirên li tenîştê tenûrê û bangî Sarayê kir gotê “Lê Sarêêê! Haaaa Sarêêê! Bila haya te jê hebe, dora tenûrê ya kê ye, ya min jî li dû wê ye, bila haya te jê hebe ha.

Sarê, du gulokên cûnik ên tayê orlon di dawa kirasê wê yê gulgulî de bûn. Bi ti-xikê qazaxên zivistanî bi heqdestê xwe ji niştecihê taxê re çêdikir. Di nav taxê de ya ku herî baş qazaxên destan ji hiriye çêdikir ew bû. Debara mala bavê xwe bi çêkirina qazaxên rîs dikir. Weke kerê ba li ber guhan bikeve, serê xwe rakir û hejand, zîq li berjêrê biniya hewşê nihêrî Hewê, tiştê bi ber çavên wê neket.

Sarê, derd û kulên xwe bi tayên orlon li ser qazaxên ku çêdikirin dineqîşand û ew qazaxê ku ji destgirtiyê xwe re çêkiribû, kêfa wê pir ji modela wî qazaxî re hatibû, tim û tim ew model çêdikir. Mirov çav bi kîjan qazaxî diket modelên ku wê çêkiribûn li ber çavan dialiqîn. Qet kesekî nika-ribû modela wê teqlît bike. Şênîyên taxê li ber deriyên wê bûbûn qor, weke gêrikan dabûn dû hev. Çi êşa laşê mirov hebû wî qezaxî dimêt û bayê di laşê mirov de bûbû gerîneka êşê, bi germahiya tayê orlo difiridî û diseridî. Sarê, her roj xwe gûfî hewdikê bîra destgirtiyê xwe dikir. Tovê bîra wî di cihokên dilê wê de li ser şîpa bîra wê diherikî, ji nû ve di kesayetiya wî de qor bi qor acir dida. Tovê zexm dibişkuvand di bişkoken qalikên kirasê bawerîya wê de. Sixurên romê, destgirtiyê wê kiribûn derba şevê, lê wê derbên mezin li bêbextiya bê yom dixist.

Hewê, xwe gihand malê, xezûrê wê yê kal tim qirika wî ziwa bû, sibê êvar digot “av” te digot qey qet avê venaxwe! Yên lê binihêrtina wê bigotina “Li ber sikratê ye, ma qey av tune ye ku bidinê.” Feqîro, kurmê wî nedişikest, carinan ava weke cemedê vedixwar, carinan jî keys pê dixist, bi dizî kirtekirta wî bû, cemed dikeritand, lê dîsa jî herareta wî danediket. Tasek ava cemedî di quleteyna dilê wî de kir, sermiskara lata dilê wî yê hişk nermijî, miskar jê re vekir û ava qerisî bi ser

cihoka wî de qeliband. Oxînî ji nav kewar û şikêrên qûçên dilê wî de dihat. Di cih de serî di ber de dewixî û pixînî ji nav lêva wî lerizî. Pingpinga mêşa li dora qeliştêka lêva wî de xortima xwe diavêt binê birîna wî û ruhê wî dimêt. Hewê hay jê çêbû ku mêş dikê ruhê wî bistîne, ew bawesîn kir û şalekî tenik bi ser yextiyarê malê ve wer kir.

Qumatka wê jî di dergûşa darîn de, bi pêlîstoka di dergûşê de aliqîbû, dileyst. Ew ji qumatkê derxist, kincên wî guhert, her du pêsîrên xwe avêt devan, ew têr kir û dîsa temirand. Berê xwe da mizzênîyê, zexîrey xwe ji erê de amade kiribû, dîsa bi guhikên ceheran girt lê nikaribû bikişanda, bangî qîza xwe kir ew jî hat, alî wê kir kişand, li koşa kevçîdankê danîn.

Feqîra Hewê, hîn nû Xwedê zarokek dabûyê, hîn çilê wê neqediyabû, li aliyê din xezûrê wê weke zarokan tim lêmiqatin dixwest. Du qîzên wê li teniştê hev di xew de bûn, lê destê wê lê nedigeriya ku wan ji xewa şêrîn rake û digot “Hey min tu rehetî nedît û tu tahm ji xwe nekir, de bila qîzên min têr xewa xwe bistînin, ew piçekî rihetiyê bibînin. Keçên wê xewên şevan li wan bûbûn hesret. Ji bona xizmeta kalê xwe tim li ser tutikan bû. Çavên xwe vekiribûn xwe di nav kar dîtibûn, ne dizanibûn listîk çi ye û ne jî dizanibûn bilîstina. Li nav taxê, zarok ji xwe re li bisiklêtan siwar dibûn, ew jî çav li bisiklêtê ketibûn û dilê wan dibijiyayê, lê derfet û dirav tune bûn. Tenê di xeyalên xwe de karibûn lê siwar bibûna û di xeyalan de jî çêkirina bisiklêtên ji heriyê... Gava bavê wan hat mal, zarokên malê cilhetê xwe civandibûn ser hev û tenê daxwaza kirîna bisiklêtê kiribûn û bavê wan kirîna bisiklêtê spartîbû xwe. Bavê wan ji wan re bisiklêtek kirî. Ev feqîrên Xwedê her roj li ser erdê bi palûte bûn, carna jî li ber lemê pembo tevîr dikirin, carinan jî diçûn kevir û bixurên li nav tîrên şûvan, carinan jî diçûn baqên nîskan, kefa destê feqîrên zarokan bûbû wek êzingan, ji ber karên zehmet bûbû peq û wer di nav ava qerisî de, pêçiyên destên wan bi hemdê xwe terikîbûn,

piyên wan ên zarok mîna yên kalokan qert bûbûn. Bi wî halê betilandî jî alîkarî bi malê û bi kalo re dikirin.

Tiretira tirêmpêlê hat, dengê ji trêmpêlê dihat, te digot qey loqimê dinamîtê di nav zinarên hesinî diteqe. Teqteqek ji singê trimpêlê dihat, hîn mirov lê siwar nebûbû, sing û berê mirov dihatin xwarê. Gelo mirov di pêxîra vê tirimpêlê siwar bibe, wê çawa be? Textikên li hawirdora qamyonê dorpêçkirî, kiribû wek hêlîna leylegê bixuyê. Textik firk bûn û sura bayê xezebê çi di hindurê qamyonê de be, wê bi serma xwe bişewitîne û nahêle starî têkevê.

Mala Hewê bar kirin, xatir ji cîranên xwe xwestin. Temiya mala xwe da cîrarên xwe, bi kulman hêsirên ji kaniya dilên dilveqetandî dû qamyonê avreş kir. Lê qamyon weke hespê xam dida çargavan û di cih de disekinî û nedihîşt kesek nêz bibe, zîtok davêt dora xwe. Hewê got “Ev ne tu hawe ye, teqteq ji hindurê qamyonê anî, zîlamê wê fêr kir ku tiştêk bûye, ajotvan tirimpêl da sekinandin û peya bû, gazî Hewê kir, got “Çi bûye” Hewê “Ma nav û dilên me hatin xwarê û kulîmek bi me ve neman, ji bo Xwedê ma ev çi tirimpêla xerabe ye, feqîrê kalo parsû pê ve tune ye, taqet pêre nema, ma we ruhê me li erdê dîtiye? Ajotvan gotê “Hilma xwe fireh bike rê nexweş e, em derkevin ser riya qîrê ez bawer im wê tu gazinek we nemin.” Hevserê Hewê bi dora qamyonê ket, ji zarokan re çend şekirên qulpikî û kulorên kuncîkirî dirêjî wan kir. Li kêfa wan pirsî, bi kenê xwe mizmiza li dora lêvên Hewê maç kir. Bavê xwe jî ramûsa, li kêmasiyên wan pirsî û xwe ji qaseya qamyonê hupî erdê kir. Kêmaniyên ku karibe li wir hal bike ji ajotvan pirsî û li wir hawirdor bi çend şemedan û tejikên rîs zexm girêda û şîrîd di qulpikên qaseya qamyonê derbas kir û şidand.

Zarok pir kêfa wan dihat, di jiyana xwe hîn nû berê xwe didan rîyeke dûr û baja-rekî xerîb. Ji kêfan bibikên çavên wan şewq didan. Li dora kalikê xwe diçûn û dihatin, xwe li ser wî hup dikirin û diya

wan bi wan re dixeyidî, lê kalo bi diya wan re xeyîdî got “Dev ji nazik û nalînan berde. Zarok gihayê caris in, dev jê berde bila li her derê bîn.” Bi vê kêfxweşiya wan diya wan jî êşa xwe û serma di neqeba tixûbê xizaniyê de, ew dadîqurtand ji bîr dikir. Kalê wan bangî zarokan kir û ji wan re çend meselok got û şûnde, zarok û kalê xwe di hembêza hevdu de weke sorînga tavê di singê şevê de çûn xwarê. Jinik difikîrî ji bona pêşerojê, diponijî. Diya wan bûbû wekî mirîşka gêj, serî li ser wê nediedilî, rabû ser piyan, got “Ez ê lihêfê bi kalo û zarokan ve wer bikim. Bû wîzewîza dengê tirimpêlê, ji nişka ve gumînî ji qamyonê hat. Lihêf û jinik pengizîn, li bin guhê textikê rîziyayî ketin û ji qamyonê ketin xwarê, di qelişteka li ber erdê çandî wer bûn. Şîfêr li ser direksiyonê jiyanê di xew de çûbû. Dîreksiyon jê

re bûbû destiyê tabûtê. Mêr jî bi çavniqsanî di gerîneka jiyanê de temirî. Hewê, serê xwe rakir qet li birîna xwe mêze nekir, gazî zarokên xwe kir. Kalo bi çengurê zarokan girtibû, xistibûn paxila xwe û ew bi hûkirina hilma xwe stirandibûn lê ji tînan şînaqî bûbû. Tenê “av av av av av”a wî bû.

Hewê, bi birîna xwe, xwe gihand kalo, lê kalo li ber mirinê bû, ji tînan dikira bifetisiya, diperpitî, hema te digot qey wê ruh jê biçe, destên wî li zarokan hat civandin, zarok vecinîqîn. Hewê bi hilmekê her du pêşîrên xwe dor bi dor daqulî devê kalo kir. Kalo ji nû ve bi ser xwe ve hat, pêçiyên wî ji hevdu vebûn, zarokan ji nav lepê kalo bazdan. Xwe çendî hembêza diya xwe kirin.

Di qirika xizaniyê de du niqût jiyan niqûtibûn.

Du dilop qehr

Dema hişyar bûm ji xewa giran
 Û rizgar bûm ji xeyalên qedexê
 Û min vekir çavên xwe li rastiyê
 Li hember tunebûna te
 Wek ku li neynikê binihêrim
 Li ser lêvên min şopa lêvên te
 Li ser hinarokên rûyê min du dilop qehr
 Min serê xwe rakir ji dojehekê
 Û min temaşe kir li ramanên evîna xwe
 Du dilop hêsir, du dilop qehr bû
 Ji kortikên çavên min bi zora xwe
 Têdikoşin û diherikin bi dizî
 Bi ser hinarokên rûyê te ve
 Diherike bi dizî
 Diherike dojeha dilê me

Lê ne vedimire agir
 Û ne hênîk dibe kezêba me
 Du dilop hêsir, du dilop qehr
 Bi janneke mezin dinîqutin dilê me
 Rivînek jê diçe û hol dibe evîn
 Li çar hawîrdorê dilê me digere
 Min dişewitînin bêyî te
 Te dişewitînin bêyî min
 Du dilop qehr...

Semra ÇELEBÎ

Xewn

Îşev, dergehê xewnan nagirim
de were...
Berî ejdehakê tenahiyê şiyar
bibe
Û di kirasê şevê de min ve-
şêre
Li bahozekê siwar be û were
Bablîsokekê diyar bike

Tovê xwedanan biweşîne
Ji meya dil beyarê bêriyê av
bide
Belkî...
Xewnên min ji dayik bibin
Û bi hilatina rojê re
Gulek şîn bibe
Yan jî, xwedayek, xwe bide

Deryayekê dixwazim

Te digot:
Xweşiya jiyana te me
Bihara viyana te me
Lê, te dizanibû ev war, warê girtîgehan e
Evînî, gunehê jinan e
Tu jî wek vê civakê, tirsonek î
Dilê te zîndan e
Kevok, ji zîndanên hez nakin
Gul, di tarîstanan de najîn
Evînî, di sihê de mezin nabe
Dîsa, min ji te re digot:
Ez çemekî bi hêz im
Bi xumxum û dirêj im
Deryayekê dixwazim
Evîn û jiyane, lê belav bikim
Gola te têra min nake
Dergehên deryayê veke
Yan, ji rêya min derkeve

Bawerî

Te di xewê de dibînim
çûna te dibînim
xwe amade dikim ji çûnê re
stêrên min ji dîdarên te re dayîn
hev,
yek bi yek darve dikim
li piştê xwe girêdidim
Gulên ji roniya çavên te bişxivîne
li ser kirasê xwe wer dikim
xewnên li ser singê te min dîtin...
ristikin li ser gerdana min in
bi tilîyên te porê xwe şêh dikim
helbesta cara yekemîn, di nav de
diçînim
dizanim...
di dilê te de nîgareke efsane me
Lê, bêdengiya te dibêjê:
çûn bê vegeer e
ne xem e
dilê min bawermend e

Nesrîn EHMED

Cemaeta kuştinên razdar

Înan EROGLÛ

Wê rojê betilîbû. Wexta ji kar vegeriya qet tiştekek nexist devê xwe. Ehmed, bûbû nîvro jî, hîna di nav xewnên şîrîn de bû. Ji nişka ve dengê bi ber guhê wî ket.

- Lo Ehmed! Lo Ehmed!

Ehmed dixwest rabe, lê xewa wî giyanê wî guvaştibû. Xewnên wî, ew mist didan. Careke din jî eynî deng hat.

- Lo Ehmed! Lo Ehmed!

Ehmed ji nişka ve pengizî hat ber paceya ku li hewşa xwe dinihêre. Paceya wî ev bûbû sê sal ku zarokên gund bi çetelastîkan derizandibûn. Ehmed dît nedît ku diya wî di bin lingên çêlekê de ye. Û çêlek bi zîtikan wek ga erdê bikole wê di-kişîne bi aliyê xwe ve ga jî bi zîtikên xwe wê tehn dide.

Jina Ehmed, Xatê wexta golikê ji gûhanê diya wê vediqetine, çêlek weke ku ji vê bûyerê hêrs bûbe, li ber xwe dide ku nêzî golikê nebin, lê Xatê golikê ji diya wê vediqetine û tîne dixwe axurê. Gava kurê Ehmed - ku hîna 5 salî ye - di ber çêlekê re derbas dibe, çêlek bi zîtikên xwe wî dixwe bin lingên xwe. Diya Ehmed, Xaltiya Fatim neviyê xwe dibîne, gava dibîne ji ser nêrdewana hesin bi lez dadikeve. Gava ji nêrdewanê dadikeve bi bazdan diçe neviyê xwe xelas bike, lê vê carê jî çêlek Xaltiya Fatim dixwe nav lingên xwe.

Sê kurên Xaltiya Fatim hene. Lê gava di nav zîtikên çêlekê de ye tenê navê kurekî wê tê bîra wê: Ehmed.

- Lo Ehmed!

Çêlek weke ku Xaltiya Fatim leyîstok be, ji serî heta binî, bi zîtikên xwe pê dileyîst. Zîtik herî pir li rûye wê û gerdena wê diketin.

Ehmed wexta ji nav nivînan dipengize, xwe nîvtazî diavêje derve. Dengê Xaltiya Fatim diçe Xatê jî, lê Xatê xwe li kerîtiyê datîne. Ehmed dibîne ku çêlek fistanê diya wî yê ku bi gulên rengîn hatine neqş-kirin qetqetî kiriye. Ehmed bi lez destê xwe diavêje çengê diya xwe û diya xwe bi

erdê ve kaş dixe.

Çêlek rûyê Xaltiya Fatim di xwînêde di-hêle. Û heta ber pêsîrên wê jî di nav birînan de di-hêle.

Ehmed bazdide malê betaniyekê tîne ji bo diya xwe pê binixumîne. Ehmed bi eynî lezê tê ser diya xwe û diya xwe bi betaniyeyê weke ku hembêz bike, dinixumîne. Ji aliyekî ve jî bi betaniyeyê xwîna ser rûyê Xaltiya Fatimê paqij dixe. Xaltiya Fatim dîsa bi eynî gotinê bangî Ehmed dixe.

- Lo Ehmed!

Ehmed ji çêbûna xwe ve li gund dijî. Kaniya neftê li pişt erdê wî derdikeve. Ew û bavê xwe jî vî karê neftderxistinê dikin.

Dengê Xaltiya Fatimê diçe cîranan û heta mala herî dûrî wan jî bi dengê Xaltiya Fatimê dihesse. Gundî li hewşa wan, li ber serê Xaltiya Fatimê dicivin. Xatê xwe li kerîtiyê datîne, lê wexta dibîne gundî yek bi yek tîne hewşa wan li ber serê Xaltiya Fatimê dicivin, ew jî ji axurê derdikeve tê cem Ehmed.

Kurê Ehmed ê ku ji xezeba çêlekê filitî, xwe bi birîneke biçûk xilas kir.

Her du birayên Ehmed jî tîne cem diya xwe. Xaltiya Fatim zendê xwe diavêje stûyê Ehmed û rûyê wî di ramûsanên de di-hêle. Ehmed dît nedît hêstir ji çavên diya wî dihatin.

- Na! Na yadê!

Ehmed bi tiliyên xwe hêstirên diya xwe paqij dikir. Xaltiya Fatim:

- Lo Ehmed!

Wê rojê Ehmed diya xwe bi erebeyeke gundiye xwe bir nexweşxaneyeye Bismilê. Xaltiya Fatim şevêkê li nexweşxaneyê hat razandin û dîsa bi eynî erebeyê, bi kîsî-kekî tijî derman vegeriya malê.

Xaltiya Fatim rojekê ne hat ser heş. Ehmed û bavê xwe ji ciyê kar du rojan destûr xwestibûn. Gava Xaltiya Fatim bi ser heşê xwe ve hat, çavê wê li Ehmed digeriya. Gava Ehmed nedît, got:

- Lo Ehmed!
 Ehmed ji nişka ve ket derî, hat li kê-
 leka Xaltiya Fatim rûnişt. Got;
 - Bêje yadê.
 - Kurê min, ez ji mirinê filitîm.
 - Werê nebêje yadê.
 - Na... Tu zanî: Ez di nav zîtikên çêlekê
 de li mirinê fikirîm û min mirin tehm jî
 kir. Lê ez niha li vir im, li cem we me. Ez
 ji mirinê filitîm.

Di vê nave re kurê Ehmed, wî yê ku ji
 xezeba çêlekê xilas bûbû, tê dikeve hem-
 bêza bavê xwe.

- Yadê, tu pir baş î yadê. Te heyata
 kurê min xilas kir, ne ji te bûya niha be-
 dena wî ya biçûk di nav zîtikên çêlekê de
 ecîqîbû. Te ji bo wî canê xwe feda kir
 yadê. Ez vê qenciya te ji bîr nakim, dibêje
 Ehmed.

- Ez zanim berxê min, ez zanim tu ji bîr
 nakî. Tu jî vêya ji bîr nekî Ehmed: Wexta
 ez di nav zîtikan de bûm, tenê tu hatî bîra
 min, dibêje Xaltiya Fatim, wexta li her du
 kurên xwe dinihêre.

- Ez jî ji bîra nakim yadê.

- Ehmed a niha her tişt tê bîra min. Ez
 fam nakim, çima wexta min digot; "Lo
 Ehmed!" gundiyên me hemû gihîştibûn
 hawara min; lê bûka min -li Xatê dini-
 hêre- dawîya hemûyan hat. Û ya herî nê-
 zîkî min bû, bûka min bû. Xatê:

- Ma deng nehatiye min.

Xatê gava li çavê Ehmed dinihêre, fê-
 m dike ku dibêje; "Ez ê te li malê bibînim".

Di vê navê re bavê Ehmed dikeve hundir

- Oo! Va ye tu baş bûyî.

- Erê. Bi ken dibêje Xaltiya Fatim.

- Baş e, min soz dabû Xwedê ku wexta
 tu bi ser heşêw xwe ve werî ez ê mewlûdê
 bidim. Û va ye tu bi ser heşê xwe ve ha-
 tiyî. Em ê îro beranekî serjê bikin û li
 gundiyan belav bikin.

Ehmed û her du birayên xwe beranekî
 ku bi qasî kiloyê mirovekî be anîn serjê
 kirin û li gundiyan belav kirin.

Ehmed û birayên xwe, goştê beran,
 wekhev li gundiyan belav kirin. Ê jî ber
 ma jî ji xwe re hiştin. Gava Ehmed vege-
 riya malê, çavên xwe li jina xwe gerand.
 Wexta nedît bi dengê bilind gazî jina
 xwe kir.

- Xatê! Wa Xatê!

Xatê dikeve hundir.

- Ha!

Ehmed destê xwe diavêje milê Xatê.

- Te çima diya min xilas nekir. Çima
 deng çû her kesî, deng neçû wan guhên
 te yên weke keran.

- Çawa.

- Çawa û quzilqurt. Wê kurê me xelas
 kir, wê ji bo kurê me canê xwe feda kir.
 Tu nêzikî wê bûyî, tu çima neçûyî alika-
 riya wê.

Xatê deng ji xwe nayîne. Ehmed jî heta
 ku jê tê bi şîmaqan li Xatê dixê.

Xaniyê Ehmed û bavê wî cihê ne; Lê
 xaniyê wan di eynî hewşê de ye. Siberojê
 Ehmed ku hînê neçûye kar, diçe mala
 diya xwe. Gava ku diçe diya wî her qala
 xirabiya bûka xwe Xatê dike û her gotina
 ji devê Xaltiya Fatim derdikeve li ser bûka
 wê ye. Ehmed jî her qala lêxistina ku li
 Xatê hatiye kirin dike. Hingî Xaltiya
 Fatim qala xirabiya Xatê dike, Ehmed bi
 hêrs:

-Ê de bese yadê, her ku ez hatime tu
 qala Xatê û xirabiya wê dikî. Ma em çi
 bikin ev jî para me ketiye. Xatê xirabiyek
 û neheqîyeke mezin li te kiriye. Ma ji ber
 vî tiştî ez wê bikujim.

Gava gotina "ez wê bikujim" ji devê
 Ehmed derdikeve, Xaltiya Fatim xwe na-
 gire û hêstir ji çavên wê dibarin. Xaltiya
 Fatim, gava ku digirî dibêje;

- Na!

Piştî vê gotinê Ehmed ji hundir derdi-
 keve, diçe li nava gund digere, lê naçe
 karê xwe.

"Çima kalên me li vî gundî bi cî bûn" di
 dilê xwe de dibêje Ehmed. "Bila biçûna li
 gundekî din bi cî bibûna."

Gundê Ehmed, zivistanê di nav heriyê
 de dimîne û gelek cî dibin lîtav. Wexta
 havîn tê lîtav ziwa dibe, lê wê gavê jî erd
 kerkotî dibe.

"Ev çi mêş in!" Di dilê xwe de digot
 Ehmed. Ehmed, weke ku bi şîmaqê li yekî
 bixê, bi destê xwe mêşan ji ber xwe dida
 alî. Bûbû şev, Ehmed hîn neçûbû mala
 xwe. Ewteewta kûçikan serî lê sor kiribû.
 Gote; "ya Ellah!" û rabû, rêya malê girt.
 Gava hat malê tevî kincên xwe yên kar

xwe avêt ser nivînan. Dixwest rabe, çend sîleyan li Xatê bixe û dawiyê razê; lê di xwe re nedît.

Ehmed betilîbû, lê xewa wî nedihat. Her diramiya: “Em kurd, li hev neheq in. Em kurd; li me neheqî hat kirin. Em kurd; di bin nankoriyê de man. Em kurd; nezan man, em nezan hiştin.”

Bûbû sibe, bavê wî hat gazî kirê, ji bo ku herin kar. Ehmed êdî ji karê neftderxistinê aciz dibû. Dozdeh saet şuxilîn ne li gorî wî bû. Ehmed û bavê xwe wê rojê, ji dozdeh saetan hindiktir şuxilîn.

Ehmed gava ji kar vegeriya, bi şîmaq û kulmên xwe, car caran jî bi pihînan li Xatê dixist. Êdî lêxistin ji Ehmed re bûbû kurm. Her ku ji kar vedigeriya, karê wî yê pêşîn lêxistina jina xwe bû. Vê lêxistinê deh şevan dewam kir, heta ku Ehmed hat mizgîniya xwe li diya xwe kir.

- Qewet be yadê.

- Sax bî kurê min, di nav qawetê de bî. Xêr e?

- Weleh xêr e yadê. Çavê te ronî be!

- Li ser lingan neseke, were rûnê.

Xaltiya Fatim kûrsiyekî ji Ehmed re tîne.

- Ka de bêje.

- Min Xatê kuşt, yadê. Bi kenekî sivik dibêje Ehmed.

- Çii!

Şaş û mat dimîne Xaltiya Fatim.

- Erê, Erê, te rast fam kir. Her şev min li Xatê dixist. Do jî gava min serê wê li dîwarê hundirê me xist, ji nişka ve li bin guhê erdê ket û ranebû. Min fam kir miriye.

Xaltiya Fatim şaş û mat mabû. Ji ciyê xwe nedileqiya û devê wê ji hev çûbû. Ma weyekê wiha di ciyê xwe de mabû. Wexta bi ser heşê xwe ve hat termê bûka xwe li ber lingên xwe ditibû. Xaltiya Fatim bi girî got;

- Çima te wiha kir kurê min!

- Ji bo te yadê, ji bo her du çavên te.

Giriyê Xaltiya Fatim nedisekinî. Ehmed:

- Negrî yadê, îro roja me ya xêrê ye.

- Lo Ehmed!

Xaltiya Fatimê xwe avêt hembêza Ehmed û giriya.

- Min ji bo te jina xwe feda kir yadê, ji bo tu negirî; lê ez dibînim ku tu digiriyî.

Xaltiya Fatim:

- Çima te were kir! Çiqas diçû dengê wê bilindtir dibû.

- Ji bo te yadê, ji bo te! Ew jî bi dengekî bilind û hinekî jî bi hêrs dibêje. Ma te ji bo kurê min canê xwe feda nekir!

- Ma ji bo tu jina xwe bikujî min xilas kir!

- Na yadê, werê nebêje!

- Lo Ehmed!

Ji wê rojê pê ve Ehmed li gund hew hat xuyakirin. Meriv digot qey erd qelişibû Ehmed jî ketibû navê. Rojek ji rojan kesî negot: Va ye me Ehmed li vî welatî, li vî bajarî yan li vî kolana ditiye.

Kuşîna Xatê, li nav gund hat şîrovekirin. Her yekî/ê li gora xwe çîrokek çêkiribû. Rûspiyên gund, her roj li mala gundiyekî dicivyan û çîrokên li ser Ehmed hatibûn çêkirin digotin. Yekî digot; “Bi şûrê Hezretî Elî jina xwe kuştîye”, yekî din digot; “Ehmed sêrbaz e”, yê din digot; “Na, Ehmed zilamê dewletê ye, bi ajanî şandine gundê me”. Û her wiha gundiyan her roj çîrokek diafirandin û ev çîrokên ku rûspiyên gund navê “Cemaeta Kuştinên Razdar” lêkirine dixwendin.

Tê gotin ku her salvegera kuştina Xatê, jinek ji aliyê mêrê xweve tê kuştin. Heta ku jin li gund biqedin.

Sewitiyo gundo

Ey şewitiyo gundo
Neçaro sirguno,
Penabero mihaciro,
Heçî ku bi çavê seriyên nedîtibe
Bê lome be ji vî derdî re bê lome be!

Payîzeke melûl
Û xayis bi ser te ve hat
Bêwestan;
bi kerb û neşadiyên zilûmatî,
bi delodînî qulqulî kir rûqala te ya keçkanî

Xwezî ax... Xwezî
Şewitiyo gundo
Ji xêra Xwedê re
Min serê xwe daniya ser xaka te
Ji xwe re têr bigiriyama
Mijangên xwe bikira giz
Paqij bikira ew qilçên;
Zivzîve û tîrk...
Û dilê xwe rihet bikira

Ey şewitiyo gundo
Ey hêviyên kesaxtî,
Hestên hêrifîn,
Şewatên bê meqam,
Wechê mehzûn,
Cîwarê bi gulebaranan şilûpil,
Xeberoşkbêjê lalûte,
Rojnivîska rênivîsa wê xerabe,
Hêmaya helbestnûs û wêjenasên belengaz
Ez qebûl nakim!
Weke teniya sêlan; ripîreş
Bila ew dû here wir
Zingil were vir

etar hat

Ala çi ye yadê?
Li ser benderan
Sêlekên taxa ereban
Sê nepoxên kesk û
sor û zer
Bi benik vedikirin
Digotin "va ye alaya
me"
Û difirandin ezman

Yadê
Wa ye etar hat
Li ber derî ye
Tîştan dide bi hêkan
Nepoxan jî difiroşe
Û sê hêkên me hene

Yadê
Sê nepoxan bikire
Her yek bi hêkekê
Bila rengê wan
Kesk û sor û zer be
Û ez jî bi benik ve bikim
Bifirînim ezman
Bêjim "va ye alaya me"
Wek sêlekên taxa ereban

Rêdûr DÎCLE



Amadekar: **Serwet DENÎZ**

✶Kurtenêrînek li şanoya Daykî Niştimanê
Dêrsim OREMAR

✶Bi kurdî şano kirasekî ji êgir bû
Kemal ORGÛN

✶Charlie Chaplinê kurdan Şalikoyê Bêkes
Mehmet ÇAKMAK

✶Paşxaneya dîrokî
Muhsîn OSMAN

✶Şanoyê çawa dest pê kir li ku û çima
Kawa ŞÊXÊ

✶Kurterexneyek li şanoya kurdî
M. Emîn YALÇINKAYA

✶Kurtedîroka şanoya kurdî
Kemal ULUSOY

✶Birîna dilê min
Ronî PÊXÊLSOR

✶Arsênê Reşîr POLATOV

Awayê derbirînê yê herî kevnare. Şîn, şahî, listik, perwerde, ayîn, çerxa felekê, têkiliyên bi xwezayê re, hêvî, tirs û gelek tiştên din. Ev tev bingeh/jêderên şanoyê û di heman demê de mijarên şanoyê ne. Şanoyê duh di nav çalakiyên civakî û hunerî de cihekî girîng digirt, îro jî.

Ji bo kurdan jî şano mijar û hunereke girîng e. Wan jî li gor jiyan û têkiliyên xwe awayên seretayî yên şanoyê afirandine. Wek kalikê sersalê, bûka baranê, kosegelî û gelek listikên din ên dema xebat û şahiyên bi vî rengî.

Şanoya kurdî ya nûjen wek rewşenbîriya kurdî ya giştî derengmayî ye. Memê Alan, Koçekê Derewîn, Dayîka Niştiman, Birîna Reş mînakên pêşîn ên şanoya kurdî ne û di heman demê de hewldanên rewşenbîrî û perwerdekirina civakê ne. Dibe ku îro hinek kes pozbilindiyên ji xwe zêdetir bikin û vana neecibînin û bixwazin wek tiştên ji rêzê pêşkêş bikin. Lê bi bawerîya me ev mînak hewldanên giranbuha û pir hêja ne. Em bi vî mîratê gihîştin îro. Êdî em dikarin “şanoya kurdî” nîqaş bikin û binirxînin. Ji bo îro mirov dikare wiha bibêje; tevî ku gelek kar û xebat û çalakiyên hêja hene jî em nikarin bibêjin ku şanoya kurdî pergala xwe ava kiriye û rengê xwe diyar kiriye. Lê vî pêvajoyê jî dest pê kiriye.

Bi vî dosyayê me xwest ku em şanoya kurdî ya di vî rewşê de nîqaş bikin, hinek tiştan bi bîr bixin û wek rojevekê derxin pêş. Mijar ji gelek hêlan ve dikare bê nîqaşkirin û em ê hewl bidin ku di hejmarên pêş de jî mijarên der barê şanoya kurdî de biweşînin. Em kesên ku ji bo şanoya kurdî ked dane û xwêdana xwe rêtine (bi taybetî pêşengên vî karî Evdîrehîm Rehmî Zapsû, Erebe Şemo, nivîskarê Dayîka Niştiman, Apê Mûsa û kedkarên wek Arsên Poladov û peyrewên wan) careke din bi rêzdarî bi bîr tînin û spasiyên xwe pêşkêşî kesên ku piştigirî dane dosyeya me, dikin.

Kurtenêrînek li şanoya Daykî Niştîmanê

Dêrsim OREMAR

Peyva şanoyê:

Hebûna şanoyê di nav her welat û her neteweyekê de şaristaniya wî welat û wê neteweyê nîşan dide. Kurdan heta destpêka sedsala 20'an bi awayekî nûjen û rojavayî şano nedîtîbûn û bo cara pêşîn Mehviyê Helbestvan di dawiya sedsala 19'an de wisa pesnê şanoyê dabû!

*"Dunya tiyatro ye, mewestê tiya, biro
Kê mayewe ke nebûbê tiya, tiro"*

Mehwî deqa navê biyanî bi kar tîne (Teatre), ku ev nav jî di çanda kurdan û di zarogotînen Kurdî de rengê ne qenc bi xwe digire û wateya rastîn a viya diguhirîne. Ji destpêka sedsala 20'an û pê de zaravayên din ên pêwendîdar bi hunera şanoyê weke: piyes, drama û tiyatro di rojname û belavokan de reng dan. Caran peyvên "nimayîş û temsîl" jî hatine bikaranîn, lê ew peyv jî farisî û erebî hatine nava kurdî. Gelek caran jî "Misrehê mifah" hatiye wergirtin ku bingeha wê jî erebî ye.

Bo cara yekemîn di nîveka sedsala 20'an de helbestvanê nûxwaz ê kurd Ebdulah Goran peyva şano li şûna nimayîş, mesreh, temsîl û tiyatroyê bi kar anîye ku ev jî di bingehe de jî peyveke Îtalî ya bi navê "Şên no" hatiye wergirtin. Lê bi desttêwerdan û guhartînen bi şewaza îroyîn derketiye û ketiye nav zimanê kurdî. Her çiqas "şano" peyveke bi koka xwe kurdî nîn e, lê di dema îro de şiyavtîrîn û bêti-

rîn nav jî bo vê hunerê ye. Peyva "Scene", "Şênê" yan "Şên No" peyveke îtalî ye ku di fransî û îngilîzî de bûye "sen" û di farisî de jî "siên" bi kar tê. Mirov dikare ola Zerdeştî, ayîna Medan wek dayîka şanoyê bizanibe, ji ber ku ji rewayet, vegêrana ayet û diyalogan pêk tê, mirov dikare ji pirtûka pîroz a zerdeştîyan, Avestayê çendîn şanonameyan derbixe. Bi baweriya Îbrahîm Ferşî yekemîn şanoname jî Gatayan bûye.(1)

Rojhilatê Kurdistanê û

pêşengtiya şanogeriya kurdî

Rojhilatê Kurdistanê jî pênc wilayetên; Urmîye, Sine, Kirmaşan, Îlam û Loristanê pêk tê ku jî aliyê sirûştî û kanên binerd ve mîna perçeyên din ên Kurdistanê gelek bedew û dewlemend e. Rojhilatê Kurdistanê jî bi dirêjahiya dirokê bûye meydan û şahidê gelek serhildan û bûyeran ku di diroka gelê me de xwedî girîngiyeke taybet in.

Bajêrê Mihabad an jî Madabad, navenda herêma Mukriyan e. Herêma Mukriyan û navenda wê bajarê Mihabadê her çend di cografyaya Kurdistanê de cihekî biçûk in jî, lê di dergûşa xwe ya kevnare de gelek qehreman û kesayetiyên mezin perwerandine. Mihabad jî ber gelek bûyerên siyasî, ferhengî û mêjûyî di diroka serhildan û azadîxwaziya neteweya kurd de xwedî cihekî taybet e. Bi taybetî di warê xebata ramyarî de gelê herêma Mukriyanê xwedî kedeke dirokî ye.

Ji wan bûyerên dirokî damezirandina Komeley Jiyanewey Kurd (JK) û piştî jî avabûna Komara Kurdistanê di zivistana sala 1946'an de bû.

Her çend der barê komara sava ya Kurdistanê de gelek babet û lêkolînen heja jî aliyê mîsyoner, nivîskar, lêkolînerên kurd û biyanî hatine kirin lê hin aliyên wê hîna jî di bin siya jibîrkirinê de ne.

Komeley Jiyanewey Kurd (JK)

Piştî ku di 25'ê Rêbendana sala 1941'an



Lîstîkvanên Daykî Niştîman

dewletên yekgirtî, ku li dijî faşîzma Hitler û hevalbendên wî şer dikirin, hatin Îranê û Îran jî ji aliyê başûr û bakur ve dagîr kirin, rejîma Rîzaşahê Pehlewî bi vê bûyerê li Kurdistanê wenda bû û gelê kurd jî destê zordariya selteneta Pehlewî rizgar bû.

Di sala 1937'an de çend rewşenbîrên herêma Mukiryanê li dora hev kom bûbûn û komeleya Jiyanewey Kurd damezirandin û di demeke kin de gelek mirovên ji malbatên mezin û di nava gel de bi rûmet, bûn endamên JK'yê. Ji wan kesayetiyên: "Ebdulrehman Zebîhî, Mihemed Nanîwazade, Qasim Qadîrî, Mihemed Yaho, Husên Firoher, Mela Ebdullah Dawûdî, Qadir Muderisî, Ebdulrehman Îmamî Eqdem, Ebdulrehman Kiyanî, Sîdîq Heyderî Faroqî, Hamid Mazuçî, Elî Mehmûdî, Mihemed Selîmî, Mihemed Şahpesendî, Mihemed Eshabî, Necmedîn Tuhîdî û piştî jî Qazî Mihemed û her wiha jî başûrê Kurdistanê Mirhac û Mistefa Xoşnaw weke nûnerên hizba Hîwayê di yekemîn civîna damezrandina JK'ê de amede bûn.

Sedem û girîngîdan bi pêşkêşkirina şanoyê

Dema mirov li dîroka hemû serhildanên Kurdistanê dinihêre li rex karê siyasî, rêvebêrên bizavê buhayekî giran dane karê rewşenbîrî û hunerî. Bo nimune di çaxa serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî de koroya marşên neteweyî jî çend zarokên xwendîgehên bajarê Silêmanîyê pêk hatibû. Mamoste Pîremêrd, Fayîq Bêkes û Goran ku di bin bandora bizava Şêx Mehmûd de hisên wan ên neteweyî bilinditir bûne, tev di vê rîyê de bi rindî xebitîne. Her wiha di çaxê Komara Demokratîk a Kurdistanê (Mihabad- 1946) de koroya marşên neteweyî jî hebû ku Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê berpirsyartiya wê dikir. Her wiha beriya wê jî şanoyê rolekî girîng jî bo şiyarkirina gel dilist. Bêguman rewşenbîr û neteweperwerên kurd jî bi girîngiya xebat û karên çandî û kulturî hesiyabûn, bi awayekî

ku em dibînin piştî nemana desthilatdariya Rîzaşahê Pehlewî li herêmê, bizava rewşenbîriyê li melbenda Mukiryanê û bi taybetî li bajarê Mihabadê bi yekcarî geş dibe:

Avakirina Komeleya Jiyanewey Kurd JK'ê.

Pêkhatina Rêxistina Ciwanên Kurd, derkirina kovara "Niştîmanê" wek weşana fermî ya komeleyê di sala 1943'yan de.

Lidarxistina kongreya Komeleya JK'ê bi beşdariya sed (100) kesan li bajarê Mihabadê ku perepêdana karê propagandeyî û agahdarîkirina xelkê yek ji armancên bingehîn en wê kongreyê bû û bi ihtimaleke mezin hizra pêşkêşkirina şanosomeya "Daykî Niştîman"ê di wê çarçoweyê de çêbûye.

Xenî Bilûriyan ku wê demê endamê Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê bû dibêje: "Komeleya JK'ê jî me daxwaz kir ku em skêcekê binin ser sehneyê, Ebdulrehman Zebîhî şanosome da destê min û tevî Dilşad Resûlî şanosome perde bi perde jî bo min xwendin".

Nivîskarê Dayikî Niştîmanê, rayên cuda û pîrsa bêbersiv mayî

Heta niha gelek babet û rayên cuda derbarê nivîskarê şanoya "Daykî Niştîman"ê de jî aliyê lêkolê û nivîskarên Kurd û biyanî ve hatine nivîsandin lê bi giştî jî ber cudabûna raya wan û li ber dest nebûna belgeyên rast çî jî wan cihê baweriyê nîn in û tenê texmîn û raya lêkolê û nivîskaran bi xwe ye.



Kirîs Koçêra (Chris Kuschera) di pirtûka xwe ya bi navê "Kurd Le mouvement National/ Bizava Nasyonalîstiya Kurd" de wiha nivîsiye: "Qazî Mihemed çend şanosomeyên dîrokî û niştîmanperwerane jî nivîsîne, weke dramaya dîrokî ya Selahedînê Eyubî ku behsa xebata Kurdan li dijî xaçperestan dike, yan şanosomeya Daykî Niştîmanê ku behsa çarenivîsa gelê kurd piştî peymana Seidabadê (Sadabad) di navbera Îran, Îraq, Tîrkiye û Efxanîstanê dike, her du şano-

name ji li bajarê Mihabadê hatine pêşkêşkirin". Lê Suheyly Qazî, keça pêşewa Qazî Mihemed ku ji pirtûkxane û nivîsên bavê xwe agahdar bûye di wê baweriyê de nîn e ku ew şanone name ji aliyê bavê wê hatibin nivîsandin!

Di hin jêderan de û li gor belgeyên Îranê behsa şanone nameya "Selahedîn" hatiye kirin, ku di sala 1942'yan de û beriya damezirandina komeleya JK'ê hatiye pêşkêşkirin⁽²⁾ li gor gotina nemir Ubeydulahê Eyûbiyan ew şanone name ji aliyê birayê wî Mihemed Eyûbiyan ve weke yekem kes ku li bajarê Mihabadê şano nivîsiye, hatiye nivîsîn.⁽³⁾

Eyûbiyan her wiha digot: "Şanone nameya Daykî Niştîmanê min bi xwe nivîsandiye û weke lîstîkvan rola "Zarokê Niştîmanê" tê de lîstîye."

Texmîna ku şanone name Ebdulrehman Zebîhî yan Mistefa Xoşnav (ku wê demê weke nûnerê hizba Hiwayê li Mihabadê bû û nêzî komeleya JK'ê bû) nivîsandibin tu belgeyên diyar li ber dest nîn in.

Xenî Bilûriyan di wê baweriyê de ye ku ew şanone name ji Başûrê Kurdistanê hatiye û çend guhertin tê de hatine kirin weke guhertina Melik bo serokomar! Her çend di rojname, kovar û nivîsên Başûrê Kurdistanê yên wê demê de li ser şanogeriya kurdî hatiye nivîsandin jî behsa Dayikî Niştîmanê nehatiye kirin lê bi texmîneke zêde ew boçûn zêdetir nêzî rastiye ye ku ew şanone name ji Başûr hatibê!

Mîrhac Ehmed di wan salan de weke nûnerê hizba Hiwayê li bajarê Mihabadê bû û beşdarî kongreya JK'ê jî bûbû, çalakiyên Hiwayê bi piranî di nava rewşenbîr, nivîskar, rojnamevan û efseran de bû, di wan salan de berpîrsê liqa JK'ê li bajêrê Silêmaniyê nemir Îbrahîm Ehmed bûye, bi baweriyê nivîskar Ehmed Şerîfî ew şanone name ji aliyê Îbrahîm Ehmed ve hatiye nivîsandin.⁽⁴⁾

Sal û cihên pêşkêşkirinê û naveroka şanoyê

Di gelek pirtûk û nivîsan de li ser "Daykî Niştîman"ê wiha hatiye gotin û nivîsandin ku di serdema Komara Kurdistanê de yanî di sala 1946'an de hatiye pêşkêşkirin, lê ew boçûn jî rastiye dûr e û ew şanone name di havîna sala 1944'an de li Xwendengeha Pehlewî hatiye şîrovekirin û li geraca Evdilayê Kerbasî (sertir ji Hilalê Ehmer/heyva sor a niha) hatiye pêşkêş-

kirin.⁽⁵⁾

Ew şanone name li bajarên Mihabad, Şîno û Nexedeyê çû ser sehneyê û 40 roj, heta du mehan hatiye dubarekirin.

Mixabin teksta piyesê li ber destan nîn e û tenê tê zanîn ku şanone name ji pênc perdeyan pêk hatiye ku qala peymanê Seid Abadê ya di navbera Îran, Îraq, Tîrkiye û Efxanistanê de dike ku di sala 1937'an de hatibû morkirin.

Firişte, Seidabad, Daykî Niştîman, rizgarkirina Daykî Niştîman, sazûna Komara Kurdistanê

Piraniya teksta şanone nameyê jî helbestên şairê navdar Hecî Qadirê Koyî pêk dihat.

Bi kurtasî teksta şanone nameyê wiha bûye:

Periyek bi du peran û cil û bergên spî tê ser sehneyê û helbesta şairê navdar Hecî Qadirê Koyî dixwîne:

*"Ey bê nezîr û hemta, her tuy ke berqerarî
Bê dar û bê diyarî, bîdar û payedarî"*

Dijmin plan û nexşeyên serkut û tune kirinê bi rê ve dibin û qala plangîriya peymanê Seid Abadê li dijî gelê kurd tê kirin.

Daykî Niştîman bi cil û bergên reş û mûyên spî û di bend û zincîra plangêran de ye û helbesteke din a Hecî Qadir dixwîne û daxwaza azadî û rizgariyê dike.

Zarokên Daykî Niştîmanê bi hawara wê ve tîn, pêşmergeyên kurd tevî hevkarên xwe êrişî plangêran dikin û Daykî Niştîmanê azad dikin.

Gel radibe serhildanê, komara Kurdistanê ava dibe, desteya wezîran tê damezirandin, ala bilind dibin û serok tê hilbijartin.

Lê Ebdila Nehrî der barê teksta şanone nameyê de gotiye: "Şanone name li ser bingeha pênc risteyên helbesta şairê neteweyî yê kurd, Hejar Mukriyanî hatibû avakirin"

*Rawkerî bedxû, xwên rêjî xwên xor
Êwe bin û xuda, besîye zulm û zor
Le jêr balimda ray meperênin
Hêlanekeman lê merûxênin
Dindûkî şûşî, şûşey giyanimî
Xet û xalekey, hezî giyanime
Min le mergî xom dilim êş naka
Belam detîrsêm tîro xeta ka
Nedrêt le xom we rolem kewê
Cergim bibrê le şîrîn xewê⁽⁶⁾*

Menaf Kerîmî jî di nivîseke der barê şanoya Dayikî Niştîmanê de wiha nivîsiye:

“Îlhama eslî ya şanoyê ji 5 beytên helbesta şairê navdar ê kurd Ebdulrehman Şerefkendî (Hejar) a bi navê Cuceley Niştîman pêk hatibû:

*“Rawkerî bedxû, xwên rêjî xwên xor
Eto bî û xuda, besîye zulm û zor
Emcarş bim de molet û mewda
Roley şîrînim le şîrîn xewda
Le jêr balm da, ray meperêne
Hêlanekeman lê merûxêne
Le xwênî xom dil, endêşê naka
Belam detîrsim tîrt xeta ka
Nedîrê le min, we rolem kewê
Cergekem bîbrê le şîrîn xewê
Dindûkî şûşî, şûşey giyanime
Xet û xalekey, xetî giyanime
To baxeber nî le êş û derdim
Dil debîrjênê henasey serdim
Le daykit pîrse, pêt delê halim
Înca tam dekey jîyanî talim
Pê m xoşe bîmrim nek cûcelekem
Bîrencê û bîpsê bendî dilekem
Hejar cûceley niştîman etoy
Wehay xoş dewêy bewefabî boy”⁽⁷⁾*

Dema şanoyê

Tê gotin ku dema şanoyê ji dudu û nivê rojê heta sîsiyê rojê bûye, lê di navbera her du per-deyan de koma muzîkê bi qasî 10,15 deqîqeyan sirûd xwendine.

Rol û kesên xwedî rol:

Fîrîşte, Daykî Niştîman, Nûnerê Îran, Îraq, Tîrkiye û Efxanistanê, Pêşmerge, 7, 8 kes endamên desteya wezîran.

Fîrîşte: Sîros Hebîbî

Zarokê Niştîman: Ubeydullah Eyûbiyan

Daykî Niştîman: Ebdullah Nehrî

Nûnerê Îranê: Xenî Bilûriyan

Nûnerê Îraqê: -Nayê zanin-

Nûnerê Tîrkiyeyê: Ebdullah Hekîmzade

Efxenistan: Mihyeddîn Mawerânî

...: Dilşad Resûlî?

...: Sorey Xosrewî?

...: Fetahî Hamidî?

Serokomar: Xenî Bilûriyan

Pêşmerge û endamên desteya wezîran:

Heman listikvanên din ew rol jî listine.

Wênegir û wêneyên şanoyê:

Tevî ku heta niha gelek wêneyên serdema Komara Kurdistanê û beriya wê jî hatine be-

lavkirin, lê mixabin heta niha tu wêneyên şanoya Daykî Niştîmanê di rojnameyên wê serdemê û pirtûkan de belav an jî çap nebûne.

Simail Xanî Feroxî Bokanî wênegirê şanoyê bûye, wî jî hemû sehneyên şanoyê wêne helgirtine û heta wêne di nava bajarê Mihabadê de ketine ber destê xelkê. Simail Xanê Feroxî tenê wênegirê şanoya Daykî Niştîmanê nebûye belkî piraniya wêneyên serdema Komara Kurdistanê berhemên destê wî hunermendê bênav bûne.

Girîngiya şanoyê û bandora wê:

Pêşkêşkirina vê skêçê li herêmên jêr desthilatdariya kurdan de bo cara yekemîn bû serdema şiyarkirina hizra kûr bi hêza neteweperweriyê. Di rastiye de jî şanonameya Daykî Niştîmanê şanonameyeke xembar û li ser hestên xelkê gelekî bi bandor bû. Xala girîng a ku di şanonameyê de nehatibû jîbîrkirin ew bû ku di tu sehneyekê de nehatibû jîbîrkirin ku Kurdistan herêmeke olî ye. Yek ji bînerê wê şanonameyê di wê derbarê de wiha gotiye:

“Sehneyên şanonameyê haletêke olî ya xudaperestiyê li xwe digirt.” Piştî şano bi awayekî serkeftî û bi qasî çend mehan li pey hev li Mihabadê hat pêşkêşkirin, komê li çend bajarên Kurdistanê dest bi gerê kir û şanoname hat pêşkêşkirin.⁽⁸⁾

Xenî Bilûriyan der barê girîngiya şanogeriye de wiha dibêje, “Qazî Mihemed çend caran axivî got; Ev jî bo gelê kurd tiştêkî propagandeyî ye, weke ku ez herim ser sehneyê û bi xelkê re xeber bidim. Lê bandora skêçê dikare jî axaftina kesekî weke min zêdetir be, ji ber wê pêwîst e hûn skêçê pir baş û rewan ezber û şîrove bikin.”

Jêrnivîs û jêder:

1. Soran Rizayî, “Kurd û hunera şanoyê” rojnameya Agirî, weşana PDKÎ.
2. Cutyar Toftî Hewramî, “Xwendîneweyek bo kitêbî Rojnamegerî serdemî Komarî Kurdistan”.
3. Hevpeyvînek bi nemir Ubeydulla Eyûbiyan re di internetê de.
4. Ehmed Şerîfî, “Daykî Niştîman kê nûsî” Kovara Mihabad, Hejmar 49-April 2005/ bi zaraveya Soranî
5. Heman jêdera berê.
6. The Kurdish Republic of 1946, William Eagleton Jr. Wergêrandina Seyid Mihemed Samedî/ bi zimanê Farsî
7. Malpera Hesên Qazî
8. Dr. Günther Deschner “Kurden Das betogene Volk”

Birayim Ferşî, “Şanoy Daykî Niştîman, şanonameyê kuşki awat” bi piranî li ser bîngeha hevpeyvîna bi Xenî Bilûriyan re hatiye amade kirin. Ji bo amadekirina vê nivîsê bi piranî jî wê babetê mîfa hatiye wergirtin. Wêneyên babetê jî malpera Hesên Qazî û jî kovara Huner hejmara 2’yem a zivistana 1998/99’an hatine wergirtin.

Bi kurdî şano kirasekî ji êgir bû

Kemal ORGÛN

Wexta dibêjin payîz a ku tê hişê mirov çi ye û çima dibêjin payîz demsala jihev-qutbûnê ye? Çima di meha payîzê de pel ji daran, dilop ji ewran, minminîk ji pelê gulan û gul ji ji axê vediqetin Wexta ku dibêjin payîz gelo çima xemgînî tê bîra mirov û weke barekî giran dadikeve ser dilê mirov?

Lê, ya rast payîz ne tenê demsala xemgînî, jihevdûrmayîn û qutbûnê ye. Ji bo yên ku di dilê xwe de biharê dijîn, payîz demsala lihevkombûnê ye ji.

Di demsala payîza 1991'ê de ji Kurdistanê dût, li bajarê Stenbolê di meha Îlonê de, li ser kolana Tarlabasîyê bi navê Navenda Çanda Mezopotamyayê saziyeke çand û hunerê hat damezirandin. Ev sazî û damezirandina wê ne bûyereke ji rêzê bû. Ev yek li ser navê çand û hunera kurdî gaveke dîrokî û xemilandina xewn û xeyalên gelê kurd bû. NÇM bi damezarandina xwe, bi xebatên şano, muzîk, reqs û wêjeyê ev xewn û xeyal xemiland.

Damezirandina NÇM'ê xemilandina xewn û xeyalên gelê kurd bû ji ber ku, di van salan de bi zimanê kurdî huner -lê bi piranî ji şano- kirasekî ji êgir bû û me jî ev kiras li xwe kiribû. Vî kirasî çi qas dişewitand, ew qas ji xewn û xeyalên me di-

xemiland.

Di Îlona 1991'ê de di nav atmosfereke weha de, li NÇM'ê xebatên *şanoya kurdî* hatin destpêkirin. Destpêkarên vê xebatê keç û xortên kurd bûn. Ji wan hinek xwendekar, hinek karker û gundî û hinek ji yên bê kar û bar bûn. Di destpêkê de barê rêveberiyê ji li ser milê Mamoste Cemîl bû.

Mamoste Cemîl kî ye?

Xortekî 60,70 salî ye. Niha li Stenbolê diji.

Destpêkirina xebatên *şanoya kurdî* gaveke dîrokî bû, ji ber ku li ser navê şanoyê ev gav gaveke profesyonelî ya yekem bû. Xebateke yekem, xebateke narîn, nazîn û nazdar bû. Elbet li parçeyên welêt ên din jî ji bo şanoyê hin gav hati-bûn avêtin lê ev gav li cihê xwe mabûn.

Mînak; weke xebata şanoyê ya ku ji bo Dayîka Niştîman hatibû kirin.

Ji bo şanoyê wexta ku ev gavên dîrokî, narîn, nazîn û nazdar hatin avêtin ne şanoyeke me, ne saloneke me, ne lîstîkvan, ne nivîskar, ne derhêner, ne tekstek, ne parçeyek dekor û ne ji temaşevanên me hebûn. Lê em xwedî bîr û baweriyê mezin bûn.





şanoyê hatibû pêşkeş-
kirin. Di vê pêşkeşki-
rinê de hestên ku tu
carî mirov nikare bîne
zimên him dik, him jî
salon dîl girt. Wê rojê
ken û girî, kêfxweşî û
xemgînî, hêvî û cesaret
bîr û bawerî bi hev re
ketibûn dîlanê.

Ma ev hestên cûr be
cûr çawa nekevin dî-
lanê, ma kê bawer dikir
ku kurd jî wê rojekê
weke her geli bi zimanê
xwe şanoyê bikin û bi
ser bikevin. Ev roj wek
xewnekê bû. Lê çi heyf
û xebînet bû ku piştî vê

Ma yên ku tunebûn tenê ev bûn?

Ji bo me ev tunebûn elbet barekî giran
bû lê ji bo me barê herî giran dûrmayîna
me ya ji axê, ji dîrok, çand û zimanê me
bû. Em xwedî bîr û bawerî bûn lê xerîbê
xwendin û nivîsandîna zimanê xwe bûn.
Em xwedî bîr û bawerî bûn lê ji gelê qe-
dexê bûn. Lê dîsa jî em xwedî bîr û ba-
werî bûn.

Bi vê bîr û baweriyê li ser kolana Tarla-
başiyê, di bin serbana NÇM'ê de li qata
binî ya ku bê şibake bû, dengê şanoya
kurdî bilind bû.

Bilindahiya dîwarên vê bodromê bi qasî
du mitro û nîvan bû. Li vê derê bi qasî bi-
hustekî bilind dikeke biçûk hat çêkirin ku
bi temamî pênc metrokare bû. Ev dik ji bo
me ne tenê dikeke şanoyê bû, axa welatê
me bû a ku hatibû bingavkirin. Ji ber vê
yekê jî her derketineke me ya li ser vê dikê,
weke çalakiyeke li dijî dagirkeriyê bû. Her
pêşkêşîna me ya şanoyê, êrîşeke li ser qe-
reqolên dagirkeran bû. Bi van hestan em
derdiketin ser dikê û dadiketin.

Bi vî awayî li Stenbolê di Îlona 1991'ê
de xebatên şanoyê bi heyecaneke mezin
hatin despêkirin. Bi qasî çar mehan piştî
xebatên listikvanîyê, listika bi navê
"Mişko" dest pê kir û di 1 Gulana
1992'yan de li Navenda Çanda Ortakoyê
çar caran li ser hev hat pêşkêşkirin. Lis-
tika Mişko, li Bakurê Kurdistanê listika
pêşîn bû ku, li ser dika şanoyê bi formên

serkeftinê ji ber gelek sedemên du alî
gelek kes ji komê veqetiyên û çûn. Ma-
moste Cemîl jî ji ber hin bêderfetiyan, wê
demê nikaribû ku berdewam bike.

Lê em ên mayî me ji nû ve xwe bi rêxis-
tin kir û di Pûşpera 1992'yan de bi sê
kurtelistikan, tevî beşên hunerê yên din
derketin turneya Behra Spî. Rawestgeha
me ya yekem bajarê Edeneyê bû. 8'ê Pûş-
perê, li lûnaparka Edeneyê berî ku em
derkevin ser dikê, li kulîsê me navê Te-
atra Jiyana Nû li koma xwe danî û bi vî
navî em hatin anonskirin û derketin ser
dikê. Piştî bajarê Edeneyê, li Mêrsîn, Îs-
kenderûn û Entalyayê derketin pêşberî
temaşevanan. Tûrneyê bi temamî qasî
hefteyekê berdewam kir û em vegeriyan
Stenbolê. Piştî vegerê bi navê "Dibistana
Teatra Jiyana Nû" me dibistana şanoyê
ava kir û bi profesyonelî li ser şanoyê hûr
bûn. Me dibistana şanoyê ava kir lê ne dî-
warekî şanoya kurdî hebû em piştî xwe
bidinê, ne jî mamosteyekî/e me. Di vê di-
bistanê de em her yek him mamoste, him
jî şagirt bûn. Vê dibistanê rêya lêkolîn,
ûslûp û tarzên şanoyê li ber me vekir.

Li dinyayê ev kar çawa hatiye kirin?

Bi piranî, gelên ku ji bo azadiyê têkoşî-
yane, şanoyeke çawa afirandine?

Têkiliya şer û şanoyê çi ye?

Di têkoşîna şoreşê de cihê şanoyê çi ye

û çawa cihê xwe girtiye?

Barê li ser milê *şanoya kurdî* çi ye?

Bi avakirina vê dibistanê em meşîyan, ketin pey bersivên van pirsan. Di vê meşê de her bersivêkê pirseke nû diafirand û her pirsekê jî bersiveke nû.

Di van salan de gelê kurd di nav têkoşîna azadiyê de bû û li azadiya xwe digeriya. Agirê azadiyê her ku diçû bilind dibû. Şanoya kurdî divê li gor vê rasteqîniyê xwe bi rê bixista û meşa xwe bido- manda. Wisa jî kir. Bi du cureyên şanoyê xwe bi rê kir.

Yek, cureya şanoya ajîtprop bû, yek jî şanoyeke daîmî ku bi hemû estetîka hunerê xwe honandibû.



Teatra Jiyana nû di van salan de bi forma **şanoya ajîtprop** li meydana, li kolan, li kûçeyan; li çalakî û pîrozbahîyan **alaya şanoya kurdî** bi serfirazî li ba xist û bilind kir. Di sala 1992, 93, 94 û 96'an de, di pîrozbahîyên Newrozê de li Salona Abdî Îpekçiyê de, bi *Destana Kawayên Nemir* derket pêşberî sih hezar temaşevanî û tîna agirê Newrozê bi wan re par ve kir. Van çalakîyên şanoyê li Enqereyê, li Îzmîr, Mîrsîn û Edeneyê berdewam kir. Bi lîstika bi navê *Germa Tebaxê*, di pîrozbahîya 15'ê Tebaxa sala 1993'yan de derket pêşberî çalakvanan. Ev pîrozbahî, çalakîyeke korsan bû û şanoya me jî bi vî baskê xwe yê ajîtprop **şanoyeke korsan** bû. Di aliyekî de jî bo şanoyeke ku wek refên gerîla şanoyê dike, di aliyê din de jî ji bo şanoyeke neteweyî xwe bi rê dîkir û bi lîstikên weke *Ta, Sê Ewrên Dûr, Mirin û Jiyana, Daweya Generalê Teneke û Jinên Bindest* derdiket pêşberî temaşevanan. Hetanî sala 1994'an bi hewldaneke mezin xebatên şanoyê berdewam kirin lê mixabin, di Tîrmeha 94'an de bendaveke navîn derket pêşîya şanoya kurdî û bi qasî sal, salek û nivê texil li xebatên wê ket. Lê dîsa jî bi awayekî giran be jî xebatên şanoyê berdewam kirin û lîstika *Rojbaş* hat pêşkêşkirin. Di vê navberê de li Navenda Çanda KAY-DER'ê, me bi navê *Teatra Evîna Welat* şanoyeke nû ava kir û lîstika bi navê *Govenda Hilo Sarya* û bi kurtelîstika *Gundê Meco* û çend kurtelîstikên din derketin pêşberî temaşevanan.

Paşê di payîza 1996'an de endamên *Teatra Jiyana Nû*, careke din hatin ba hev û xebatên şanoyê jî nû ve dan despêkirin û ruhê *Teatra Jiyana Nû* careke din jî nû ve bilind bû. Di vê despêka nû de me bi navê *Şanoya Hêlîn*, weke bingeha *Teatra Jiyana Nû* komeke şanoyê ava kir. Şagirtên me di vê şanoyê de perwerdehiya şanoyê didîtin, amade dibûn û paşê tev li *Teatra Jiyana Nû* dibûn. Di vê despêka nû ya duyem de weke lîstika *Bayê Elegezê, Zeviya Jiyane, Komara Dînan-Şermola* pêşkeşî temaşevanan kir. Lîstika *Ta, Sê Ewrên Dûr, Daweya Generalê Teneke û Rojbaş* jî ji nû ve hat rejîkirin û pêşkêşkirin. *Teatra Jiyana Nû*, hê jî li Stenbolê di bin banê NÇM'ê de xebatên xwe didomîne.

Charlie Chaplinê kurdan Şalîkoyê Bêkes

— Mehmet ÇAKMAK

*“Agir û av derbas bûm ez,
Loma jî îro ez bûme Bêkes...
Mîrîn û jiyân ser min bi qumarê dilîzin,
Avêtine hebxa evîna mezin!...
Serkeftina jiyânê jî ji bo te diyar e,
Têkçûyîna mirinê jî ji bo te qurban e...”*

Şalîkoyê Bêkes

Beriya sersala 2010'an me berê xwe dabû Rûsyayê. Ji Kafkasyayê dema em gihîştibûn Moskovayê yekcar me xwe di nava serma û seqemeke hişk de dîtibû. Ji ber ku me ji berê de ev serma û seqem texmîn dikir li gorî wê jî em hinekî bi tedarik bûn.

A rast a ku em tê de bûn ne rêwîtiyeke tûristîk bû. Bi armanca ku em seqema rûsan tehm bikin em neçûbûn wan waran. Ji bo Akademiya Cegerxwînê me hin lêkolîn dikirin. Bi mebesta van lêkolînan yekem car me berê xwe dabû Rûsyayê. Li Sovyeta kevn gelek şexs û kesên qedirbuha jiyanê û hin jî dijîn. Bi taybetî di warê çand, huner û wêjeya kurdan de gelek şexsiyetên xwegihandî û dildar hene.

Di vê lêkolînê de me bi çavên xwe jî dît ku ev yek gelek rast e. Yek ji sedema vê rewşê li gorî min feraseta sovyetan e. Piştî şoreşa Bolşevîkan a proleter çanda Rûsyayê seranser hatiye guhertin. Ev yek piştî ew qas sal ligel ku rejîma sosyalîst jî holê rabûye jî bi her awayî tê hîskirin û jiyîn. Bi taybetî di warê hunerê de bando-reke bê hempa çêbûye, îro ev yek jî hêla her kesê/a ku ji nêz ve bişopîne, tê dîtin.

Kurdên me yên ku koçberî Sovyetê bûne jî ketine bin bandora van guhertinên mezin. Îro li ser vê axê em dikarin bi sedan navên kurd bihejmêrin ku di qadên çand, huner û wêjeyê de serkeftî ne. Di vê nivîsê de ez dixwazim bi taybetî li ser navêkî bisekinim. Li gorî min ev nav jî mîna gelek navên din rûmeta ku heq kiriye ne-

ditiye.

Ez behsa Mamoste Şalîkoyê Bêkes dikim. Me dixwest em wî wek mamoste û akademîsyenêkî binin Akademiya Cegerxwînê. Mixabin ji ber hin sedeman ev yek wê gavê pêk nehat. Lê axir me keysa ku em li bendê bûn, naskirina mamoste bi dest xistibû. Li Moskovayê bi taybetî di nava kurdan de dema ku navê Şalîkoyê Bêkes derbas dibe, her kes wî wek îlahê şanoyê nas dike. Bi hunera xwe bando-reke mezin li ser civakê kiriye. Tiştê ku em lê şaş mabûn, gelo çima heta niha van kesên wisa qedirbilind nayên nasîn; xebatên wan, berhemên wan nayên zanîn?

Hal we ye ku têra xwe xebat kirine û gihîştine gelek encaman. Van kesan perwerdeyeke têr û tije ji Sovyetan girtine û piştê jî dev ji hunera xwe bernedane. Her tiştên xwe, jiyana xwe, malbata xwe dane ser hunera xwe. Cîhana xwe tenê bi hunera xwe ava kirine û li tu tiştêkî din nefikirine.

Şalîkoyê Bêkes di sala 1956'an de li bajarê Tilbîsa Gurcistanê ji dayik dibe. Di navbera salên 1972 û 1975'an de dibistana şanoyê dixwîne û di navbera salên 1974 û 1978'an de li bajarê Tilbîsê di şanoya rûsî de cî digire. Ev sal jî bo pêşxistina hunera wî dibin salên qedirbuha. Di sala 1979'an de piştî ku şanoya kurdî vedibe Şalîkoyê Bêkes xwe di nav de dibîne. Û jî wê roja ku dest bi şanoyê kiriye û heta niha dev jê bernedaye. Her wiha şano jê re bûye zewade, jê re bûye av, jê re bûye can, jê re bûye mal û jê re bûye yar.

Di hunera şanoyê de Şalîkoyê Bêkes ne yekalî ye. Her wiha hem dramatûrg, hem rejîsor, hem jî listikvanekî serkeftî ye. Û helbet nivîskar e jî. Ligel ku Şalîkoyê Bêkes bi zimanekî biyanî û dûrî çanda

xwe perwerdehiya xwe dibîne û piştî hunera xwe bi pêş dixê, tu carî jî ziman û çanda xwe re nabe biyanî. Mîrov dikare bêje ku Şalîkoyê Bêkes yek jî wan kesan e ku yekem car şanoya kurdî ava kiriye. Hevoka ku min dawiyê saz kiriye belkî zêde pirolewî jî were hesibandin lê mîrov rasterast wî navî lê neke jî dema ku em li hunera mamoste Şalîko dinêrin û wê demê dişopînin, dibînin ku dîrok vê yekê bi me dide gotin. Vê yekê ez bi rihetî bi kar tînim, jî ber ku di salên ku Şalîkoyê Bêkes şanoya kurdî dabû destpêkirin, li gelek deveran kurdî di bin qedexeyeke mezin de bû. Êdî di wan deman de zimanê jiyana rojane jî hatibû qedexekirin. Şalîko hunereke qedîm hîlbijartibû lê di heman demê de jî bo kurdan hunereke gelekî zehmet bû. Cîvaka kurdan bi her awayî jî vê hunerê dîr bû. Ew ê Şalîko şano bikira li ser dikê û cîvaka kurdan jî jê re li çepikan bida!

Şalîko bi vanan hemûyan jî dizanibû; jî cîvakê jî, jî zor û zehmetiyan jî haydar bû. Wî dizanibû ku rojekê dê bigihîje armanc û miradê xwe. Her çiqas me rûmeta ku Şalîkoyê Bêkes heq kiriye nedabê jî, ew gihîştîye armanca xwe. Bi sedan caran derketîye ser dikê û bê westan behsa kurdan, çanda wan, cîvaka wan, keser û hesreta wan kiriye. Mamoste Şalîko hemû jiyana xwe tenê bi şanoyê ava kiriye û bi hemû xizaniya xwe xwestîye tenê şanoyê bike. Xewn û xeyala wî bi dilê xwe avakirina komeke şanoyê bû. Axir demekê li Rûsyayê piştî hewlên mezin komeke şanoyê dadimezirîne, navê komê jî Medya datîne. Endamên komê hemû jî kurd in. Kesên ku di şanoyê de cî digirin yekem car şanoyê nas dîkin. Mamoste Şalîko bi kêfxweşîyeke mezin dest bi perwerdehiya komê dike û xebateke wisa dide destpêkirin ku di demeke gelek

kurt de digihîje encamên baş.

Axir keda salan cihê xwe digire û mamoste Şalîko tevî şagirtên xwe di her listikên xwe de bi ser dikevin. Li Rûsyayê tevî gelek pêşbaziyan şanoyê dibin û li welatekî wek Rûsyayê ku di warê hunerê de bi taybetî di hunera şanoyê de pir serkeftî, ne bi listikên xwe yên bi kurdî bi giştî 12 xelatan werdigirtine. Ev yek serketineke bê hempa ye. Ev tişt hemû bi hewla domdar a Şalîkoyê Bêkes pêk tên. Piştî jî ber sedemên aborî kom jî neçarî belav dibe. Yanî tiştê ku Mamoste jê ditirsiya diqewime. Ligel hemû zehmetiyan Mamoste dîsa dev jê bernade lê rastiyên hişk ên ku her gavê mîna mertalan li hember wan disekinîn, bi ser dikevin.

Ji ber evîna Şalîkoyê Bêkes a şanoyê roj tê hevsera wî jê re dibêje; “tu yê yan şanoyê biterikînî yan jî min”. Vebijartina Şalîko dîsa bi ser şanoyê ve dibe. Evîndarê şanoyê Şalîkoyê Bêkes niha çi dike? Niha li bajarê Moskovayê ajovaniya texsiyê dike. Ji neçarî debara xwe û ya malbata xwe wisa bi dest dixê. Hîn jî bi hesreta şanoyê dihele, niha rûyê wî nakene, çavên wî tarî bûne, jî ber ku derfetan nabîne û nikare şagirtên xwe bigire û derkeve ser dikê. Îro hîn bi xweşîkî listikên kurdî nayên nivîsandin. Pirsgerêkek wisa jî bo Şalîko tune ye, jî ber ku wî gelek listik û skêc nivîsandine. Niha pirtûkeke wî jî heye bi navê “Yên Xwedê Ji Wan Stendî”

Ev pirtûk jî du listik û gelek skêcan pêk tê.

Şalîkoyê Bêkes jî bi wî awayî jî bo şanoya kurdan kedê dide û têdikoşe. Ji bo şanoya kurdan ew hostayekî gelek mezin e. Hewcedariyeke mezin hîn jî bi wî heye, xweziya me karibûya hîn bêtir jî li wî xwedî derkevin û derfetan jê re ava bikin da ku dîsa karibe hunera xwebi evîndarî pêk bîne.



Paşxaneyê dîrokî

Muhsîn OSMAN

Her wekî ku ji vekolîn û boçûnên şûnwarnasan xuya dibe, destpêka bajarvaniyê li Mezopotamyayê serî hildaye. Ev rastî palpiştên verêjên din ên çandê bi hêz dikin. Çunkî karûbar û pêdiviyên jiyanê rêdariya barê Rewşenbîriyê xuya dikin rewş û aloziyên jiyanê berê mirovî dane gelek serboriyan, vê pêvajoyê şengistên (têkilî) olî û çandî afirandine.

Her du ji rewişt û jêderên berdest xuya dibin, xelkê Rojhilat pirtir pêwîstî bi alavên rav, nêçîr, navmalî, cilk, aman, par, çik, mur, peyker, avahî û serûsimayên xaniyan daye, an em bêjin wek bermahiyên kawdan û têgihîştina henekî, pirtir girîngî daye hunerên şewekarî û peykerî, ji şanoyê. Ev jî ji tekstên edebî yên li ser diwarên perestgeh û mezalan an li ser kêlên goran û şeweyê bazbendan, ku bo şeran û merasîmên cenazeyî dihatin bikarînan, xuya ber bi çav dibin.

diyar e her li destpêkê huner ji van cure elementan derketiye, çunkî nexş, nîgar û peykerên li ser dêmê (diwar, rûyê diwar) perestgehan, kuçik, şûr, goristan, minare û serbarî li ser derî, pencere, dêmê xanî û ... dihatin nexşandin, hemû rengên hunerî bûn. Belê mixabin kes lê nebûye xwedî, zêdebarî û rengê zirî, komzirî, şîr, kavlan, metal, dîmcen û zînê hespan û nivîsên di mizgeft û cihên olî de dihat bikarînan û peykerên Xwedawendan tev îro wek huner tînin binavkirin.

Lê mixabin gelek ji wan ji ber talan, firotin û sedemên olî hatine jinavbirin. Bi windakirina kultur û bajarvaniya deverê bîranîna me hat windakirin, çunkî ev bermahiyên hunerê, avahî û tekstên li ser lipnan (keval tablet) ta niha jî ciwanî û sûda wan di guhên mirovahiyê de dizîngin.

Tekst û şûnwarên bajarvaniya Mezopotamyayê digihên hezaran, ku ta niha di muze û pirtûkxaneyên Ewropayê û Rojava de biyaveke berbiçav vedigirin.

Ev teks çî wek dastan, efsane, sirûd, helbest û çîrok an babetên li ser zanyariyên erd û asmanî û yên olî, şeran, mêranî û lipnên heriya qimandî (lewhe) û çî jî li ser zanistên mîna qanûn, matematîk û hwd.

Bi hewdan û vêraçûna dîrokê ber bi çav dibe, gelek caran cureyên seretayî yên şanoyê wek alav û rêkên zarvekirinê li koşkên kurdan hebûn, belê ev rengê şanoyê di çarçoveyê de taybet de maye û werar nekiriye. Lê li gor kerest û mijarên di koşk û diwanên mîrnişîn û hikûmetên kurdan de, ku Kurdistan yek ji makên birc û keleşan bûye, pêdivî bû babetên şer, serpêhatî û mêranîyê bibûna rengên şanoyê. Çunkî di nav kurdan de kêş û seqayê şanoyê heye, wek tekstên dramî mîna di Mem û Zînê de û diyaloga dramî di lawik û stranên kurdî de. Her wisa serpêhatiyên di bihî û govendên kurdî de. Serbarî bizav, rabûna derwêş, sofî, nimêj, dua, merasîmên olî yên êzîdî, 'lwi, kakeyî, îslam, mesîhî û yahudî û rewişt û titalên van ol û neteweyan û raçavkirina cihên pîroz ên wan qubeyên êzîdîyan, mezel û pîrozgehan, ku bo xemlandina seqayê şanoyê kerestên dewlemend bûn.

Gelo bo çî kurdan û xelkê Rojhilat gelek rengên hunerî (stran, muzîk, govend, lîstin û...) hebûn, lê şano nebûn?! An bêjin bo çî şûnwar û bermahiyên peykeran li Kurdistanê man û şopa şanoyê nîn e, her çend (ku bîrîkirina îslamî) peyker pirtir dikevin qalibê tabûyê? Gelo bo çî olên kevn rê dane hunerên şewekarî/peykeran! Belê rê nedane hunera şanoyê? Erê hingê şano nebûye rêyek ji rêyên olî yan jî ji ber egerên olî, rewişt û... Ev rengê hunerî ji nav çûye?! Bi hizra min ji ber rewş û têgihîştina hingê li deverê zal kurdan şano wek prensîb wernegirt, belkî wek piratîk hatiye kirin, çunkî em wek millet li jêr îdeolojî û

sehma îslamê perwerde bûne. Vê têgihîştinê em xistin bin çadira çanda tirsê, her ji zarokiyê ve li hemberî tirsê rastî jiyane hatin, vê pêvajoyê nehêlaye pirsîyar li nik me kelk bibin, çunkî (li nik erebên musulman hemû zanist di Quranê da hene, ter û hişk tê de hene). Bi vê têgihîştinê her tişt tabû û “biv” bûye, vê yekê milkçî û têgeha qebûlîkirinê bi xurtî li nik me peyda kir. Bi vê şopê her bîrkirineke ji derveyî sînoren olî diket jêr guvaştinê, helbet şano ji yek ji qurbanên vê guvaştinê bûye, çunkî serhildana şanoyê li Rojhilat li ser destên cihû û filehan bûye. Ev ji piştî piçekî çavên xelkê vebûne, eger her xelkê îslamî nedihêlan cihû û fileh ji bi vî karî (şano) rabin! Bi vê pêvajoyê kartêkirina îslamê li ser şanoyê bi giranî heye, çunkî îslamê rêgiriya ronesansa şanoyê kiriye, ev yek li gor şert û mercan pêk hatiye.

Bi vê dagirkirina hizrî û perwerdeyî kêşa nasnameya şanoya kurdî girêdayî aqil û dudiliya mirovê kurd, şanoya kurdî wêneyekî biçûk e rewş û dorhêla kurdî girêdayî bîrdankên dîroka gelek aloz, kanê “şano helal e yan heram e.” Şanoya me di navbera vê rewşa “helal” û “heram” de ji dayîk bûye û ta niha ji wisa serderî digel dihêt kirin! Binihêrin heta (peyva tehlîl/şîrove di “lisan al’reb” de bi ramana xwe girêdayî hizra ola îslamî ye, çunkî ev raman girêdayî “helalî”yê ye, ku li dijî “heramî”yê ye û peyv ji “hel”ê hatiye daraştin. Anku ya ravekirina evroya “rexne”yê ya di ferhenga fransî ya “Le petit Ropert” hatiye destnîşankirin. Di ferhenga navborî de destnîşankirina ravekirina “analîz”ê wek pêvajoyeke rewşenbîrî, armanc jê, jêkirina tekst û kerestên wî yên se-reke, bo zanîna pêwendîyan... Di encamê de mirov vedigere du rewşenbîriyên ji hev cuda, jêderên yekî ol û ya duwê aqil.

Bi vê têgihîştinê hunera şanoyê mil bi mil digel cureyên din ên rewşenbîriya kurdî (çîrok, helbest, muzîk û...) neçûye pêş! Ji ber vê yekê jêderên berdestên dîroka şanoya kurdî qels tî xuyakirin. Êdî nivîsên li ser mijarên wisa mirovî dixin rêbendiyeke berbelav. Çunkî di ser vê rewşê re jî xebatkarên şanoyê hind pêwîstî bi dîrok û kultur, kelepûr, dastan, efsane, folklor, pend, çîrok, lêbûk, serpêhatî û kurdî nedaye, ku dibin şengistên nasnameya şanoya gelêrî. Erê bo çî bizav bo vejandina rewşenbîriya kevn (amûreke muzîkê ya sumerî) û bişaftina kelepûra Kurdî nehatiye kirin, her wekî rewşenbîrên ereb bi şanoya baznî/ ahengî bi nav kirine?

Eger bi çavekî rexneyî kultura kevn bihêt xwendin mîna deryayan, arşiv û muzexaneyên cihê her tişt tê de heye, her bo nimûne serpêhatiya olî di roşanên diwarên zêmargirtiyên îştare de ta digihîje tazya “Aşûr”ê ev serpêhatî xuya dike, şeweyê pêşîn e şanoya trajediyayê. Anku bihî/ tazî kevntirîn zêmarên drama, mîna zêmarên Babilî, Grekî, mecûsiyên fars, îslamî û Girîd kartêkirina zêmarên Îranê li ser trajedyaya yûnanî xuya dikin. Ev jî girêdayî dewlemendiya şanoya xwemalî û kelepûrê ne, çunkî dîroka resen a şanoyê (mebest ji resentiye giyan û rûyê kurdwar e) bi deqên xwemalî dest pê kiribû vê vê-

raçûnê (eger civakên destpêkê yan yên pêşketî efsaneyên xwe winda bikin, rûberî afateke sincî dibin, li hemberî windakirina giyanî.

Bi vê rewşê pênaseya dîrok û kultura me xuya dibe, ku kesayetiya me li ser vê kultura tirs, şerm, heram û... ava bûye. Helbet ev kesayetî neşet bi sanahî pirsyaran peyda bike û sînoren pîroz tirs, şerm, heram û... bişeqînit, ji ber hindê me her xwe



di gêjvanik û dubarekirinê de dîtiye!

Lê belê di ser van hemû sedem û rewşan de, mirov çawa dişê bingehê xwe-malî ji bermahiyên rewîşt û titalên mayî bo şanoya neteweyî biket şengist. Bi awa-yekî rast destnîşankirina veguherîna şanoya deverê karekî bi sanahî nîn e, belê ji derveyî şîyanê jî nîn e, ku mirov van mîtolojî, efsane, kurtanê Decalî û tital, çîrokên dildariyê, şûnwarên kevn û bo peydakirina davên serhildana şanoya kurdî bike şop û olên kevn ên zerdeştî bike felsefe û seqayê forma şanoya kurdî. Êdî dema hindê hatiye pêdeçûneke bi dîrokê (dîroka şanoyê) bihêt kirin, çunkî gelek caran dîrok pê hatiye tomarkirin, îro rewş cihê ye, pirtir jêder û dokument hêdî hêdî berdest dibin, cîhan zêdetir biçûk dibe û dergehên muze û pirtûkxaneyan vedibin, ku mirov dişê dîrokê pirtir û hûrtir wergire, helbet ev şopandin jî dê pirtir çavkaniyên şanoyê derxin holê.

Diyar e gelek gengeşiyên bi erênî û ne-yînî li ser hebûna şanoya Rojhilat hatine kirin, berî em li ser vê babetê bi axivîn divêt neyê jibîrkin, em wek miletên Rojhilat (mîna aqil û hêz) tevdigerin, çunkî me xwe nekêşaye kuncên tarî û me rûpelên gemargirtî neqeceptine, belkî me serderî digel jêderên berdest û amade kiriye û destê me bo her tiştê berhevkerî dirêj-kirî ye! Rast e, ev huner wek zincîra dîrokê berdewam nebûye, lê eger evro jî kesên dilsoj hebin têra xwe belgeyên berdest ên diyardeyên destpêka dramayê li deverê hene.

Çunkî bingeha girîng a her rewşenbîriyêke bi hêz li ser mîtolojî, efsane, hevîvend (sêrbazî) û olê hatiye avakirin an em bêjin reng û destbara jiyanê sedemeke girîng a peydabûna cureyên hunerî jî bûye. Şano jî bi dirêjîya dîroka mirovahiyê ji bingeha ola gelêrî hatiye kêşan, ev naverok çavkaniyên xwe ji dîroka gelek dêrîn werdigire. Her wekî Bîrî Mîs dibêjit: Pêşketina dramayê li Sumer û Babilê di navbera mîtolojî û dastanê re derbas bûye, mîna di şanogeriya Xwedan û benî de xuya dibe)

Drama jî li ser tîrêja felsefe û mîtolojiyê hatiye ristin, ev vegeriyan jî dikeve ser

binwaşê hevberkirina felsefe û mîtolojiyên deverê, ku rêxweşkirina hevberkirina diyardeyên destpêka dramayê dikan. Drama jî kevntirîn hunera mirovahiyê ye, hîna jî dema ku mirov hîna rût û li ser piyên xwe rawestiyayî, hingê xwe li hemberî siruştê bê desthelat didît, baştirîn çeka wî ya derbirinê jî bi livîn û dengên cuda cuda zarvekirina siruştê bû. Ev yek bi zimanê çevengan dihat derbirin, bi vê têgihîştinê, ku dê bişê xwe ji metersiyên jiyanê rizgar bike. Ev derbirîna takekesî ber bi awêrd û pîroziyên tevav çû. Vê pêvajoyê gelek wêneyên sir û serma, tirs û sehm di mêjiyê mirovê berê de peyda kirin û mîna xwîna di mêjiyê wan de gehulgehulîn, êdî her asteng û arîşe laser, volkan, bîvleriz (erdhej) û berzebûna roj û hîvê bersingên wan girtibûn, neçar dibûn penayê bibin ber xeyalê. Van diyardeyan berê mirovê kor da efsane, mîtolojî û dastanan, vê şopê kartêkirin li ser rewşa felsefe û kulturê hebû. Bi vê têgihîştinê jiyan, ol û huner bi siruştê ve hatine girêdan û mirov bi rêya van her sêyan derbirin ji arîşeyên xwe kiriye.

Êdî dema mirovî ji ber rewşa giran a jiyanê hest bi hebûna xwe kiriye, zanibûye ne bi tenê têrkirina zikî mirov tena dike, belkî bi hevkarîya giyan û bedenê, êdî mirovî jî ber parastina xwe ji siruşt, cinawer û... hizir di rêyên mayîna xwe de kirî. Ev aliyê beden û giyanî, her ji rê û resmên jidayîkbûn, şadî/ şînî û berhemînan û zalbûn li ser astengên siruştî, tirs û bîrsê pal daye qurbanî û perestî. Her wisa tîrsa ji miriyan û xweparastina ji giyanên çepel, mask peyda kirin, pêşketina maskan jî wek elementekî hizra diyardeyên dramayê berpa dike.

Serbarî hevîvendiyê, ku roleke girîng di peydakirina hunerê de dîtiye, ev kar bo çareserkirina nexweşan (bo derxistina giyanên çepel/ îblîs û hingaftina cinan) jî hatiye bikarînan. Ev têgihîştin ber bi warê pehlewaniyê ve çûye, çunkî mirovê berê hizir dikir, divêt xêr û qurbanî bo mirovê mirî bîn dayîn, eger dê giyanê mirî bi rêya giyanên çepel derkevin û jiyanê li yên zîndî tîk din. Ji ber hindê digel veşartina mirî, xwarin, vexwarin, çek, û hwd.

vedişartin û qurbanî û avreşandin ji karên pîroz bûn, lê belê dema pêşkêşkirina awêrd û qurbanîyan ji bajêrekî bo yê din dihat guhertin, li Babilê 29'ê her mehê bû, çunkî xelkê Babilê hizir dikir, ku giyanê miriyan wê rojê kom dibûn û ev roj bi roja avreşandin, qurban û bêzariyê bi nav dikirin. Li Îbîlayê meha 11'an a her salê Meha Îştarê ye, lê li Babilê cejna salan bo pêşkêşkirina awêrdeya di meha avê de bû, belê li Aşûr di şubatê de bû.

Bi vî awayî dema mirovî pêkulkirî hindêk guherîna bo nêçirê di xwe de biket, em îro vê yekê bi kerestên hunera zarvekirinê bi nav dikin. Her dema mirovê berê hest bi guherîna alav û pêdiviyên xwe yên jiyanê kiriye, ku têkelî ziman afirand. Vê afirandina zimanî mirov pirtir bi komê ve girêda û şadî/şiniyên mirovê tek (stran, lîzîn) kir nav komê, vê yekê çî bi îşaret an jî bi gotin awayekî diyalogê peyda kir, vê gavê binkoka diyardeyên dramayê raçand.

Dema mirovî fam kir xweşî û nexweşiyên xwe (bi çî rengî hebit) vegêrît, ev vegêran bi diyardeyên destpêka dramayê tên binavkirin, çunkî berî ziman biçit pêş û bibit alavê têgihîştinê, hemû xwestek û pêdiviyên jiyanê bi rêya îşaretan bûn. Bi vî rengî mirovên berê daxwazî û nimêj bo Xwedawendên xwe dikirin û her rûdana neke gêraban bi livîn û îşaretên laşî bûn. Zimanê laşî kevntirîn rê û îşartên destpêka dramayan e, vê pêvajoyê şeweyê lîzandinê xist ber û bi vî rengî mirovên berê hizir dikirin, dê şên li ser girîftên xwe yên rojan zal bin û baştir jiyanê rave bikin. Bi vê şopê lîzîn kevntirîn rê û îşaretên destpêka peydabûna pandomîm û dramayê ye û Şildun û Tişînî dibêjin: Lîzîn ji pileya yekê dihêt hejmartin piştî, ku mîletên berê bi kar û barên xwe yên girîng ên rojane ji xwarinê û xanî radi-bûn. Lîzîn kevntirîn rêya xwe pê ji bîrvekirina xelkê bû û dibit pêngava yekê ber bi hunerê ve.

Vê keş û rewşê xeyala mirovî berîn kir û muzîk bi xwarin û vexwarin ji xwe re kirin bingeş. Bi vê vêraçûnê ev pêkulên mêjiyê mirovên kevna kirin, hemû gizirtebûna bîranîna tevan, me ber bi bîrdan-

kên dîrokê ve dibe, ev ro bo me dibin raman û hebûn, êdî bêy vê bîranîne dîrok kelaxekî mirî ye. Dema mirov li dîroka kevna a şanoyê jî dinêrit, di destpêkê de şanoyê pabendî li ser tekstê nekiriye, belkî li ser kerestên livîn û lîzînê kiriye. Îro jî girîngiya hunera zarvekirinê û dramaya vegeriya ber bi vê şopê ve, ber bi vê nihênîyê gelek caran, dema zimanî ser ji laşî stendiye heta îro jî ziman neşiyaye bibit gerewê zimanê laşî. Lê tiştê hevpar ên hemû şanokar li ser hevdeng zarveker û bîneran, çunkî yarî bingeşa şanoyê ye, yarî jî taybetiya jiyandaran, ku mirov ji zarokiyê dest pê dike heta digihîje jiyana/yariya siyasî ya mezin, berdewam dibit. Çunkî her wekî zanayên antropolojiyê dibêjin şano diyardeyeke di navbera dilinî û aqilî de wek hesteke navxweyî mirov pal daye yarî û lîzînê, di destpêkê de wek karê kesane dihat kirin paşê derbasî karê tevayî bûye. Şano pabendiyê li ser (kiri-yar, hevrikî û danûstendinê ye û hebûna zarveker û bînerî, zêdebarî stran, gata û lîzînê) diket, lê di Rewşenbîriya Ewropî de derhêner, avahî û depê şanoyê yê ku bi nîv bazînî, bazînî û... ber bi çar goşeya îtalî ve çûye, zêdekir û her wisa dekor, sî-nugiraf, hunerên dîtin û rîtmê li ser hatine zêdekirin, wisa ta şano gihîştîye şeweyê xwe yê bala, ku bi bavê hunerê hatiye binavkirin.

Bi vê şopê her mîlet di qonaxên serhildana jiyana xwe de ev reng diyarde hebûne, lê ya girîng çawa kawdanên van gelan rê jiş bo hatiye xweşkirin berdewamî bi vê şopê dabit. Çunkî gelek caran rewşên aborî, siyasî, olî û... bo pêşveçûna vê pêvajoyê bûne derebend. Em kurd jî yek ji van cure gelan in, bi dehan caran sîstema jiyana me bi hemû renga ve hatiye têkdan. Bêyî li berçavgirtina vê rewşê em naşên bigihên serê davên tevna vê babetê, wisa peydabûna drama/ şanoyê digel jidayîkbûna mirovî bûye. Serhildana şanoya vê deverê jî bi reng û rûyê xwe ve li gor rewşa deverê pêk hatiye.

Dramaya awêrdî di kultura Rojhilat de wek diyalog li ahengên olî dihat gêran, ev şeweyê awêrdên dramayê li Mezopotam-yayê û Misrê tên dîtin, ev pêrabûnên olî li

derdorên sedsala heftemîn ê b.z. derbasî Grek û Îtalyayê bûn. Min guman di hindê de nîn e, ku bingeha awêrdên dramaya grekî û îtalî, ku trajediya, komedyaya û satîrî bi pêşketina piştî hingê ya dramaya latînî ji vê devera Mezopotamyayê hatiye wergirtin. Pênaseya şanoyê xwe li cihê pîroz dibîne. Helbet şengistên vê şanoyê ji ne mîna depê şanoyê û holên îro ne, belkî cureyeke teqçikdar ji darî yan ji berî hatibû, çêkirin

Hewdanên vê dûveçûnê jî girêdayî rewşa jiyanê (jiyar/ ol) bûye, vê yekê koka hizirkirina mirovî daniye, di serdemên dêrîn de karên dramayî tîkelî çandin û perestîne bûne, vî şeweyî (çandin û perestî) cih û demên karên dramayî destnîşan kirin. Rojên olî yê taybet û werzên berhemhênanê, bûn bingeha hunerê, perestgeh jî wek cihê bikêrhatî yê vê vegêranê bû, ji ber hindê serkêşên olî rola sereke di van karan da lîstine, ev aheng û bidawîbûna dema serdariya desthelatdarên Misrî yê kevn bo me dibin belge. Ku cara yekem diyardeya şanoyê li sînoren sala 1500 b.z. li nik kevnarên Misrî serî hildaye. Piştî hingê bi 1000 salan Tîpîs/Thespis 534 b.z. destpêka diyardeyên awêrd û hevîvend wek bingeha şanoyê li Ewropayê berbiçav dibit. Her wisa yekem belgeya werara awêrda ber bi şanoya xwe di kultura naverast a Împeratoriya Misrê re b.z.2000- 1500 tê ditin.

Her wekî ya xuya diyardeyên destpêka dramayê wek şeweyê awêrdên gelêrî li çolê dihatin kirin. Piraniya karên vê serdemê li ber ronahiya rojê/ hîvê dihatin gêran, ev pêrabûn her bo encama ol û dramayê dihatin kirin û bi rengêkî lîzîn û pandomîm dihat gêran. Paşê ev diyarde derbasî derdor û nav avahiyên perestgehan bû û şano êvarîyan dihatin pêşkêşkirin. Helbet tekstên van diyardeyan jî bi şeweyekî zardevkî bûn, ev çavlekîrîn û şewe di olên erd û esmanî de berbiçav dibûn, ku pirtûkên esmanî jî di destpêkê de bi şeweyekî zardevkî bûn. Her wisa şanogeriyan yûnanî jî yê destpêkê Tîpîs û filosofê yûnanî Sokrat jî, gotin û tekstên wan mîna zargotinê bûne.

Bi vê vêraçûna dîrokê eger serhildana

şanoyê di sedê şeşê b.z. li Tîpîs, li Yûnistanê dest pê kiribe? Gelo ev jiyê dirêj ê mirovahiyê bi milyonan sal mirovahiyê tevî dest dahêlaye, rawestiyayî mabû, heta ji nişka ve şanokarên grekî peyda bûne û şano mîna dîroka zayîn û mişextî kurtebir destpêka xwe dana bit?! Bi rastî ev ji bo zanista dîrokê têgihîştineke leng e, belkî ya rast û sedemên peydabûna şanoyê li wê deverê, çavkanî û hizrên xwe ji ku wergirtin? Ev dibin cihê danûstendin û vekolînê zanistî.

Bi vê têgihîştinê dema mirov hêdî hêdî li jêderên dîroka kevnar dinihêre dramaya sumerî, girêdayî kûrahiya bajarvaniya deverê bûye, çunkî eger werar û peydabûna şanoyê girêdayî civaka bajaran be, bajêrê yekemîn jî li vê deverê (Uruk di nivê yekemîn ê hezara çaran b.z. mezintirîn bajêrê sumerî bûye. Di sala 2600 b.z. de hat sûrkirin û nêzikî 60 hezar mirov lê dijiyan. Di meha hezîranê de li ser şerefmen-diya Gilgamêş xolên werzişkariyê dihatin vekirin, genc fêrî hemû cureyên werzişkariyê dikirin)

Bizane bajêrekî ew qas xelk lê bijî, çend cureyên edeb û hunerî lê hebûne, lê hemû ketin bin gemara kîna jinavbirinê. Binihêr kesên navdar ên wê serdemê mîna Gilgamêş, Hamurabî, Senharîb, Sargonê Akadî, Nebûqednezar, Aşûrbanîpal û... bi vê şopê (kultura Mezopotamyayê cêgiriya desthelatiya siyasî dikir, belkî berpirsariya çavdêrî û belavbûna giyanî li Mîzopotamyaya bi rêya Firatî û gelê Xwedawendan li jêr zêrevaniya baweriyên wan, dikir)

Bi kurtî bêjin şer û harîkarî du têgihên bi dirêjîya dîrokê berbiçav dibin, van her du têgihan gelek çîrok û mijarên egîdî, trajedî, mîtolojî, felsefe û evîndarî wek dualîzma “mîrov û siruşt” “mîrov û Xwedawend” “mîrov û cinawer” û “mîrov û mîrov” îname jiyanê. Ev têgih bi derbasbûna demê re, ketin xanên din û bi şeweyê “xêr û şer” ol û hizrên cuda peydabûn û çîrokên qebîle, ol, çîn û neteweyan serî hildan.

***Ev nivîs ji pirtûka Muhsîn Osman a bi navê “Şano” hatiye wergirtin. (Kovara W)**

Şanoyê çawa dest pê kir li ku û çima?

Kawa ŞÊXÊ

Di destpêka dîrokê de û beriya ku ziman, axavtin xweşik were rûniştin, însan gelekî kişand da ku karibe xwe îfade bike.

Pêşiyê dest pê kir bi qîrîn, nalîn û axînan. Piştî jî ken çêbû. Lê dema ku xwest çîroka xwe û bûyerên ku pê re çêbûne bîne ziman, ew gotinên hindik nema têra wî kirin. Û li çareyekê geriya.

Cara pêşîn li pêşiya xwe dît dîlan bû, dest bi dîlanê kir, bi lingên xwe kir terpeterp û bi destên xwe jî li çepikan dan.

Lê çawa ew dîlan bû şano, a niha bi alî-kariya hinek çavkaniyan bi henek, baweriyên xwe û hinek lêkolîn jî ez ê hewl bidim ku vê derbasbûna di navbera şano û dîlanê de şîrove bikim. Dibêjin, ku kingê însan karê xwe yê rojane yan jî karê ku ji bo ber-dewamiya jiyana wî girîng be, derbas dike, wê çaxê rengê jî rengên şanoyê derdikeve.

Yanî xwarin, vexwarin, dermankirin ne tê de, gelek tiştên din jî dibin rengê jî rengên drama û şanoyê. Heta kinclixwekirinê (ji bilî kincên li dijî serma û germê) ew jî şanogeriyek tê de heye, yanî gava tu ji bo her civatekê kincên wê li xwe bikî û gava tu ji bo her kulturekê kincên wê li xwe bikî, ew dibe wek me got, rengê jî rengên şanoyê.

Şanoyê çawa dest pê kir û jî ku hat?

Di baweriyên min de û di ya gelek kesên ku li ser vê mijarê nivîsandine de jî, dîlan yek ji wan kevntirîn rengên ku însan karibû pê hêrs, kêf, serkeftin û gelek tiştên xwe bîne ziman, bû.

Dema ku însan hêrs dibû, dema ku hewl dida wek xwezayê hêrsa xwe, bêhna xwe derxîne û mîna ku xwezayê jî hêrsa xwe bi bahoze û lehiyan derdixist, wî jî hêrsa xwe bi dîlaneke ne dîrî bahoze derdixist. Yanî jî liva canê xwe, heta bi rûdêmên rûyê xwe, heta bi terpeterpa ling û destên xwe, heta carinan jê bi boyaxa ku di rûyê xwe dida, dîlanek dikir û hewl dida ku bêje "ez jî wek xwezayê hêrs bûme û ez ê a niha wek wê hêrsa xwe di serê govend û dîlanekê re der-xînim."

Û her weha jî dema ku kêfxweş dibû û nema gotinan têra wî dikir û dixwest ku ne tenê bi zimanê xwe, lê belê bi tevahiya canê xwe bibêje ku ew kêfxweş e, wê çaxê jî dîlan dikir.

Her weha jî dema ku ji cengekê vedigeriya û serkeftî bûya, dîsa jî bi dîlaneke cuda ew serkeftina xwe dianî ziman.

Yanî em a niha karin bêjin: Dîlan kevntirîn şêwe ye ji şêweyên ragihandin û derbas-bûna hinava însanan. Yanî dema ku tevgera însan pir bû û ew gotinên hindik hatibûn dîtin nema têra wî kirin, wê çaxê bû hewceyî şêweyekî nû ji şêweyên şîrovekirina wan tevgeran û wê çaxê jî însan dîlan wek çareya herî baş dît.

Piştî dîsa însan bi pêş ket û dîlanê nema bi tena xwe dilê wî rihet kir, jî ber ku êdî ji xwe re xwedawend jî çêkirin û êdî gerek e bi wan re biaxeve, jî ber wê jî mecbûr ma êdî ti-ştêkî li wê dîlana xwe zêde bike.

Çi lê zêde kir û çima?

Pêşiyê însan newêribû ku rû bi rû bi xwedawendên xwe re biaxeve û jî ber wê jî mask peyda kirin, ew jî wê çaxê piraniya wan jî çermê heywanan bûn an jî serê heywanan bi xwe bû. Li xwe kirin û dîlana xwe berde-wam kirin û şanoger dibêjin wê çaxê rengê herî kevn û basî jî şanoyê hatiye dinyayê.

Piştî muzîk jî derket, yanî muzîka def û bilûran (amûrên ku ji sirûştê çêdibûn) rabû însanan ew jî tevli dîlana xwe kirin. Îcar ka-ribû bi dîlan, mask û dengê daholan bêtir cengên xwe bîne ziman û karibû bi alîkariya maskan jî xwe û dijiminên xwe ji hev cuda bike. Bi alîkariya muzîkê dikaribû bêtir heyecanê zêde bike û bêtir ling û destê xwe jî bo listinê bi kar bîne û ne ji bo dengderxi-stinê. (Wek dema berê ku bi lingê xwe terpe-terp dikir û bi destên xwe jî li çepikan dida.)

Gelo dîlan destpêka şanoyê ye, yan na?

Na, jî ber ku dîlan dîlan e û şano jî şano ye, û erê jî ber ku hinek rengên dîlanê hene dikarin wekî şano werin binavkirin! Ew

kîjan rengê dîlanê ne, ew jî gerek di beşeke taybet de werin şîrovekirin. Lê bi kurtasî ew dîlanên ku rol û hereket tê de dihatin belavkirin û liva dîlanvanan plankirî bû û bi nexşekî zelal dihatin resmkirin. Ew dîlan a ku hemû dîlanvanan ne wek hev dilistin dîkaribû bibûya şano yan jî rengêkî basît ji rengên şanoyê û yan jî bingehe bû ji bo pêşxistina şano û cudakirina wê ji dîlan û govendê.

Gelo govenda bi wate şano bû?

Yanî çawa govenda bi wate, yanî carnan jê hinek koman dixwestin dua û lava ji xwedawendên xwe bikin ku wan biparêzin û govendeke watedar digerandin, hinekan jê rola xwedawendan dilîst û hinekan jî rola însanan dilîst û carinan jî rola heywanan dihat listin.

Carinan jê jî xwarin kêmbû û êlê lavaya xwarinê ji xwedawendên xwe dikir, xwe dikirin mîna gamêşan û dîlana gamêşan digerandin û ew dîlan bi mask û muzîk û dengê gamêşan re dihat listin, ji ber wê jî ew dibû rengêk ji rengên şanoyê.

(Nimûneya ku heta demeke nêzik ji vê dîlanê mabû, dema ku goşt kêmbû li ba hindiyên cermsor, dîlana “gamêş were” dihat listin)

Carinan jî êl derdiketin lavaya teyrên nêçîrê di dema ku teyrên nêçîrê kêmbûn.

(Piştî vê dîlanê jî hîna heta roja îro li Brîtanyayê dîlana teyran û festîvala nêçîrê çêdikin da ku xwedayê nêçîrê teyran pir bike û bi ser wan de bişîne)

Piştî, helbest peyda bû, pêşiyê ya belavkirî, yanî ya bê pîvan, tenê gotin bûn û li ber hev dihatin danîn û her du, sê gotin carekê qafiyeya wan jî çêdibû. Û piştî jî rengêkî pêşketî ji rengên helbesta bi pîvan hat peydakirin û ew helbest bû mêvan li wî şeweyê ku hatibû pevxistin ji şano, yanî dîlana bi mask û muzîk bû bi helbest jî û di wir de îcar rengê herî xweşik û pêşketî û şeweyê herî nêzikî şanoya modern derket.

Yekemîn rengên şanoyê ew bûn dema ku şervanan bi livên plankirî behsa şerê xwe dikirin û piştî jî dema ku behsa hinek cengan dikirin ku qet ne qewimîbin, tenê di serê wan de bû: Mînakek gelekî naskirî heye, gelek kesan ew bi kar aniye, dibêjin: şervanek piştî ji şer vegeriyaye, behsa cenga xwe

dike û wisa nîşan dide:

Şervan di cengê de ye, ji bilî cenga bi dijmin re; stiriyeke dikeve lingê wî, rûdinê da ku stirî ji lingê xwe derxîne, lê siya leşkerekî dibîne ku ji pişt wî ve nêzî wî dibe û dixwaze wî bikuje. Lê şervanê ku çîrokê dibêje wî şervanî digire û ji wî zûtir wî diavêje erdê û bi pantomîmekê serê wî şervanî jê dike, lê piştî ku maska ser rûyê wî hildide dibîne ku ew ne dijminek e, lê belê birayê wî ye, wê çaxê poşman dibe û bi rengêkî stiriyan dîlanekê dike. Piştî jî em dibînin ji sihirdarê êlê, bi dû û dermanan wî ji wê dînbûnê xelas dike. Ev mînak a ku Henry Leth daye, ye. Mînakeke din ji heye ez ê wê ji binivîsim û piştî ez ê armanca xwe ji gotina wan zelal bikim.

Di dîlaneke din de, nêçîrvanek derketiye nêçîra teyran, çivîkekî gelekî xweşik dibîne, tîra xwe berdide aliyê wî, wî ji ser şaxê darê diavêje erdê, piştî ku dikeve; nêçîrvan gelekî poşman dibe, poşmaniyê dilîzin û wekî xelat li ser wê poşmaniya wî, ji nişka ve ew çivîk dibe jineke gelekî bedew, nêçîrvan jî wê hembêz dike û pir şa dibe!

Di van her du mînakan de, em dibînin ku fikra însan hinekî tê guhertin, yanî mesele tenê ne dîlan û ceng e, lê şano hinekî zelaltir dibe, ji ber ku naskirina yê şervan ji birayê xwe re di çîroka pêşîn de û guhertina çivîkê da ku bibe jin di mînaka duyemîn de rengêk ji rengên afirandin, nivîsandin û vekirina deriyê xuliqandinê tê de heye. Yanî êdî yek heye tiştekî dibêje ku nebûye û ji serê xwe çîrokê çêdike, konfilîkt û pîrsgirêkê dixwe nava wê, armanc an fêrkirin e, yan jî derbaskirina demê ye û ew jî bi xwe şano ye.

Em dîlanê û pêşketina wê bihêlin, kesek nikare çavên xwe jê re bigire, ji ber ku pêşketina însan e, kultur êdî çêdibe, di nava merasîmên olî yên misriyên kevnar de (faronî) rengêkî gelekî zelal ji şanoyê heye. Û her weha li ba yewnanên kevnar û di olên wan de û heger me behsa yûnanistanê kir, divê li vir em rawestin û bibêjin ku “Yekemîn şanoya dinyayê ku gihîştîyê me a ku hemû bingehe şanoyê tê de hebin, ew jî şanoya yûnanî ye.”

Şanoya yûnanî

Dema ku em behsa şanoyê bikin; divê

em hinekî -heger bi kurtasî be jî- behsa şanoya yûnanî bikin. Ji ber ku ew diya şanoya cihanê ye.

Nizanim ne şensê wan bû ku şanoya wan tenê maye û gihîştîye destê me û heta tekstê wê jî hîna hene, nizanim ne bi rastî jî ew tenê hebûn. Lê dibe ku hinek şano li deverên din jî li dinyayê hebin. Û dibe ku ew tişt di demên pêşde zelal bibin.

Kevntirîn şano hatiye naskirin wekî şano di dinyayê de şanoya yûnaniyan e, yanî ya welatê Yûnanistanê, yan jî miletê grekî. Li gor ku dîrok dibêje, ew peyda-bûna şanoyê jî girêdayî mîtolojiya wan bû, yanî hebûna xwedawendê xêrê (Dionisos) hişt ku ew tişt peyda bibin. Li ba wan du festîvalên mezin hebûn, yek jê di dawîya havînê de bû, yanî dema ku tirî dihat çînîn, mey çêdibû û mîlet kêfxweş dibû. Festîvalek bi kêf û şahî çêdibû û li dû wê kêf û şahîya wan komedya peyda bû. Festîvala wan a din jî di dawîya zivistanê de ye û berî bihar were bi rojekê di-duyan, hem meya wan diqediya, hem jî dimenên rezên hişk û xemgînî di nava wan diçand û ji ber wê jî festîvaleke xemgîn li dar diket û li dû wê festîvala xemgîn trajedyaya peyda bû, wan bi wê trajîkbûna xwe hawara xwe dibirin xwedawendê xêrê da ku dîsa rez û darên wan şîn bike û jixwe piştî wê festîvalê, bihar dihat û rez dîsa şîn dibû.

Lîstikvanî di destpêkê de, rengê gelekî hêsan bû, yanî tenê dua bûn, hinek stran jî hebûn, pê li ber xwedawendan digeriyan û lava jê dikirin ku dîsa li wan xwedî derkeve. Piştî vokala an jî Kewres derketin ser dikê û heta rola xwedawend bi xwe jî dihat lîstin. Di destpêkê de nedîaxivî, lê piştî axivî û wê axavtina wî *scenario* li şanoyê zêde kir. Lîstikvan jî bi mask an jî bi *crème* bizin û xezalan bi lingê xwe derdiketin pêşîya mîletê.

Gotina trajedî, ya ku heta roja îro tê bikar anîn, jî du gotinên yûnanî pêk tê, ew jî gotina “stran” û gotina “bizin”ê pêk tê, yanî strana “bizin”ê, ew jî sedema wê dema ku bizin wekî qurban dihatin serjêkirin û li dora wan şano çêdibûn.

Lê di dawiyê de û li dû ew qas tevlihevî,

Esxîlyos (Aeschylus) hat, ji b.z. 535’an heta sala 456’an jiyana xwe derbas kir, wî yeke-mîn şanoya helbestî afirandiye û ji ber wê jî ew wekî bavê trajedyayê tê naskirin û bi taybetî jî piştî şanoya bi navê suppliants.

Piştî wî jî Sofoklîs (Sophokles) hat û wî jî guhertinek çêkir û lîstikvanek zêde kir û bêtir lîstikvanî xurt kir, li ser hesabê dîlan û helbestê. Wê çaxê lîstikvanê yeke-mîn jî derket, Tîspîs (Thespis) û piştî wan jî Yorbîdes (Euripides) derket û wî jî şanoyên ku nayên jibîrkirin, afirandin.

Hejmareke gelekî mezin ji berheman li dû xwe hiştin û navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka mirovahiyê de dan nivîsandin û qebûl kirin.

Piştî rûniştandina şanoyê, êdî mirov di-kare dibistanên wê jî bihejmêre:

Ez ê a niha li vir bi kurtasî dibistanên şanoyê şîrove bikim:

→ Şanoya trajedî û drama Siryoz

Di vê şanoyê de ya ku bi eslê xwe yûnanî ye, qehremanê şanoyê dimire û sedem jî yan baweriya zêde ye, bi kesayetîya xwe an jî li dijderketina xwedawendan bû.

→ Şanoya komedî û dramaya reş

→ Şanoya pêlîstokan

Û ji wê jî hinek rengên cuda hene: Pêlîstokên lepik (dest dikeve wan de)

→ Pêlîstokên ta

→ Pêlîstokên bi daran

→ Pêlîstokên sinemayê

→ Pêlîstokên siyê

→ Şanoya Eksperimental

Ew rengê gelekî bi ceger e, ji rengên şanoyê, li ser ceribandîna û hewldanan ava bûye. Li dijî fikrên paşverû derdikeve.

→ Şanoya muzîkal

Û di nava wê de du reng hene: Opera û Operê

→ Bale û dansa modern

→ Şanoya çînê, ew jî nêzikî operayê ye, muzîk û dîlan tê de heye, lê ji rengên cuda, çîniyan jî xwe re 360 rengên şanoyê çêkirine, piraniya wan jî şanoya siyê û ya pêlîstokan (bûkik) pêk tê.

Çavkanî:

Sheldon Cheny

Three thousand years of drama,
Acting and stagecraft

Kurterexneyek li şanoya kurdî

M. Emîn YALÇINKAYA

Di şanoya cihanê ya serkeftî de, rexne her tim wek nirxeke cuda û nêrîneke erênî ciyekî girîng digire. Ji bo kêmasî û çewtîyan; rexnekirin her tim bûye şewazek ji bo pêşveçûnê. Şanoyê her tim bi vî awayî di nav xwe de şewazên alternatîf derxistiye holê. Her şewazê qadeke fireh daye ber xwe. Di wan qadan de rengîniya şanoyê hîn bêtir biriqiye.

Di şanoya kurdî de rexnekirin di çi rewşê de ye? Gava mirov bi awayekî berfireh li wê meseleyê dinihêre, bi rastî ew tiştên ku derdikevin peşîya mirov, gelekî kûr in. Ji ber vê yekê bi awayekî kurt em ê li meseleyê biniherin. Lê ez bawer dikim em ê bi hev re hinek mijarên ku nehatine ziman, bikin mijara axaftinê.

Ji bo pergalên şanoya kurdî werin avakirin, hewce ye ku nêrînên li ser şanoya kurdî jî werin nîqaşkirin. Ji ber wê jî divê şanoger û rêveberên şanoyê di bin banê komeleyekê de werin bicîkirin. Da ku dan û stendin çêbibe. Konferanseke neteweyî were lidarxistin. Bi vî awayî jî sînorên li ber civakan jî holê rake. Bi qeweta hunerê, ew sînorên ku dagirkeran di nav kurdan de daniye, hewce ye ku ji mêjiyên mirovan bîn rakirin. Wê ev bibe gaveke gelek girîng ji bo dan û stendina gelê kurd a bi cihanê re.

Îro şanogerên kurd ketine nav tevgerê çewt. Pîvana karê ku dikin, ne li gor asta estetîkê û daxwaziya civakê ye. Rexnekirin li ser karê ku tê lidarxistin e, ne li gor pîvanên hunerê ne. Bi awayekî siyaseta rojane lê tê nihêrtin. Helbet huner û siyaseta bi hev ve girêdayî ne. Siyaseta ku di nav hunerê de tê meşandin hewce ye ku ji bo pêşketina civakê be. Ne ku li gor siyaseteke populîst û paşveçûnê be. Ne ku hunermend karê dirokzanan bike ku "cara yekem kîjan komê listika kurdî li-stiye." Yan jî kîjan komê cara yekem komedyaya bi kurdî yan jî trajediyaya bi kurdî

listine. Lê tu kes nîqaşa karê ku hatiye kirin çi qas li gor pîvanên hunerî ye, çi qasî pêşketî ye yan jî paşketî ye nake. Ji ber wê jî hinek kes xwe li ser navê hunerê bi awayekî neheq bi rihetî xwe derdixin pêş.

Wisa be pêdiviya hunermend beriya her tiştî bi çi heye? Hunermend, hewce ye ku hem paşeroja xwe bizanibe, hem jî ji pêşeroja xwe haydar be. Bi berpisyariyeke civakî û hunerî, pergaleke demokratîk ji xwe re ava bike. Rexneyên erênî yên ku li berhemên wî/wê tînin divê li ber çavan bigire careke din berhemên xwe di ber çavan re derbas bike. Kesekî hunermend her tim dikare ji dil û can xwe rexne bike û li gor rexneyên lê hatine kirin xwe nû bike. Heke xwe ji vê berpisyariyê bide alî wê hunera wî/wê qels be. Hewce ye ku hunermend bi reng û berhemên xwe bibe mihenga gerdûnbûnê. Ji ber ku qada berhemên hunerî gelekî fireh bûye. Dinya biçûk bûye lê têkiliyên civakan gelekî xurt bûne û her ku diçe xurtir dibin.

Di dawiyê de dikarim viya bibêjim; divê em bi awayekî lezgîn, tevgereke rexneyê ya xurt derxin holê. Pêdiviya şanoya me û tevahiya karên me yê hunerî bi yekê heye. Divê em deriyê dile xwe li hev vekin. Kêmasî û zêdehiyên xwe li hev par bikin. Ev berpisyariyeke dirokî ye.

Kurtedîroka şanoya kurdî

Kemal ULUSOY

Eger dema ku em qala şanoya kurdî bikin, helbet divê em qala xebat û şanoya kurdên ku li hemû deveran dijîn ji bikin. Lê belê, kurdên ku di bin desthilatdariya wan her çar welatan de dijîn gelek ji wan bi mec-bûrî çûne bajar û metropolên wan û li wir dijîn. (Her çiqas Başûr ji Îraqê rizgar bûbe jî hê li wir jî pêşveçûnek li ser şanoyê pêk nehatiye.) Gelek ji wan çûne li welatên Qafqas û Rûsyayê dijîn. Gelek ji wan bi giranî çûne welatên Ewropayê û welatên din dijîn. Ev rewşa koçkirinê, ji hevdûrketinê, perçebûnê ji aliyê pêşketin û birêxistinbûna çand û hunerê bi taybetî jî li ser şanoyê bandorek neyînî kiriye.

Bi kurtasî em xwedî pêşerojeke (rabirdû) şanoyê a bi rêxistinî û sazîbûn nîn in. Ên heyî jî dem bi dem û li gorî rewşa wê demê bi hin listik û hin xebatan pêk hatine. Di pêşerojê de rewşeke berdewamî û mayînde pêk nehatiye. Lê dewlemendiya çanda kurdan her daîm jî bo hebûna şanoya kurdî xwe nîşan daye. Li ser vê rewşa neyînî ne şano bi pêş ket û ne jî em ji tiştên heyî yan jî tiştên hatine çêkirin, haydar bûne. Tiştên ku hatine çêkirin jî ji wan ne nivîs, ne foto, ne vîdeo, yan jî em bibêjin belge li ber destê me tune ne. Lê ji yên heyî jî teqez divê em bi xebateke lêkolînî xwe bigihînin wan û berhev bikin. Ji ber van hemû sedeman ez jî dikarim şanoya ku li bakur hatiye çêkirin vebêjim.

Teksta kevntirîn a ku em pê dizanin a ku ji aliyê Abdurahman Rehmî Hekarî (Zapsû) ve hatiye nivîsîn e. Kurtelistikeke ji du beşan pêk tê ye, navê listikê 'Memê Alan' e. Li ser tekstê hevokeke wisa dinivîse 'Tiya-troya kurdan fazîleta kurdan noşî didit.' Ji çar listikvanan pêk tê. Memê Alan, Lewend (hevalê Memo, xulamê mîr), Çavreş (dayîka Memo) û Xezal (jina Memo). Ev tekst di sala 1919'an de di kovara Jînê de hatiye weşandin. Ji ber wateya wê ya kevntirîn û teksteke wek destpêk û dîrokî bû û me li ser navê

Teatra Jiyana Nû di sala 2001'ê de pêşkeş kir. Derhêneriya vê listikê jî bû nesibê min. Bi kurtasî dixwazim qala naveroka vê tekstê bikim. Beriya destpêka şerekî ye, Memo pê dihesa ku wê şerekî mezin derkeve û bihiştiye ku mîrê Hekariyan wê gazî hemû mêran bike. Ew jî destûrê ji diya xwe dixwaze, diya wî destûrê didê. Heman fikir û nêrîn ev e; 'divê ji bo îslamiyet û kurdariyê em ê welatê xwe ji filehan biparêzin, ev ferz e ji bo me, siltan Silhedîn şûrê xwe kêşaye, li pêşiya temamê dinyayê disekine û Qudsa Şerif diparêze.' Memo hefteyek e zewiciye, jina Memo Xezal digirî, bi çûyîna Memo ya şer ne razî ye. Dibêje; 'ez ê jî bi te re werim şer.' Memo dibêje; 'divê ez herim, rizgariya îslamiyetê û welêt berî her tiştî tê. Di şerê wiha de şerm e jin digel me bîn. Hem jî dayîka min bi tenê ye. Tu dê çawa bihêlî?' Memo diçe şer, piştî salekê vedigere malê, diya Memo ne li mal e. Memo wek mêvanekî li derî dixê, Xezal derî vedike lê rûyê mêvan naxuyê. Xezal mêvanperweriya xwe nîşan dide, piştî demekê mêvan yanî Memo ji Xezalê dipirse; 'hûn keça malê ne yan jî bûka malê?' Xezal: 'hûn mêvan neban, miqabilê vê suala te lazim tat ez bi çekan cewab bidim. Hindê qeder heye tu mêhvan î, qedrê mêvaniyê ser me wacib e û çu kurdan di mala xwe de deng mêhvana nekiriye û daîma kurmancan di riya mêhvanê xwe da can daye. Dijmênê kurmanca bibite mêhvan dişa qebûl dîkin û qedrî digirin û xizmetê bo dîkin.' Mêhvan (Memo) rûyê xwe vedike. 'Xezala min! Sed aferîn bo îsmeta te! Ez fexrê bi te dikim! Te ez nenasîm ez Memo me! Şîrê te xwarî li te helal bit.' Çavreş yanî dayîk tê malê di nava livînê de bûka xwe û merivekî dibîne. Diçe rimê tîne û li sînga wî kesî dide. Xezal: (ji Çavreşê re dibêje) 'Weeeeey te çavê xwe kor kir.' Çavreş pê dihesa ku li kurê xwe xistiye. Xezal û Çavreş bi hev re;

'Herê Memo, Memê Ebasî, Ebasî!

Birîndaro Memo, dayê kor bit, nenasî!'

Ji xeynî bakur listika bi nav û deng û watedar ji ev e. Dixwazim wê jî bi nav bikim. Ew jî 'Dayîka Niştiman' e. Weke ku tê zanîn di sala 1946'an de li ser damezirandina komara Mahabadê û bi şewazeke operat hatiye listin.

Dîsa listika 'Birîna Reş' a ku ji aliyê Apê Mûsa ve di sala 1959'an de hatiye nivîsîn heye. Weke pirtûk jî ev hatiye weşandin. Û apê Mûsa wiha dibêje; 'li rojhilat birînên reş zêde ne, nexweşiya zirav, trahom, cuzam û weke dayîka van nexweşîyan hemûyan jî nezani û xizani...'

Û hin xebatên ku mamoste Cemîl qal dîkir, li Stenbolê di sala 1985'an de kurtelîstikên bi navê 'Axa Sor', 'Dilana Şer' û 'Hecî Emer' bi awayekî şanoya odeyan bi şewaza şanoya gel a şoreşgerî ya ajîtprop li odeyên

malên taxan pêşkeş kirine.

Di sala 1990'î de jî li komeleya KAYY-
DER'ê di bin navê şanoya Evîna Welat de me listika bi navê 'Revandî' pêşkeşî gel kir.

Lê belê, esas berdewamiya şanoya kurdi ya bi rêxistinbûyî li Stenbolê di sala 1991'ê de bi vebûna Navenda Çanda Mezopotamya dest pê kir. Şanoya NÇM'ê wê salê listika bi navê 'Mişko' pêşkeş kir. Piştî 92'yan şanoya NÇM'ê bi navê Jiyana Nû heta îro gelek kurtelîstik û listikên dirêj pêşkeşî gel kirine. Navê hin listikan ev in; Mirin û Jiyana, Daweya Generalê Teneke, Ta Sê Ewrên Dûr, Rojbaş, Komara Dînan (Şermola), Bayê Elegezê û bi dehan listikên din pêşkeş kirine.

Ji sala 1992'yan şûnde hin şaxên NÇM'ê jî vebûn. Girêdayî wê, komên şanoyê jî hatin damezirandin. Girêdayî şaxa NÇM'ê ya Îzmîrê şanoya Hêvî jî listikên weke 'Sîmûrg û Ronahî', 'Gurî', 'Hêvî' û hwd. pêşkeş kir. Şanoya şaxa Edeneyê Teatra Yekbûn, şanoya şaxa Amedê Dengê Gel, şanoya şaxa Mêrsînê Teatra Arzeba gelek listik pêşkeş kirin. Piştî sala 2000'î li Stenbolê şanoya Seyrî Mesel listikên kurmançî û kîrmanckî pêşkeş dike. Piştî sala 2004'an jî koma şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ligel listikên tirkî dest bi listikên kurdi kir. Û dîsa li Stenbolê şanoya Avesta, şanoya DestAR-Theatre, li Êlihê şanoya Navenda Çanda Biharê listikên kurdi pêşkeş dîkin. Her wiha li hin navendên çandê û li hin komeleyên listikên kurdi tî amadekirin.

Ligel van navên me li jor jimartine jî gelek kes û komên ku me qala wan nekirine jî hene.

Bi kinasî em dikarin bibêjin ku êdî li Bakur karê şanoyê bi awayekî berfirehtir û her ku diçe profesyoneltir tê kirin û di demên pêş de dê zêdetir deng bide.



Birîna dilê min

Ronî PÊXÊLSOR

Salên 1990î li welêt ji aliyekî ve jiyan giran û kujer kiribûn ji aliyekî ve jî civaka me bi partiyên rengkurdi yên legal re dida naskirin û mangirtin diket jiyan me ya ci-vakî û ji aliyekî ve jî qada jiyanê bûbû wek dika şanoyê. Şanoya gel jî serî dida.

NÇM (MKM) li Stenbolê, paşê şaxa wê ya yekemîn li Amedê vebûbû, paşê jî Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê. Kovara Rewşen jî aliyê NÇM'ya Stenbolê ve dihat derxistin û li Kurdistanê jî NÇM'ya Amedê belav dikir. Baş nayê hişê min, an di hejmara duduyan de bû yan jî di ya sisêyan de kurteçirokeke bal-kêş (ku rastiya jiyan me bixwe radixist ber çavan û hatibû jiyîn jî) bi navê **“Birîna Dilê Min”** hat weşandin. Zêde deng veda.

NÇM'ya Amedê bi amatorî kar dikir. Komê ciwanên dilgêş şanoya bi navê **“Şanoya Dengê Gel”** di bin banê wê de avakiribûn. Di mangirtinan de, di dawet û şahiyên de, di Newroz û 8 Adarê de li taxan, li qadan, li NÇM'ê derdiketin ser dikê. Li taxan, carinan di bodrûman de jî dilistin û ji nava gel kes jî tevli wan dibûn û wisa hej-mara listikvanên wan jî zêde dibû û hinekan bi biryarî bi wan re xebat didomandin. Polês jî her gav li pey wan, bi wan re veşartok dileyst. Yanî bi rastî jî gel wek ku şanoya xwe û şanogerên xwe diafirand û derdê xwe vedigot. Ev li Bakurê Kurdistanê şeweyeke nedîti bû bi saya têkoşînê. Qadeke hunera gel a ku ji qada bindest hêza xwe digirt û bilind dibû radixist ber çavan. Ev hêza gel a ku ji hezar salên çand û kesera kevnare dihat bû. Kurdê xizan derdê xwe vedigot û çareserî şênber dikir.

Di sala 1994'an de listikvanên Şanoya Dengê Gel ev kurteçiroka navborî yanî **Birîna Dilê Min** bi kolektîfî jî bo şanoyê amade kirin. Îcar tenê ne listik; cil û berg yanî kostum, dekor ku ji telisên nîskan çêkiribûn, senaryo, perdeya ku çiya, av, dar û ber tev jî kincikan kiribûn wek xuyaniya rastîn, çekên ji textikan ku paşê li Stenbolê bûbû sedema girtina wan, wan tev bi amatorî amade kiribûn. Yanî her tişt berhema ked û xwêdana wan, a dilê wan bû. Pêşiyê bi

dizî li saziyên sivil ên Amedê û ji gel re jî di bodrûman de, listin. Pir zêde bal kişand û vê deng veda. Mijara wê: jiyan malbateke kurdên xizan di kesayetîya qîza wan **Sey-ranê** de ku wê bixwe vedigot bû. Bav jî ber mayînen sînor qop bûbû û li gundekî He-zexê yê derdora Newala Hespistê dijîn. Sey-ran jî feqîriyê diçe ber sixlikan; yanî diçe ber colê karikên gund. Zero jî golikvan e, dibin heval û paşê evîndar. Di wan salan de çol ne xalî ne û şervan dikevin jiyan wan û têko-şîn û çîrok an jî jiyan ber bi serborîyeke awarte ya jiyan wan didome. Ev awarteyî ji jiyan kurdan re nû û banga azadiyê ye. Ji ber vê xweseriyê û listika şanogeran wek erdhejekê çêbû.

Li ser vê derketin tûrneyê; cara yekemîn li Stenbolê di 29'ê Kewçera 1994'an bi bilê-tên fermî hefteyekê derketin ser dikê. Paşê li Îzmîr û Edeneyê tevli çend caran girtina bin-çavan listika xwe domandin. Tûrneya wan mehekê bê navber dewam kir. Hinek jî lis-tikvanên vê şanoyê ceza ji xwarin û ketin girtigehê.

Şano: Birîna dilê min.

Listikvan: Fîkret, Welat, Nazmî Kirik, Elvan Koçer, Evîn Serîn, Medenî, Sorgul Alokmen, Hûlya Alokmen, Perwîn Kaya (ku bi rewşeke dramatîk dawî li jiyan xwe anî), Osman...

Kom: Şanoya Dengê Gel a NÇM'ya Amedê.

Hêjayî gotinê ye ku di karê ronahiyê de Hozan Farqîn û di mûzikên wê de jî Tûran Yapiştiran xwedî kedeke zêde û giranbuhane.

Li bakurê welêt cara yekemîn bu ku şanoyeke organîzekirî bi kurdî ev kar dikir û NÇM'ya Amedê serkêşî dikir. Her çi qas li Stenbolê Tiyatroya Jiyan Nû di sala 1991'ê de ev karê yekemîn kiribû jî, li ser axa welêt Şanoya Dengê Gel pêşîvaniya vê çirûskê kir. Mîrov viya bi serbilindî bi bîr bîne.

Divê kurd di her warî de dîroka xwe bin-vîsinîn û bîra xwe tije û dewlemend bikin. Divê ev kar jî kesên din re nemîne. Bi hêviya azadiyê...

Arsênê Reşît Polatov (1942- 2004)


“Li vê derê çalkirî ye artîstek, kîjan wî tu caran xeber nedida lê temam digot”

Hunermendê pandomîmê yê kurd ê herî bi nav û deng bû.

Polatov, yek ji hunermendê şanoya bédeng (pandomînger) ê herî bi nav û deng li Sovyeta kevn û li cîhanê bû û li derveyî sînorên Sovyetê jî dihat naskirin. Polatov, di serî de li Zanîngehên Moskova û Sorgonê, li gelek zanîngehên cîhanê dersên şanoyê (tiyatroyê) û pandomîmê dida. Her wiha gelek caran ji bo dersdayîn û semîneran ji bo zanîngehên Parîsê, Berlînê û Pragê dihat vexwendin. Bi dehan pandomîm, şano û skêcên ku Polatov bi xwe nivîsandine û derhêneriya wan kiriye, li gelek bajarên cîhanê hatine lîstin û gelek hatin ecibandin. Arsen Polatovê ku bav û kalên wî ji dorhêla Serhedê, ji warê Qers, Agiriyê piştî qirkirina xristiyan û êzîdiyan berê xwe dabûn Ermenistanê, ji malbeteke kurdên êzîdî bû.

Jînenîgarî

Di sala 1942'yan de li paytexta Ermenistanê Êrîvanê çavên xwe ji jiyane re vekir. Beşa Felsefeyê ya Zanîngeha St. Petersburgê di pola sêyemîn de terikand. Paşê Beşa Rejîsoriyê ya Zanîngeha Moskovayê kuta kir û li Parîsa Fransayê, ji Pîrê Pandomîmê Marseille Marso bi qasî du salan dersên pandomîmê girt. Di sala 1971'ê de bi handan û piştgiriya Yekîtiya Sovyetê li Êrîvanê Dibistana Pandomîmê ya Arsen Polatov hat vekirin û Polatov li vê dibistanê bi sedan şagirt perwerde kir, her weha ew hîmdar û rêvebirê şanoya pandomîmê ya Êrîvanê bû. Piştî, bi destûra Wezareta Çandê ya Yekîtiya Sovyetê, Şanoya Dewletê ya Moskovayê hat avakirin û Polatov li wê derê wekî rêveber, der-



hêner hat ser kar. Di navbera salên 1975 û 1995'an de, ji 20 salî zêdetir bi sedan şagirt û şanoger gihand. Polatov, ji sala 1995'an heta roja ku mir li 'Beşa Dîroka Pandomîmê ya Zanîngeha Dewletê ya li Yaroslavlê' wekî hindekar kar û xebata xwe berdewam dikir.

Xebatên Polatov ên li Elmanyayê

Polatov di sala 2001'ê de li Akademiya Kurdî ku wê demê li bajarê Durena Elmanyayê bû û di navbera salên 2001 û 2002'yan de li bajarê Wuppertalê di bin banê *Mala Çanda Baran* (navê fermî: Baran Kultur Haus e.v.) mamostetiya şanoyê dikir û komeke şanoyê ya bi navê TEATRA BARAN perwerde dikir.

Di sala 2004'an de ji ber nexweşiya dil li bajarê Yaroslavlê ya Rûsyayê ku li nexweşxaneyê wî bajarî dihat dermankirin, ji ber têkçûna dil jiyana xwe ji dest da. Arsen Polatov bavê du zarokan bû.

Mêtingerî

Di vê serdema bê hefsar de
bi navê al û olan
giyanên me bi kêrên ko rîsî kirin
di bin barana mêtingeriyê de tewilandin
kewên nêr li ser termê me diçêrin
xwedî dilên çav bi kêr in
şevşevokên xwîna şêr in

Tê bîra te

Di şîpên bêrîkirinê de
Şilftazî
Li hev hatin çavên me
Bi hevşabûna lêvan re
Seridîn ceh û genim

Li ber çira aşvan
Weşîyan rûpoşên navbera me
Di sura bayê zozanan de

Bi qebqeba kewan û
Dengê bilûrên şivanan re
Şiyar bû zarokê navbera me

Li ser piştê hespê rewan
Bi refên qulingan re
Rabûn govendê bîranînên me

EMRO

Emro li me êvar e
Li guhê gundan
Hesp serberdayî
Axpîn di şînahiyê de xeniqîne
Bûmê kor li ser kêlikên xiraban
Ji bêkesiyê re hêstiran dibarîne

Emro
"xêrê bikî qet nebînî"
Qebqeba kewê nêr e
Gulên berbiro kofiyê xwe çemandine
Li şaneşînên bajar û bajarokan

Xiltên kor li avahiyên spehî kon vedane
Şaşik li serê me gerandine
Newşênê li deşta binhişê me digerin...

Rovî gur û şêr

Mehmet ONCU

Divên, rojek ji rojan
li welatê daristan
mîr û pêşa koviyan
ketibû ber êşa can

Ew lehengê simbêlburz
destgiran û pencegurz
ji xwarinan bû aciz,
dest û pê lê diteviz

Tev lawirên daristan
xelat hildidan destan
torî, hirç û berazan
çûn gel mîrê Kovistan

Bûyer bi guh gur xistin
gur jî bo ser lêxistin
rabû biçe daristan
rovî ve'î hev rast hatin

Gur got; roviyê bira
em herin qesra mîra
mîr nesaxe li wira
em biçin bo xatira

Ew rovî poz bilind e
poz bilind dêl kulind e
got; rewş ji bo min rind e
qene tehde'î min nade

Ew mîrê'î xwe re mîr e
bila bibe'î min dûr e
herkes jî weke mîr e
ji piştî bavek jîr e

Nîqaşa wan dewam kir
Gur, rovî qane nekir
her pîrsa wî bersiv kir
şora gur pere nekir

Gur û rovî'î hev nekir
rovî çû xwe li ba kir
xwe'î ber çavan wenda kir
gur da rê'î tenê gav kir

Gur hat ber qesra mîr e
got çi qonaxek gir e!
mîrê me gelek jîr e
xwedî maleka wir e

Hat deriyê şikeftê
wek ku bête mizgeftê
raborî'î ser civatê
xelat kire radestê

Gur xar bû çû destê mîr
mîr got; kerem ke bêt vir
ez li benda xwarê gur
tu hatî ji riya dûr



Got; kefarete be mîro
jan ji te biçe dûro
ser navê mala guro
ez rabûm hatim viro

Dom kir got; tu mîrê jîr
rê ve'î bin dara hêjîr
min dît ew roviyê vir
min nekarî bînim vir

Bi sond û gotinên pir
gur giliyê rovî kir
ew li wê civata mîr
rezîl û şerpeze kir

Mîr qehrî bi ya rovî,
ji wî nedikir hêvî
got; rovî kir bêbavî
xayînê mala kovî

Got; bi sed sond û peyman
ku derbas be ew gavan
bajom ji warê bavan
heta ew bûye jovan

Rovî hûnera gur bîst
li ser wê pilanek rist
Got; wey gurê şêrperest
boçê li te bikim bist

Borî bû axir zeman
piştê hefte û mehan
ew roviyê zor yeman
li dîwanê hat xuyan

Şêr ew dît bi mirûz bû
rûqarîm û zor hêrs bû
silav jê wergirtibû
ew jî'î udên rûyan bû

Rovî kete ser çokan
dengê melûl û jovan
wek kesekî dilovan
şor bere ser hevdu dan

Rovî'î dengê xwe yê kal
xistin pê hev şor û qal
doza xwe li qal û bal
kire ber mîrê sewal

Digot; lo mezinê min
tu'î napirsî'î halê min
ew kalemêrê'î pişt min
çima nayê li gel min?

Derdê te re serhêj im,
çend meh in weke gêj im
digerim tê nagêjim
wek evîndar dengbêj im

Li pê me ji diyaran
ser bijîjk û dixtoran
digerim ji dermanan
ji bo mîrê ajalan

Şêr got; bes e nebêjî
ez bûme têr û tijî
ji van gotinên bejî
tu zor zimandirêj î

Got; tu kalek î gêj î
li pejinî dibêjî
ku ne vir e bibêjî
dermanê'k tu dibêjî

Got; mîro tu camêr î
lehengek cengewer î
ji gelacên vî warî
tu car nekî bawerî

Got; ez gorî çavên zer
ew cotê'b nûr û nezer
navbera me xira kir
fesadên zor derewker

Rovî'b zimanek wêje
Bi vegotinek taze
ew civata nemaze
kir sermest û bin hêze

Bandora ristina wî
hirçek rakire ser pî
girt patka gur da bin pî
pencê xwe xist zikê wî

Hirç got; gurê malwêran
lo rû reşê ajalan
te buxtan kir li kalan
zagon kire bin pêyan

Şêr hirhirî got hirçê
Karê te kirî ne çê
bo yekî diranqîç e
zilamê min kir hinc e

Rovî kete navber e
gotinek avêt ser e
Got; mîrê min ew xêr e
li min bibe guhdar e

Divêt, kawek qursaxî
bête deranîn saxî
hûrik hûrik wî hûr kî
laçekê re derbas kî

Dermanê ku min anî
bixwe weke mêranî
te rake ser pêyanî
tê bibînî noşanî

Dinê li gur tarî bû
hirç û torî rovî bû
gur li erdê raza bû
qurbana dermanî bû

Girtin xwe avêtin ser
gewriyê xwîn kirin der
kaba wî anîbûn der
goştê wî ma li wê der

Kaba wî hûrhûr kirin
Laçekê'r derbas kirin
ew raberî şêr kirin
noşî canê wî kirin



Şêr derman xwar rabû pê
ajal mat mabûn li wê
çi dermanekî'b hêz e
hemû jê girtin fêz e

Êşa canê şêr der bû
got; tu apekî çak bû
rex biraziyê xwe bû
me qedrê te nizabû

Rovî bû apek birêz
rihsipiyekî ezîz
hemû lawir girtin rêz
ji kêfan re dilehîz

Piştî gur bû melamet
rovî derket selamet
gelekî didî rûmet
jê re dikirin hermet

Ji piştê rojan rojek
ew û rovî li rex yek
ji bo xwarina danek
mîr derkete seyranek

Berê xwe dan daristan
borîn ser bax û bîstan
ji ew newal û bestan
ew lehengê kovistan

Hêdî hêdî dimeşîn
herdû bi hev dilgeşîn
ew qal û pirsên meşîn
ji devê wan diweşîn

Kaleroviyê rêzan
şêr bir welatê beran
tev kevir û zinaran
li wir dikirin geran

Ku derbas bûn hin deran
rovî dikire giryan
Şêr got; tu apê mîran
ji bo çi dikî giryan?

Rovî xwe bi qedir da
sira girî nedida
herdem ax û keser da
şêr di meraqê de ma

Got; de apo ka bêje
kela dilê'x vebêje
ew çîroka dilhêj e
bi tintêleka wêje

Got; birazê nebêje!
ez bûm kalekî gêj e
feleka çelekdos e
kes pesnê xwe nebêje

Bavê te mîrê mîran
me'b hev re dikir geran
li vî welatî beran
rehmetiyê dilovan

Ew mêrekî şervan bû
lê ne bi tenê şêr bû
weke teyrekî baz bû
ew xwedî per û bask bû

Bi pesnên kalerovî
şêr hat sekneke hovî
Got; ez ciwanê kovî
ketim pişta wî bavî

Rovî bi wan pendên xweş
dilê şêr kirîbû gêş
dikarî wî bajo pêş
mîrê ehmaq û serxweş

Ew der kevir û ber bûn
pîj û tûj wek sitrî bûn
mîna şûrê kalan bûn
teva kendal û ref bûn

Şêr bire ber kendalek
hafekî kûr wek bîrek
bin de kevirên direk
her yek mîna xencerek

Got; tu birazêyê jîr
weke bavê xwe yê mîr
ji ser ew kendalê kûr
dikarî xwe bavî dûr

Şêr got; apo ew qet e
pê min hêz û' b qewet e
kendalek zor rehet e
me mîran re dawet e

Got; bavê te yê peya
herdem digot ew pêvva
şûna piling û şêra
nagere kundên dêra

Got; apo, tehn bi êş in
ew pêyvên çort nexweş in
divê, hûn vê bizanin
çêlkê şêran tim şêr in

Bi vê şor û tehna çort
zor êşîya şêrê xort
ez bimrama' b rima kot
xwazî te wiha ne' b got

Şêr bi şûn de vekêşî
davên wî' j hevdi kêşî
wek tîrek' j kuan kêşî
xwe berda ser wî kaşî

Tîra ku' j kuan kêşî
bi şûnde venakêşî
xwe avêt şêrê wehşî
ser kendalê hilweşî

Kûr bû kendalê wêran
dûr û dirêj wek bîran
pêyên şêr tê negîhan
navbera herdû beran

Şêr firiya di refê
fehm kir ku kete dafê
li rovî dixwar gefê
jovaniyek bê mafê



Şêr li xwe hat mikurî
Got; mîro tu dimirî
ger tola xwe bihêlî
tê biçî çav vekirî

Ew kêndêlê çel her in
her herinek bi ber in
ew berên wek xencer in
di laşê şêr diherin

Şêr ket binê newal e
pişt şikeştî' b zewal e
bi birîn û bê hal e
dikire nalenale

Rovî jor de şêr didî
fehmir îşê wî qedî
Got; hiş kême bê xwedî
tê bigêj ilmê rovî

Çû ser şêr re rawestî
wek cengawerek westî
Got; mîrê piştşikestî
êdî tişt nayê' j destî

Şêr got; tu dil bi hest î
wek şûrê sedefdest î
apek wek dîwar best î
tim pişta min rawestî

Êdî xêr di min neman
bila xweş bin yê' l pê man
birazê' b gorî apan
dixwazim maç kim destan

Apê min zor ciwan e
ser min xwedî heqan e
min nêxî bin deynan e
bidî min helalyan e

De ka apo bêt ba min
destê pîroz bidî min
helal dibe goştê min
wê demê ji apê min

Rovî fikra şêr zanî
bawerî' j wî neanî
gavek navêt wî alî
Got; ap nayê xapanî

Got; kurê min tu dîn î
wê dewranê nabînî
bi babetek roviyan î
bavê te xwar vî canî

Şêr bêhna dawiyê da
goşt û purtê wî' l wir ma
rovî bi gezan lê da
goştê wî xwar û pal da

Min xewnek dît

Adnan ÇAKI

Min bayê bermahiya li ber ramûsanên şîngever mabûn dikir melhema ser birînên ji ber şûr û tîrên evîna te mayî.

Min êvarîyeke ku rojeke kerixî û westiyayî li paş xwe hêlayî jiya. Tije kerkot û hêvî-kestiyên ji rojeke li hilhatina xwe posîdebûyî ku di nivîna tariyê de ketibûn xewa mirinê. Êdî nema dixwestin li rojeke din a kerixî şiyar bibin, loma jî di kulîna şevê de mexel bûn.

Min li asîmanên şînxalî stêrkeke nûciwan dît wek keybanû û şahjina stêrkan, li pay-texta asîmanan rûniştibû, tîrêj û zeraqên rengîn dadiwerivandin ser jîyanê. Ji heyvê geştir, ji rojê bedewtir bû. Min dikir ku ez wê bixuricînim asîmanê dilê xwe. Li text û pal-danka şahjina dilistana dilê xwe bidim rûniştandin da ku taca keybanûya welatê xwe bi şanazî deynim ser serê wê û xaka xwe bi şewq û ilmê bedewiya wê rizgar bikim. Wê bikim şahjina rûmetê ya niştimana dilê xwe.

Min evîndarek nas kir, çeleng û lihevhatî. Alûz û şahlewend. Tovê dilsoziya evîneke bêhempa li zeviya dilê xwe reşandibû. Piştî xwe spartibû hêvî û bendewariyeke vegera wê nediyar. Lê bi hezaran ramûsanên pîroz di riya dildarê xwe de li ser singezozanên xwe werkirî.

Min şervanek dît, şêrejin û awirhetav. Hêviyên azadiyê li dilên beyar diçandin. Di pêşerojên destdayî de mizgîniya jiyana şad û bextewar li elendeyên hêvîçilmişî yên bawerînemayî belav dikir. Dîrok li ser kevala heyvika bi adan bi tîpên zêrîn nexş dikir. Jiyanêke têrwate û bêhemta li keliyên di demê de asêmayî bar dikir. Berê hemû cihok û besterûbarên lawaz û melûl arasteyî nav çemê şaristaniyê yê mezin dikir. Herikîna demê diguhert û bi bayê serê sibehê re

jiyanêke nipînû diyarî zarokên dahatûyê dikir.

Min çiyayek nas kir, tije penageh û berqefên li dû şoreşekê mayî. pasvaniya welatekî ku roj di berbanga azadiya wê de dil hatiye girtin, dikir. Hêlîna teyrên baz aramgeha nemirên ku navên xwe li dilên jîndar niqirandibûn. Şahidiya şoreşa dayîkê û mazûvaniya şoreşa azadiya jinê kirî. Wekî dergûşa şaristaniyê û çavkaniya jîyanê. Ji ber mêvanên di hembêza xwe de dieziman-din serbilind û sorgezve.

Min geliyek nas kir, hêvîbexş û penahende wekî pinhana şervanên ji bo azadiya xwe têdikoşyan. Mîna sazgêriya şoreşê sazdar. Nola hêlîna çûkên azad. Dor û berê wî bi dar û deviyên serbixwe hatiye raçandin.

Bi xemla bûkeke nûciwan bi gul û kulîlkan hatiye xemilandin.

Min li êvareke ku di bin ronahiya heyveke keslan û stêrkên destpeliyê de ketibû xeweke giran de, xewnek dît. Di koda xewnên razber de meyiayî. Her tiştê xwe manendî jiyana rasteqîn. Şênber û berbiçav. Destpêker û jîyanbar.

Hestpêker. Kartêker. Bihizyar. Rambar û xwezayî. Lê di bin siya şevê de razayî. Ji hemû dan û demên jîyanê rengintir û ji hesûdiya tîrojên hetavê dîr û xweştir.

Ligel zêdebûna ewrên ramanên xwe, min di nav tîqetîq û vejena birûskên şîndar de taviyên xewnan dibarandin nav kûrahiya şevê.

Min ligel bawerzîna hespê şahjineke evîna xwe, ya di ser xilmaşiya şeva min de werkirî di kolanên şevê de bi birîndariya guleke ser-som ber bi dilê azadiyê ve bi çargavkî dibezîya de, xewneke birîndar dît.

Min şervanek dît, şêrejin û awirhetav. Hêviyên azadiyê li dilên beyar diçandin. Di pêşerojên destdayî de mizgîniya jiyana şad û bextewar li elendeyên hêvîçilmişî yên bawerînemayî belav dikir

Wêneyek

Şengul OGUR

Bêvila wî di qulika çavê wî yê çepê de şîn hatiye. Li şûna çavê wî yê rastê jî tilika gizrê heye. Çavê wî yê rastê di cênîka wî ya çepê û çavê wî yê çepê jî di cênîka wî ya rastê de şîn hatiye.

Zimanê wî yan di binê piyê wî de ye yan jî qet tune ye. Qul di diranên wî re hatiye kirin û ew li stûyê wî hatiye gerandin.

Serê wî weke çargoşe yan jî pêncgoşeyeke ku berê wê timî li jêr e. Reşikên çavê wî yek bi jor de şemitiye û ya din jî bi jêr de. Porê wî ku weke pelên darçiloya ku ar pê ketiye ye, bi ser xêzên eniya wî ku tu dibêji qey cotkarekî gîsnê xwe di nav re biriye, ye.

Dora reşika çavê wî sor û şîn e. Sor bi ser sorê xwînê ve diçe û şînê wê jî bi ser şînê rimî û pêtiyê ve diçe.

Li bêvila wî şûna bistên sorkirî û kêran heye. Diyar e ku bi kulmên jidiyayî jî bêvil hinekî bi xwar de çûye.

Lêva wî ya ku bi qemçika wî ve ji hev vekîşiyaye bi xizêm e. Parsûyên wî ji parsûyên mirovan kêmtir in û yên ku hene jî şikestî û xwaromaro ne.

Qet deng ji wî nayê. Di biniya reşê tarî yê şevê de pala xwe daye tenêtiya ku ji sosretiya wî pêk hatiye. Stûyê xwe bi aliyê çepê û ber bi jêr de xwar kiriye. Kesê ku wî bibîne teqez wê bibêje qey ew berhema firçeya wênesazekî dîn e. Gelo ku Picasso ev aferîde bidîta wê li hemberî vê aferîdeyê çi hest bikira!? Wê dilê xwe bibijanda "huner"eke bi vî rengî!? Wê bigota, "Xwezî min bikaribûya tiştêkî wiha li kevalê bida!" yan ew jî wê li hemberî vê sosretiye biketa şaşwaziyeke dîner û pê re wê rahiştî firçeya xwe û ew bavêta ser sergoyan!?

Ev. Ew berhema çi ye? Ji ber destê kîjan "hunermend"î/ê maye? An jî kîjan dinî/ê?

Mirovek çawa dikaribû ev qasî ji teşeyê

xwe bihata xistin? Gelo, niha ew hay ji sosretiya xwe ya neditî, ya nehatiye fîkirîn, ya nehatiye bihistîn, heye? Ew dizane ku ew ji însanetiye ketiye? Hay jê heye ku bi cografya û teşeyê hemû organên wî hatiye listin?

Niha, dema ku ew bi çavên xwe yên ku di cênîkên wî de bi cî bûne li ezmên dinîhêre - gelo dikare binere- çi dibîne? Ew dilê wî yê ku di cihê gurçika wî ya çepê de hatiye bicihkirin, çi hest dike?

Bêvila wî ya ku li ser şopên şewat û birînên kêran û dewisandinên kulman hene, bêhnna dike?

Ew dikare bêhnna ku ji laşê wî difûre bike?

Hiş...Gelo hişê wî heye? Hişê wî, rewşa wî ya berê; ya dema ku ew jî di şikl û şemala mirovan de bû bi bîra wî tîne? Hişê wî mirovbûna wî ya demekê bi bîra wî tîne?

Gelo ew niha dikare rewşa xwe bibîne? Ku çavên wî yên ku di cênîkên wî de bi cî bûne, di neynikekê de çav li xwe bikeve; bibîne ku di çavên wî de tilika gizrê heye wê wateyeke çawa lê diyar bibe?

Milên wî di piştê wî de ne. Piştê wî di zikê wî de ye. Heyva li ezmên xwe jê dûr digire. Stêrk heta ku ji wan tê ber bi jor ve bazdidin. Lat û kevîrên li der û dora wî bi cih bûne tu nemaye bi ling bibin û ber bi tariya tunehiyê ve xwe biavêjin. Çiyayê li der û dorê hewl didin ber bi gopîtkên hev ve bazbidin.

Lê ew!.Ew hay ji xwe heye gelo? Ew, ev qas tiştên li der û dora xwe dibîne? Dizane ku her kes, her tişt ji wî direve?

Ew tevna live. Li rûyê wî keneke genîbûyî heye. Tenê mêşên li ser gû xwe li vî kenî digirin.

Kurm û kêzan bêvila wî ji xwe re kirine war. Li şûna zimanê wî qîlê mêr heye. Di çavên wî de qelş hene û rimî ji wan qelşan bilind dibe. Di çavên wî de qelş hene

û ji wan qelşan tunehî mezin dibe.

Ew kî ye? Çi ye? Ji ku ye? Çima wilo lê hatiye? Ev berhema kîjan "huner"ê ye?

Di çavên wî de çirûskên genî yên ku ji halê xwe ne nexweş in, hene. Wilo xuyanî dike ku ew ji afirînerê xwe hez dike û ew spasdar e ji bo ku afirînerê wî ew xistiye vî şiklî! Ku ne bi dilê wî ji bûya ma gelo wê afirînerê wî bikaribûya ew bixista vî halî?

Wî pala xwe daye diwarê tunehiyê û stranên tunehiyê dilorîne. Li ser lêva wî melodiyên bêxiretiyê şîn tîn.

Tiliya xwe ya gizrê di nav celbeke gû ya li ser sifreya li berê raxistiye kiriye û li devê xwe digere da ku wê di devê xwe re bike. Belkî di devê xwe re kiribe jî; loma gûyê li ber wî kêmbûye û şûna gûyê ku kêmbûye hişk bûye.

Li dêma wî dirî û sitrî şîn hatine. Di nava van dirî û stiriyan de ajalên dilxêner xuyanî dibin.

Roj di nava ewrên tarî de fetisiye û tirs ku wê careke din hilneyê dide. Lê li ser wecê wî qet tirs hilnehilatina rojê tune ye. Tariya li der û dorê tîrtir dibe. Nayê zanîn ka gelo taritî di wî de tune dibe yan ew di taritiyê de!

Hatin

Her hatinek bi qasî çûyinekê dijwar e,
Her jiyanek bi qasî mezinbûna xwe li xwe digêrîne,
Her mirinek rengê tariya xwe ye.
Emir berberî qelsbûna xweyî pûç e.

Ne ku
Bayekî kur li te ra be!

Ne ku
Qesem li singê te yî sor bixe!

Ne ku tu bimirî!

Ew zîvên xwe yek bi yek
Bera ser gîzoka te dane
Û du çavên kilkirî ne hezkirin,
Qirikeke zirav û dirêj e...

Min û te
Min û te li ser çiyayekî xwe xeniqand.

Ez careke din diherim
Û bêhna porê te bi xwe re dibim,
Lêvên sor bi xwe re dibim.
Ji bo carna ji dilê min re xwe tevbodin.

Mehmedxan GULŞENOGLÛ

Bêhişo

Xalit TARÎ

Jan malxerabî ye ji kesên bê kesayet re
Mijarên hebûnê ji zû de qediyane
Ma ev stran, ev helbest tunebûnê nastirên?
Ma disitirin ev çira û aso
Reşêşkên reşahiyan tevnagerin
Ji zû ve
Reş çav, çav reş
Kîjan rast e, ji zû ve ye ji bîr kirin

De qe neke looo
Ji êvar de
Kewnê dinyayê ji aş û baş disincirin
Termê min ê bêtaqet
Li ser piyê mejiyê min dinyayê hildigire
Aha ev bi me xweş e
De bimeşe bêhişo
Dinya sivik e yê giran tu yî
De bigêrîne jana xwe
Yê esil tu yî

Mem û Zîn

Bahadîn ROBAR

1. Gora Mem û Zînê di binê Medreseya Mîr Evdal de (Medreseya Mîr Evdal dikeve rojavayê goristana bajêr) di nava goristana bajêr a sedsale de ye û goristan jî di nav sînorên sûrên Cizîrê de ye. Û her wiha goristan dikeve aliyê bajêr ê başûr û derdora goristanê bi tevahî avahî ne. Gora Mem û Zînê di sala 2007'an de ji hêla şaredariya Cizîrê û Yekîtiya Ewropayê ve hatiye restorekirin.

2. Gora Mem û Zînê di navenda bajêr de û li taxa Deriyê Çiyê li kêleka riya Hevrîşimê ye û dikeve başûrê rojavayê Mizgefta Mezin û başûrê Mizgefta Nebî Nuh (a.s)

3. Li ser rasteqînî û nerastiya destanê gelek nêrînên cuda hene. Lê li gorî ku di nava gel de belav bûye destana Mem û Zînê di binyata xwe de rast e lê feylesofê kurd ê nemir Ehmedê Xanî li gor rewşa kurdan a wê demê şîrove kiriye. Dibe ku hin tişt lê zêde kiribin û hin jî jê kêmkiribin. Lê belê destan ne mîtolojî ye û evîneke bi vî awayî hatiye jiyan. Heta malbata Beko niha jî li Cizîrê dimîne, lê ji ber ku navê Beko bi neqencî tê bilêvkirin ev malbat înkâr dike ku ne ji malbata Beko ye. Mixabin ji ber şer û pevçûnên di navbera mîrekên Cizîrê û dewletên desthilatdar de derketine, malmezin û pêşengên kurdan tim hatine nefikirin û herî dawiyê jî di sala 1847'an de tevahiya mîrekên Cizîrê hatine sirgunkirin û malbata Mem û Zînê dibe ku di van serdeman de hatibe nefikirin û ne li Cizîrê be.

4. Di serî de Gelê Cizîrê tevahiya herêmê evîna wan weke evîneke xwedayî û pîroz dipejirîne. Her kes di evîna xwe de dixwaze weke ya Mem û Zînê ji hev re dîlsoz be. Evîndar ji bo bigihîjin hev pir biheter in (îsrar) û zû bi zû ji biryara dîlê xwe venagerin. Gelê Cizîrê jî ber ku ji Cizîrê ne û hembajariyên Mem û Zînê ne, xwe bextewar dihesibînin. Li Cizîrê navendeke çandê ya bi navê Mem û Zînê û

her wiha navendeke şewirmendiyê ya jinan a bi navê “Mala Stiya Zîn” heye û gelek kargeh û kesan jî ev nav li xwe kirine. Dema kesek bixwaze nifiran li keçekê yan jî li xortekî bike dibêje; “Rebî mirazê te bibe yê Mem û Zînê”. Li Cizîrê ji kesên derewker (virker, rastnebêj) re “Beko” an jî “Bekoyê Leîn” tê gotin. Di stran, helbest û çirokên Cizîriyan de qala Mem û Zînê pir tê kirin. Hê jî zîndana ku Mem tê de maye ya di nava sînorên Birca Belek û Keleha Cizîrê de dimîne (Piştî 163 salan beriya 4, 5 mehan ji leşkeran hat valakirin ango esker jê derketin.) Beşek jê ava ye û jê re Zîndana Mem tê gotin. Dema mirov diçe hundirê wê mirov hestiyar dibe û bandoreke giran û saweke mezin li ser mirov çêdike.

5. Heta beriya çend salan serdestan qet ne qala vê destanê dikirin û ne jî dixwestin tu kes qala wê bike. Kêm kesên ji wan, ev destan dixwendin. Lê piştî zîmanê kurdî di qada neteweyî û navneteweyî de belav bû û hat naskirin, êdî wergerên vê destanê yên bi tirkî hatin çêkirin û kurdan wêrektir karibûn qala wê bikin û hindik be jî tirkan û gelên din jî mereq kirin û der barê vê destana evînî ya xwedayî de xwestin bibin xwedî agahî. Lê ji hêla wan ve zêdetirîn weke destaneke evînê tê xwendin. Naveroka destanê ji hêla milî ve nayê dîtin. Piştî filimê Mem û Zînê bandoreke mezin li civaka kurd û tirk kir. Bi taybetî kesên akademîsyen û entelektuel vê mijarê mereq dikin û dixwazin serwest bibin.

6. Zêdetirîn keç û xortên nezewicî, nivîskar û kesên weke tûrist gora Mem û Zînê ziyaret dikin. Hema hema ji hemû aliyên cîhanê kurd û gelên din tene ziyareta vê gorê. Keç û lawên ku ji hev hez dikin diçin ziyareta gora Mem û Zînê û ji bo bigihîjin miradê (miraz) xwe dia dikin. Ji bilî vana jî ji hemû temen û çinan mirov vê gora pîroz ziyaret dikin.

Sê soneyên evînê ji danê nîvroyê

Pablo *NERUDA*

XL.

Kesk bû bédengî, ronahî şil,
weke minminîkekê direhilî meha hezîranê
û li herêma Başûr, ji behrê û ji tehtan,
Matilde, tu derbas bûyî ro li nîvro.

Kulîlkên hesinî hebûn li ser te,
kevzên ku bayê başûr wan dizêrîne û ji bîr dike,
radikirin firîkên xîzê, destên te,
ku hîn spî bûn, ji xwêya bi şewat terikî.

Hez dikim ji diyariyên te yên safî, ji gwînê te yê kevirê neleqî,
ji neynûkên te yên di tava tiliyan de pêşkêşkirî,
ji devê te yê bi kêfxweşiyê xerqbûyî,

bes, ji bo mala min î cîranê hendefê,
pergala stembar a bédengiyê bide min,
xêveta behrê ya di xîzê de jibîrbûyî.

XLV.

Rojekê tenê jî neçe ji ba min, lewra çawa,
çima, nizanim bêjim, dirêj e roj,
û ez ê li hêviya te bim weke li stesyonan
gava li deverinan radizên trê.

Saetekê jî neçe, lewra hingê
di wê saetê de dikevin tev dilopên bêxewiyê
û belkî hemû dûxana ku li malekê digere
were dilê min î wenda bikuje.

Ax ku reşûpêşa te neşikê di xîzê de,
ax ku bijangên te di nebûnê de nefirin:
deqeyekê jî neçe, delala min,

lewra tu yê ew qasî dûr çûbî wê deqeyê
ez ê rûerdê gav bikim, seranser û bipirsim
tu yê vegêrî yan min bidî destê mirinê.

XLVIII.

Du evîndarên şa tenê nanek dikan,
Dilopeke heyvê tenê li ser gihê,
Du siyên dimeşin dema digihên hev,
Rojeke tenê û vala di nav nivînekê de.

Ji hemû rastiyan ro hilbijartin:
ne bi benan lê bi bêhnên tîn bestin,
û ne aramiyê dipelişînin ne peyvan.
şadî barûyeke zebloq e.

Hewa û şerab ligel wan dimeşin,
şev pelên xwe yên gewz şabaşî wan dike,
mafê wan heye ji hemû qurnefîlan re.

Du evîndarên şa, ne dawî hene ne mirin
dibin û dimirin zaf caran li jîn
sermediya xwezayê heye wan.

Wergera ji spanyolî: Yunus EROGLU

Ciwanekî 70 salî: Herbijî

Munewer AZÎZOGLÛ

*"Sê bira sê heval sê şehîdên Kurdistan
mêrxasî li berxwedan van egîdên qehreman"*

Celal Ozkan, ango bi navê wî yê ku ji hêla hemû dost û dijminên wî ve tê zanîn, Heval Herbijî, wek dara çinarekê ku di nava têkoşîna azadiyê de ruh, şax, bejn û bal berdaye, bi pirtûka xwe ya bi navê "Sê bira, sê heval, sê şehîd" derket hemberî xwendevan û hezkiriyên xwe.

Pirtûkên bîranînê ji bo xwendekaran wek pirtûkên dî-roka nêz in. Mirov bi riya pirtûkên bîranînê bûyer û pêk-hatinên demê bi riya şahidiya nivîskar ji nêz ve dişopîne, ew bûyer bi ruh û can dibe, mirov di nava bîranînan de wek ke-seke/î şopger dimeşe, hestên nivîskar û kesên nav bûyerê dişopîne, bi wan re dikene, bi wan re aciz dibe, di-qehire, digirî. Ew bûyer bi saya nivîsandina bîranînan ji nav rûpelên sar ên dîrokê xwe xelas dîkin û germahiya xwe ya demê digîhînin roja me.

Dema min dest bi xwendina pirtûka Heval Herbijî kir, min nizanibû ku Heval Herbijî bi xwe dê pirtûka xwe ji min re bilêv bike û heta dawiyê heval-tiya xwendina min bike. Ji hevoka dest-pêkê heta ya dawiyê nivîskarê me çawa ku her tim bi nermahî û giranî gotinên xwe tene tene tîne ser ziman, pirtûk hemû ji min re xwend. Lewre dema ku min dixwest ez bi lez di ser hevokan de

qevaz bidim, wî destûr nedida min û rê li ber min digirt, me bi hev re wek darsa fe-qîyan hêdî hêdî di sa berdewamî xwendina pirtûka wî dikir.

Tim di sêrê min de pirseke mezin bû, ka gelo navê Herbijî çima û bi çi awayî bûye Herbijî. De ka were jê bipirse. Dê bê şik bigota min: "Bi sebir be, tu yê vê jî hîn bibî!" Lê de ka were vê bi bêaramiya min

bide fêmkirin. Pirtûk di destê min de, min zû bi zû pel zivirandin, da ku ez bersivê ji pîrsa xwe re bibînim. Lê her rûpelek bîranîneke balkêştir derdixe pê-şîya min, êdî ez dev ji bêaramiya xwe ya bê encam berdidim.

Em bi çîroka "Qirdê Şemo" dest bi xwendinê dîkin. Ez di ber xwe de dibê-jim "Ma mirov ew qas jî bê şans dibe?" Heval Herbijî bi rûyê xwe yê ku her tim bi ken e, li min dizivire, dibêje "Mirov dibêje qey tu ne ji vê dinyayê yî?" Serê min di ber min de, ez ne-wêrim bêjim,

"Ma Apê Herbijî tu ji

nahêlî ez di dilê xwe de gotinekê ji der-bas bikim." Em ji halê Şemo û ji qirdê wî derbas dibin tîr ser eşîra Beraziyan, ango eşîra Heval Herbijî. Ez niha jê re bêjim, "Mirov dizane tu ji eşîra dînan î", dê rojê sax dahûrandinê li ser min bike. Lewre ez dixwazim qala heybeta wî bikim, lê ji bo Heval Herbijî gotin ne tenê



yên bilêv dibin in. Nema ez ramanan di dilê xwe de derbas dikim.

Dor hêdî hêdî tê ser malbata nivîskarê me. Destpêkê hatina wî ya dinyayê. Wê demê ez têdighijim, ka çima pirtûk bi çîroka “Qirdê Şemo” dest pê dike. Dema em bûyerên wê demê qewimîne dixwînin, Heval Herbijî bi awayekî serbilind dibêje “Ma tenê dema pêxember tînin dinyayê tiştên derasayî diqewimin?” Ez bi şaşwazî lê dinihêrim, ji her rewşê derxistina wateyekê min matmayî dihêle. Dûre zewaca wî ya wek listoka zarokan; ez hîn wisa difikirîm, wî fikra min di qirika min de hişt: “Gelo zewaca dê û bavê te çawa bû?” Ez çi bêjim, tenê dikenim.

Her beş di pirtûkê de bi wêneyekî dest pê dike. Dema ez tîm beşa dayîka şehîdan bêhemdî disekinim û di bin bandora wêneyê dayîka Wezê de xwe winda dikim. Nikarim çavên xwe jê biniqînim û rûpelê bizivîrinim. Hema hewceyî tu gotinê nake, tenê li rûyê dayîka Wezê binihêrin û ji xwe re çîroka Kurdistanê bibînin; çîroka êş û elemê. Ez dinihêrim Apê Herbijî jî bêdeng bûye, êdî qet guh nade ramanên ku di hişê min de derbas dibin. Dixwazim xwe û wî jî vê xemgîniyê xelas bikim, dibêjim “Heval Herbijî te çend fikrên ku di dilê min de derbas bûn bê şîrove hiştin” Ji bilî awira “de berdewam ke, bixwîne” qet tiştêkî nabêje. Em tîm beşa şehîdan. Wêneyên ser berga pirtûkê li gor mezinahiya temenên wan, li gor dîroka tevlibûna wan a têkoşîna azadiyê rêz bûne. Ez difikirim dibêjim, “Gelo şehîd ji ber ku tevli refên şehîdan bûne ew qas xweşik xuya dikin an jixwe xweşik in?” Nivîskar dibêje “Ew tim wisa bedew bûn” Ji pîrsa xwe ya ne di cih de fedî dikim û beyî ku bidim fêmkirin geh li bavê şehîdan dinihêrim û geh jî li her sê şehîdan dinihêrim, dixwazim fêm bikim ka gelo dişibin bavê xwe yan na! Na, zêdetir dişibîyan dayîka xwe “Di çavên nivîskar de birîneke kûr, xemgîniya jiyanêke nîvcomayî dibînim. Wek keserekê li ser dil digere, di qirikê de asê dibe; “Xwezî rojên bi hev re derbasbûyî ew qas ne kêmbûna!”

Çawa ku têkoşînê li herêmê kulilk

daye, malbata Heval Herbijî bêhna azadiyê hildaye. Herbijî ew ro îro ye li ser şopa wê behnê, wê ronahiyê dimeşe. Zarokên Apê Herbijî di vî riyê de dibin “Sê-mûrg” Ev teşbih li xweşa nivîskar diçe da ku di hişê xwe de wek mîx asê bike dibêje “Te got çi? Ka dubare bike”

Almanya, welatê xerîbiyê. Xerîbiya sih û yek salî. Xerîbiya bêdawî. Wekî ku bixwazim destpêka sih û yek salî bibînim, dîr û dirêj dinihêrim. Nabînim. Ev demeke çawa ye, wisa tim bi xerîbî derbas bûye. “Ne ku xerîbî ye. Divê tu baş şîrove bikî. Cihê ku xebat lê tê meşandin ne xerîbî ye, pêdivî ye!” Di nav van salan de hema bêje hemû kurdên nas û nenas, bi kêr û bê kêr, zana û nezan nas kiriye. Jixwe ne hewce ye qala ger û xebatên wî bikim. “Lê tu yê min bi çi bidî nasandin?” Nizanim çima ji nişka ve Matrîks dikeve bîra min. Dipîrsim, dibêjim “Apê Herbijî tu Matrîks nas dikî?” Bi awireke tûj li min dinihêre. “Nebî tu min dişibîni wî zilamê ku ji erdê bilind dibe?” De ka were vebêje, ev şibandin ji ku tê!

Pirtûka “Sê bira, sê heval, sê şehîd” him pirtûkeke bîranînê ya Apê Herbijî ye, him jî wek dîrokeke têkoşîna sih salî ku xwe him li bakur, him başûr û him jî Ewropayê dişopîne. Gera me ya di nav rêzîkên pirtûkê de êdî bi dawî dibe. Hîn jî pîrs di serê min de diçin û tînin. Heval Herbijî ji pîrsên nû hez dike. Ev nişana merrîyê zana ye. “Tu qet nekeve mitalan, ev evdê ku devê deriyê dibistanê nedîtîye du pirtûk nivîsandîye, dê hîn gelek pirtûkan binivîse.” Ez bi tuwanc dibêjim, “Herbijî û bi kurdî bijî, neçe qursa zimanê biyanî û nebe sedema jiyana xelqê!” Apê Herbijî bi acizbûnekê dibêje “De li vî gotinê binihêre. Ka Xwedê bizanibe, xwendekarên vî nivîsê dê ji vî hevoka te çî derxin! Ger pirtûka te xwendibin dê gelek tiştan derxin, ger nexwendibin dê biçin bixwînin.”

Pirtûk:
Celal Ozkan (Herbijî)
“Sê bira sê heval sê şehîd”
Weşanên Mezopotamyayê Neuss,
Almanya Gulan 2010

Xelata te

Gava ku evîn mir
Di dilekî xeniqî
Û giyanê xwekuştî de
Hezkirina yekalî çî xêra xwe heye?
Bêgew

Stêwr û sar e
Mîna payîza paşîn
Reng beqem
Berhem nade

Ez vikîvala dimam
Di nav kirasê tenêtiya xwe de
Bi dilekî şilftazî

Xeyalan jî koç dikir
Ji xeyalgeh û şûnwarên xewnên min
Wekî pilte ewrên derbiharan

Mewcên bêhêvîtiyê
Ez didam ber şetên xwe
Di guhê bajarekî evînêqexekirî de
Tenê û tikûtenê dimam
Li ser devê rîyeke bêveger
Xemgîn û stûxwar

Di şibakeya dilê te de lê dimeyzand
Kêliya ku evîn tê de hatiye gulebarankirin
Çawa posîde dibû?
Ji wê kiryara diltezîn

Gelo ma wê xêra xwe hebe?
Posîdebûna dawîn?
Piştî xwînê bû birîn
Hemû pêwendî hatin birîn
Bazinên dilan veqetîn
Nivîştên dilsoziyê şewitîn
Û kêr giha hestî
Veqetîn bû jana dûrketinê
Di malzaroka cihêtiyê de fetisî evîn
Ber avêt di dilê min de
Sikîsar bû û temirî hêviya evînê
Di nav ariyên dilsariyê de
Li perê wî bajarê ku ewil jinaniya xwe
Dûre jî jinên xwe kuştî
Û rista xewnên min lê bizdiyayî
Tama mirinê
Li pey xwe hêlandî
Wekî diyarî

Serhad KANEMIRÎ

Bendîxane

Sibehên vir tehl in
Xemsar û spîsar
Di tehma mirinê de
Li vir berbang virnî hiltê
Bi awayekî beravêtî
Dîlgirtî
Bergehteng
Û bi çar gavan in pêgermokên
xwe
Bi demjimêran sînorkirî ne,
kêliyên xwe
Bi daketina gewrika êvarê re
Jiyan jî ditevize
Xewar û xilmaş difetise di çala

çardîwarî de
Tê guvaştin bi derî û caxên
hesinî
Bi çar aliyan ve
Xeyalgeheke xeyalkuj e girtîgeh
Bê berbang û bê liv û bê bizav e
Bê dem û navroj
Aşê hêrandina mirovan e
Temen diherişe
Di bergeha demê de
Xewn di derzên çavên te de tîn
xesandin
Bi tevnepirikan tê ristin rûyê wan
Di qonaxên jibîrkirinê de girtî

xîmê li ser cemedê ye
Xeyalrêstina êvariyan
Heta berbanga li te hiltê
Di paxila şevê de
Jiyan di qeydan de dirize
Tu û vîna xwe
Tikûtenê ne
Şilftazî û uryan
Her dem di xewê de mewiciye
bendîxane
Reşûtarî
Bê hetav

Rohat Xemgîn GEVERÎ

Rûdekî û hêza helbestê

Cewad PALE

Farisî xwediye paşerojeke nêzî 2500 salî ye. Eger mirov li dîroknasên yewnan û li kitêba pîroz a zerduştiyan binihêre, li Îranê di dewra Akamenîtan de li gor wê demê wêjeyek hebû. Ji vê dema 2500 salî heta îro gelek helbestvanên bi nav û deng derketine. Rûdekî, Dakîkî, Nizamî, Ettar, Fîrdewsî, Baba Tahir, Hafîz, Camî, Enwerî, Sadî, Mewlana, Heyyam, Nîma Yûşic, Perwîn, Îrec Mîrza, Îşkî û hwd.

Li gor otorîteyên wêjenasên Îranê di dîroka wêjeya Îranê ya berî îslamê de, navê destpêka wêjeya Îranê Rûdekî ye û wêjeya Îranê bi Rûdekî dest pê kiriye. Helbestvanên ku piştî Rûdekî nivîsandine, ew bi navê “Ustadê Siltan ê Şuarayê” (mamos-teyê şewirmend ê siltan), hosteyên helbestvanan bi nav kirine. Rûdekî di wêjeya Îranê de yekemîn amadekarê diwanê ye. Bi awayên qesîde, xezel, kıta, rûbaî û mesnewî helbest nivîsiye. Berhema wî ya herî girîng menzûma “Kelîle û Dînme” ye. Arayîsûn-Nefayîs û Dovran-î Afîtab mesnewiyên wî yen din in. Li gor hin çavkaniyan Rûdekî milyonek û sê sed hezar helbest nivîsandîye, li gor hin çavkaniyên din jî 700 hezar helbest nivîsiye.

Ebu Ebdullah Bîn Muhammed, Rûdekî li Semerkandê li bajarokê Rûdekê hatiye dinê. Ber bi dawîya jiyana xwe kor bûye. Dengê wî gelek xweş bû. Helbestên xwe li ber barbûtê* digot. Hin kes dibêjin ku navê xwe ji wir stendiye. Helbestên wî xwerû û narîn bûn. Bi helbestên ku li ber dengê barbûtê digot qesra Samaniyan şên dikir. Rûdekî helbestvanê qesra Nasr Bîn Ehmed bû.

Di dema Şah Nasr Bîn Ehmed Samanî de, şah dest bi seferekê dike û di vê seferê de şah nafikire ku vegere Buharayê. Şeni-yên qesrê û leşker bêriya xaka xwe, malbata û nasên xwe dikin û dixwazin vegerin Buharayê, lê newêrin vê daxwazê

ji şah re bibêjin û dixwazin helbestvanê mezin, bi nav û deng Rûdekî ji bo vê pirs-girêkê alikariyê bide wan. Rûdekî jî sibehekê radihêje barbûta xwe derdikeve pêş şah û vê helbestê dixwîne:

رای دای کمره دای نای لوم یوج یوب
کمره دای نابره یوم
مریای ریز وای اه بکش ر د ووما کیر
کمره دای نای نرب
ات ارام کنج یروانه چ همره اب نوحیج ب
کمره دای نایم
هاش کز داش و شاپ داش اراخ بای
کمره دای نامره یوم تیروسز
کوس هام نامرسا اراخ ب و تس هام هاش
کمره دای نامرسا
تسورس هاشامره دای ناتسوب کوسورس
ناتسوب اراخ ب و **

Bêhna çemê Muliyan tē
bîranînên yara hezkirî tē
bi hişkbûna xwe, qûmên çemê Ceyhûnê

li bin piyên te mîna qumaşê
perniyan*** tē
ava çemê Ceyhûnê delodîn e
heta pişt a hespên me tē

ey Buhara tu şad be û her bijî
şahê me bo te mêvan tē
şah heyva bihara asîman e
heyv li asîman tē
mîr serviyek e, Buhara bostan e
servî jî li bostan tē

Ev helbest bandoreke pir mezin li ser şah dike û şah bi carekê re ber bi Buharayê ve bi rê dikeve û vedigere Buharayê.

Di kalbûna xwe de ciwaniya xwe, rojên xweş û şohreta xwe bi bîr xistiye û ev helbest nivîsiye;

“Diranên min ên wekî qendîlê, riziyan

û weşîyan. Ew diran bi ava zîv biriqîbûn, spî bûn, ewincî û mircan bûn, wek stêrka sîbehê û libên baranê bûn. Dilê min wek xezîneyekê bi inciyan tije bû, xezîneya gotinan, nîşaneyên nivîsên min, hez û hezkirin, serpûşa wê, helbest bû. Her tim kêfxweş bûm, nizanibûm xemgînî çî ye. Dilê min çavkaniya kêf û kamiraniyê bû. Gelek dilên wek kevir û sindan, min wek hevrişim nerm kirin. Çavên min her tim ber bi zîlfên bêhnxweş, guhên min li ser zanyaran bûn. Jin, zarok û zehmetiyeke min tune bû, dile min ji her awayî ve rihet bû. Ey rûheyv! Te Rûdekî niha nas kir, wan deman ne wek niha tu dibînî, bû. Te ew dem nedît, nas nekir wexta derdiket mêrgan wek bilbilan disitra. Niha rojên ku dostê kesên efendî, nas û dostê began bû, derbas bûn. Yên din bi wesiyeta xelkê bûn xwediyê qencyê, ew jî bi wesiyeta Samaniyan bû xwediyê şohretê û qencyê. Niha dem jî guherî ez jî. Gopalekî bine edî dema gopal û hebanê hat.

Helbest û berhemên wî ji aliyê Saîd Nefîsî ve hatine komkirin û çapkirin. Ev berhem sê berg e. Seîd Nefîsî di berga yekemîn de piştî ku behsa çavkaniyên ku ji wan sûd girtiye dike, behsa xwezaya ku

Rûdekî lê jiyaye dike. Di dema Samaniyan de behsa dîrok, erdnîgarî û rewşa civakî ya Semerkand û Buharayê dike.

Di berga duyemîn de behsa mexlesa wî, kesên ku pesnê wan daye, helbestvanên dema wî, tarza helbestên wî û helbestên ku li ser wî, ji bo wî hatine nivîsandin, dike.

Di berga sêyemîn de jî kesayetiya wî ya edebî û helbestên wî hene.


*Barbût: Enstrumaneke muzîkê ye, bê perde ye û ji deh têlan pêk tê.

** Nafîsî Said, Ahval ve Asar-i Rûdakî Samarkandî, Tahrân, 1319, r 1029

***Pernîyan: Li Îranê qumaşekê pir bi qedr e.

Çavkanî

- 1- Ahad EMÎRÇUPANÎ, *Nûsha, Şarkiyat Araştırmaları Dergisi, sal 3 hejmar 11, payîz 2003, r 115*
- 2- Dr. Zebîhullâh SAFÂ, *Îran Edebiyatı Tarihi, Berg 1, Enqere, Temmuz 2002, r 81*
- 3- *Îran Edebiyatında İlk Farsça Şiir Söyleyenler, Doç. Dr. Hamide DEMİREL, Doğu Dilleri Dergisi r 129*
- 4- İsmet Zeki EYUBOĞLU, *Îran Edebiyatı, İlon 2007, r 24*



Pemboya perî, pisîka mala me ye

DIYAKO

Hewa kelegerm e, qirçe qirça erd û esmanan, serê keçelan dişewitîne, di nav vê germê da zewiyên geniman têr roj xwaribûn. Ji dûr ve zeratiya geniman mîna keziyên taze bûkan ku bi ser milên xwe ve berdane tên xuyakirin û paleyên nav zewiyan bi destên xwe mîna bûkên bextreş keziyên xwe bi ser payîzê de gurz bi gurz dibarînin. Erê havîn e em li gundê Elegezê ne, li mala Apê Domo ne, navê kevaniya malê Xanim e, Apê Xêro jî bavê Apê Domo ye, navê pisîka wan jî ji ber ku gelekî reş e, dibêjin Morîka Reş, wextê tu diçî cem Morîka Reş xwe bi binê piyê te ve disû. Çi kes jî nabêje Morîka Reş, ciyê Morîka Reş, pisîka malê ser sandoqê ye. Apê Xêro her tim dibêje pisîk meçêtir in, ew bereketa mala me ye, kesekî ku li Morîka Reş bixe bila bizanibe ku li min xistiye. Apê Domo mîna tevî gundiyan genimê xwe dirûtiye û xwer kiriye tiji telisan kiriye. Sibê zû dixwaze genimê xwe bide aş, genimê xwe bihêre û bike ard. Apê Domo sibê zû rabû genimê xwe danî ser piştê guhdirêjekê, çû aş, wextê gihîşt aş dît tevahiya gundiya genimê xwe inandine aş û heta şevê dor negihîşt wî, dema dora wî hat aşvan gotê: “Apê Domo ez gelekî westiyame, dora genimê me ma sibê, tu dikarî genimê xwe bibî gundî, sibê zû bêtî, ez ê genimê te li aşî bidim.” Apê Domo gote aşvanî “Rêka min gelekî dûr e, ez nikarim genimê xwe dîsa bibim gund, ez ê îşev li aş razêm, heta sibê tu bêtî genimê min li aşî bide. Aşvan gotê “Baş e tu îşev dikarî di aşî de razê, ez diçim. Apê Domo genimê xwe danî aş, gelek westiyayîbû her serê xwe da, ket xewê. Wisa ket xewekê ku te digot qey sed sal e razaye, car caran bayekî hênîk dihat û li pencereya aşî dixist û diçû. Di nîve şevê de dengê gurmegurmê, guregurê êdî Apê Domo hişyar kir, bi tirsê çavê xwe wekir dît di aşî de govend û dawet e, bûkê

derdixin. Apê Domo dît tevahiya pisîkên gundên wan jî xir bûne. Dawet daweta pisîkan e, di nav wan pisîkan de pisîkek jî serçopiya govendê dike, şînî û fistanê jina wî Xanimê di ber wê de ye. Hemû pisîk bi dengê bilind dibêjin “Pembo govendê bişkîne” Carcaran Pembo dibêje: “Ev Apê Domo ye, mirovê min e, ez di mala wan de dimînim. Kesekî tiştêkî jê re nebêje, ev mirovê min e. Apê Domo dît û fêhm kir ku ew pisîka ku jê re dibêjin Pembo pisîka mala wan, Morîka Reş e. Qiseya bavê wî Apê Xêro ket bîra wî ku digot “Çi nebêjin Morîka Reş, pisîk meçêtir in.” Ji tirsan dengê xwe nekir, berê xwe dida wan hetanî berê sibê, govend û şahî bû, Pembo ligel pisîkên gund mal bi mal digeriyan, ji her malê fistan û xavik tîrandin û berdikirin, nan û birinc û rûn dîrandin. Bi dengê aşvan Pembo û dawet li ber çavê Apê Domo winda bû. Aşvan hat genimê Apê Domo li aşî da. Apê Domo ardê xwe rakir kete rê. Apê Domo çû malê, bavê wî Apê Xêro gotê “Kurê min Domo! Tu ji bo çi şevê din nehati?” Apê Domo gotê “Bavo tu nizanî çi hat serê min, Apê Domo dît Morîka Reş pisîka malê li ser sandoqê razaye. Çû pêş got pisîkê “Pembo te şevê din dawet dikir, Pembo pisîka malê kir gurîn, pençek li nav çavê Apê Domo da, ji ser sandoqê rabû, xwe bi lez li derî da çû. Apê Domo tevahiya tiştên ku dîtibû û bihîstibû ji bavê xwe, Apê Xêro re got. Apê Xêro gotê “Kurê min te sira pisîka mala me Pembo aşkera kir, te gerek sira pisîka mala me aşkera nekira, bi çûyîna Pembo re dê bereketa mala me jî biçê.” Apê Domo gund bi gund, mal bi mal li dû Pembo geriya, lê Pembo bibû pariyek nan û xuya nekir. Piştî çûyîna Pembo, mala Apê Domo roj bi roj paş de diçû, tenê tiştê ku ji bo wan mabû, gayek bû û ew ga jî her çend dixwar şev bi şev jar dibû.

Xanima jina Apê Domo gotê “Domo

gayê me şev bi şev jartir dibe, tenê hes-tîkê wî xuya dike, tu dizanî sebeb çi ye?” Apê Domo şevê xwe kir pagê, heta derengî nobedarî kir, çi tişt nedît, ji nişka ve di nîveka şevê de periyê bejnî bilind, di stûyê wê de morîkên şîn, deriyê pagê vekir û hat xwe avêt ser piştê ga, morîka xwe ya şîn avêt nîveka pagê, pag dibû deşteke vekirî, perî heta berê sibê ev gav dibezand, gav hew qas dibezand ku êdî nedikaribû li ser piyê xwe raweste. piştî wê perî dihat morîka xwe ji erdê radikir, dikir stûyê xwe. Pag diha dihat ser şiklê ewil. Perî piştî wê diçe ser kaniya pişt malê xwe li avê dida û diçe. Apê Domo çi dîtibû ji bavê xwe Xêro re got, bavê wî gotê “Ew perî Pembo ye, tu gerek Pemboya perî bigirî û bînî malê.” Apê Domo gotê “Ez ê çawa Pemboya perî bigirim?” Apê Xêro gotê “Bi sincaq û derziyan. Apê Domo ligel jina xwe Xanimê mal bi mal geriyan, çend sincaq û derzî ji nav gund berhev kirin, Apê Domo dîsa şevê di pagê de xwe veşart. Pemboya perî mîna her şevê heta sibê ga bezand, çû qiraxa çem cilkên xwe ji xwe kir û ket nav avê. Apê Domo ligel jina xwe Xanimê çû tevahiya cilkên Pemboya perî derzî û sincaq kir. Pemboya perî piştî xwe li avê da û hat cilkên xwe ber kir, çendî kir nekir, nekaribû bifiriya. Erê sincaq û derziyan tilisma Pemboya perî betal kiribûn. Apê Domo hat Pemboya perî ligel xwe bir. Pemboya perî bû xizmetkara mala Apê Domo. Pemboya perî dema ard hevîr dikir bi girikekê nanê sed gundî dipeht.

Dema diçû qirşîk xirkinê tene destek qirşîk ligel xwe dîna, wextê qirşîk didanî erdê dibû deşteke qirşîk. Dîsa bereketê riya xwe xist ser mala Apê Domo. Sal diçûn Pemboya perî di mala Apê Domo de bû.

Payîz bi dengên qijalîkan bû mêvan û silesil çû. Zivistan kinekin, bi tund û tûjiyê bû mêvan û çû.

Bihar mêvanê dilxwestî ye, deriyê mala Apê Domo qahîm kuta. Pemboya perî got Xanimê “Îro roja tazebûkan e, roja qîz û kuran e, ez jî dixwazim biçim bila bextê min jî vebe, belku dilê lawan bikeve min, belku yekî jî xavika serê min revand.

Xanimê got “Pemboya perî tu dikarî herî, beriya ku Apê Domo bê, were. Pemboya perî jî Xwedêxwastî ligel qîzan û nûbûkan ket rê, çû. Pemboya perî çendî diçû hêdî hêdî ji komê xwe bi dûr dixist, gav bi gav xwe gihand koma zarokan, gote zarokan “Ez nizamim ev sincaq û derzî yên çi ne, gelî zarokan hûn ê bişên wana ji nav cilikên min derxin, ez nikarim.” Pemboya perî baş dizanibû derxistina sincaq û derziyan ji cilikên wê, dikaribû tilisma Apê Domo bişikîne û rizgar bibe, lê belê bi xwe nedikarî. Zarokan sincaq û derzî ji cilikên Pemboya perî derxistin û Pembo azad bû, hate ser kulega mala Apê Domo. Pemboya perî gazî Apê Domo kir, bi dengê bilind got “Apê Domo ez azad bûme, ez dikarim bifirim biçim, pêş ku ez biçim min daxwaziyek ji te heye.” Apê Domo gotê bibêje Pemboya perî gotê “Ez morîka xwe ji te dixwazim.” Apê Domo gotê “Pembo ka were êre (vir) mala te ye tu dixwazî bi ku de biçî?” Pemboya perî gotê “Zarokên min çav li rêya min in, çend sal e ez bûme xedama mala te, ka morîkên min bide. Pemboya perî çendî porê serê xwe verot, çendî giriya û kaliya, Apê Domo morîkên wê nedayê. Pemboya perî got Apê Domo “Ez ê biçim lê ez ê nifirekê li te bikim, hindî ku tu hebî çi car ji bîra te neçe. Yek, hemû gavan li ser te û mala te û heft piştên te toz bibare. Dudu, nîmeta Xwedê bi ser te de bibare lê belê kevçî di mala te de peyda nebe ku pê bixwî. Sisê, êdî ez piştî te xwe nîşanî zarokên te û heft piştên te nadim. Pemboya perî çû, nifirên wê yek bi yek bi cî hatin.

Bi rastî di mala we de pisîk heye? Pisîka mala we jî dikare Pembo be?

Laçika dapîra Naz

Fesîh ERDEMÎRCÎ

Bayê pašnîvroyê behna çiyayan li ser konê êlê gerand. Kelekela germa nîvrojê cihê xwe da hênîkbûna esrê. Bêrîvanan wek refê teyran qor bi qor xwe ji ber bi-hura çiyê berdan nav êlê, hênîkbûna zozanan di dilê hemûyan de xwe nîşan da. Di ruhê wan de heyecaneke zirav wek taka rihanê dihejiya. Şahî û çoşa rojê jî heyecaneke mezin di nav êlê de digerland. Wê rojê du eşîr di êla wan de kom bûbûn. Wê nanê aştiyê bihata xwarin, dûre jî dê şahiyê dest pê bikira. Wê cirîdvanan hespên xwe yên kihêl bi rex û zîn bikirina ku hemû hunerên xwe bidana nîşandan. Keçên xemilandî ji çiyê ve, ji ber konên reş wê li wan temaşe bikirina. Hênîkbûna zozanan wê di dilê xortên ciwan û keçên ezeb de evîneke wek a Mem û Zînê bida geşkirin.

Wê rojê hemû xeman şûna xwe dabûn xeyalên eşqê. Wê dengbêjan bi şewqa Feqiyê Teyran awazên eşqê bilorindina. Bi dengê defa derwêşan re bi qebeqeba bilbilan re eşq bihata ziman û wê piştire dengbêjan kilamên govendê bigotina; keç, xort, jin, mêr, zarok, mezin hemû di govendê de bihejindina.

Wê rojê, du eşîr li êla wan kom bûbûn. Piştî ew qas salên bi xêr, bi binaxkirina ew qas egîdan wê aşti çêbibûya. Tîrsa mirinê, dê cihê xwe bida şahiya jiyanê, wê wek guloka berfa spî êşa di dilê wan de hênîk bikira. Eşîrên derdorê hemû kom bûbûn di wê roja bi xêr de.

Li konê Sebrî Axa şênahî hebû, ji hêlekê ve di sîtilên çarçembil de goştê berxan dikeliya. Ji hêleke din ve savar amade dibû, goştê berxan ê biraştî li ser sêniya bi savar li meydana êlê dihat danîn.

Konê Sebrî Axa li ser bîst û çar stûnan bû. Her stûnek bi deh werîsan hatibû girêdan. Xalî û xaliçeyên rengîn ên ku bi eşqa keçikên bedew hatibûn xemilandin,

raxistibûn. Li ser xaliçeyan balgî, doşek û mînderên ji hiriya mihan hatibûn danîn. Giregirên eşîran li ser wan mînderan rûniştibûn û di qelûnên wan de titûna Mûşê ya zer dihat kişandin. Li ser destên qîzên ezeb şingêşinga fincanên qehweyê bûn, di nav kon de digeriyan. Lê wê rojê tiştê ku bala her kesî dikişand, laçika bi kesk û sor û zer hatiye xemilandin li derê kon hatibû dardakirin. Sembola aştiyê laçika xemilandî bû. Temeziya heftreng dora laçika aştiyê dixemiland. Bayê êvarê hêdî hêdî temorî li dor laçikê dihejand.

Laçika aştiyê, ya dapîra Naz bû. Dapîra naz dayîka Sebrî Axa bû. Mezinahiya eşîrê piştî kuştina bavê Sebrî Axa, li ser milê dayîka Naz mabû. Laçika wê, wê rojê bûbû sembola aştiyê, di navbera her du eşîrên da şer bi dawî kiribû. Di nav germahiya şer de dapîra Naz laçik ji serê xwe danîbû û avêtibû navbera her du eşîran. Dengê tivingan hatibûn birin û aştiya îro, piştî vê yekê hatibû pêkanîn. Çend xortên ciwan ketin singê erdê. Çend dayîkan li çongê xwe xistin, porê xwe rûçikandin. Çend evîn di axa sar de bi dawî bûbûn. Çend keçan xêliya sor ji serê xwe danîn û reş girêdan. Hesreta çend bûkên desthinekîrî di gewriya wan de ma û destên wan berhevkîrî ma.


Cirîdvanan hespên kihêl rawestandin. Di navbera keç û xortan de evîneke nû şîn bû. Di dilan de tove eşqê aj da. Nanê li ser sifreya dewlemend hat xwarin. Wê rojê feqîr, zarok, rêwiyan kêfxweşiya têrbûnê kirin. Di pey nan re mezinên eşîran bi ava di misînê zêrîn de hatibû amadekirin, destên xwe şûştin. Dor hat kurê Sebrî Axa. Bejna kurê Sebrî Axa dirêj wekî şitlekê bû. Dest û piyên wî qelew û gelek xurt bû. Bi gavên xurt çû derê kon û destê xwe şûşt. Çawa vegeriya cihê xwe, pîrekeke ku bi devê xwe nikare got "Haha ez bi qurbana dest û milan

bim. Mêr divê wekî wî mêrxas, qelew, bi xof û dirêj be. Ez bi qurbana wê bejn û balê.”

Vê gotinê wek telteyekî cemedê bayekî sar di nav kon de belav kir. Kesên ji eşîra hember serê xwe xwar kirin û bê deng man. Ev gotin ji bo mezinê eşîra wan kêmasî bû. Kurê mezinê eşîra wan bi dest û pê bû. Navmîla wî fireh bû lê ew bi xwe kurt bû. Mayîna di binê gotina vê pîrekê de bêşerefî bû. Bêdengî berê mîna bahoze li êlê geriya. Tayê simbêlan ketin nav diranan û dil wek agir şewiti. Bala her kesî vegeyîya ser kurê mezinê eşîra hember. Kurê mezinê eşîra hember hêdîka ji cihê xwe rabû, paçê mîntanê xwe ji ser zendên xwe da jor û çû dest û rûyê xwe şûşt. Dûre vegeyîya nav kon, li ber stûn sekinî û çavê xwe li ser tevan gerand. Serê xwe rakir û got “Berî du salan di navbera me û Heyderan de şer qewimî. Kozîka min û kozîka Keremê Heyderan li hemberî hev bûn. Me gelekî bera hev dan. Min mêze kir feyde nîn e, ne ez zora wî dibim ne jî

ew, min hêdîka kumê xwe ji serê xwe danî û hêdîka da ser kevirê pêş kozîka xwe. Kerem nîşan girt û derba xwe avêt, li kumê min xist û kumê min ji ser kevir de anî xwarê. Gava ku dît ez ketim, hema bi nava tivinga xwe girt û êrîş anî ser kozîka min. Bejna wî dirêj bû, bi dest û mil bû, êrîşa wî jî bi heybet bû. Nêzikî li kozîka min kir û bê xem dihat ser min. Ez hêdîka rabûm û min tivinga xwe teqand. Derba min li nav eniya wî ket û serê wî pelixand. Keremê bejndirêj can da. Belê Kerem jî bejndirêj û wek şitlekê bû, bi dest û mil bû, qelew bû lê qisûreke wî hebû. Ker bû. Bila mirov bê dest û pê be, lê ne ker be.

Di dilê wan de mêraniyê tovê xwe rêt erdê. Eşîran tovê dijminatîyeke demdirêj wiha şîn kirin. Bi kîn û qehreke mezin êl terikandin. Laçîka dapîra Naz bê xwedî ma li derê konê Sebrî Axa. Evîna keç û xortan di dilê wan de reş girêda. Hesreta dilan a ku wek deryayê pêl dabû, bê hêvî ma.



Ezmûn

Helbesteke helez
a ku ji hestên melez barkirî
hêdî hêdî hildikişê
bi zozanê heza pevreyî ve
zêde ne zîrek e heramê;

geh ji girikê gefa gerdîşan digindire
geh jî li qamîşê gor û gelaşdankan...

eyloyên termxur pîkê li hewa
dûranga duriyanê dûredest e hîn jî
û di fesla felqên firfat de
mafiş dibe her tişt
baş e ku tune dibe
wê extirmeya ezmûngelhên ekolojiyê
dewlemendtir jî bibe

Azadî

Bi dildara xwe re
Bûjenên azîneya derbasdar dikişînim
Ji kelhoka mirovxwerên herdem
“bi eyarê şêr û li ser piştê şêr”
sozbariya lûxatê tacegulan
hêj nesekiniye li bazarê
pûş bi hesinê jovaniyan nayê kirin
û her kes pirsê “malê qaçax” dike
em berê xwe didin
kewiya kevneşopiyên kevnesal
rizgar dibin ji xapandinên
her meh û her sal...

Zekî KAYAR

Bêhna eydê

Ev bêhn
Ev bêhna eydê ye
Şekir û sêvik
Goşt û birinc
Ev bêhna zarokên
eydê ye
Destê wan bi demûş
Mal xilas bûn, êvarî
Ji bo nelewîtê
cizmeyên nû
Nerm pê li erdê dike, yek
Keçikekê, kirasxêftanekî sor
li xwe kirye
-Bavê wê ji Binxetê aniye-
Bi firê dimeşe
Pê li hêkê bike, naşikêne
Bêhna “Revîdor”ê difûrê ji

xortan
Keziyên keçikan
diherike ser milan
Apê Hecî
Îro şahîktir kiriye riha xwe
Du qat misk lê daye
Jinan ji bîr neke Serfiraz
Wan jî xwe tiftifandine
Ê îro eyd e
Dest hene bo maçîkirinê
Xîsm û nas, dost û heval
Roj hene bo dîtinê
Gelek caran êş û
keder jî be
Jiyan heye bo jiyînê

Mesûd SERFIRAZ

Sepetek hîv û nesrîn

Hoşeng OSÊ

Qereçî me
ji ferhengên Xwedawendan, te berhev dikim
Bi tewaşa heft ga û heft beranan, bi nivîşka heft hezar demsalên
Sêv û bihokan, bi tiraşa bêrikirinê, laşê te mist didim
Di "Leylet-ul Qedrê" de, te dikim beyara gîsinê xwe
Dibim dûkela helbestekê
Tu dibî dastana "Cebrayîlê Emîn"
Bi zixt û pêlan, te ber bi rojê ve, difirînim
Tu jî, kêlên gorên min ên winda dihijmêrî

Qereçî me... Û evîndar im jî
Li min negire, eger te memikên xwe di sepeta min de dîtin!
Deryayeke bêrikirinê, min dibe. Deryayeke sawêran, min tîne
Tu dibê qey neviyê leylanê me!?
Tu dibê qey tu nesrîna li ber bêhna Xwedê yî!
Wa! Şahinga binefs û laleyan
Ka geşt a min, dewraneke maç û gerdûnek hembêzkerin, bide min
Qereçî me, evîndar im û bêrikirin min dide ber lehiya xencer,
das û balteyan.

Nayê bîra min, tu jî bîra min çûyî!
Tê bîra min, ez hebûm!
Tê bîra min, ez tune bûm!
Tê bîra min, berî banga nimêja şeveqê, li ber bedena Amedê, te ez kuştim
Dinaliyam tu dikeniyayî!
Tê bîra te, evîn û gumanên te, dîkirin te bixwin
Tê bîra min, ez qereçî bûm
Derbider, dilbijok û çavlider bûm
Stranên çiyayî, welatê min bûn
Dilê min mêrga xezalan
Helbest nanê min bû
Reva li pey xewn û gulan, ava min bû
Peyv, dostê min, xew neyarê min bû
Ma nayê bîra te, çawa te ez talan kirim
Wêran kirim û ji nû ve vejandim û şên kirim
Baş tê bîra min, çawa te xwe kir bîr û min xwe di te de werkir

Tê bîra min, hîna qereçî me
Tu jî, tûrikê parsê, sepet û gîtara min î

Jiyana nîvco

Osman KAPAN

Bayekî hênîk ji başûr ve hêdî hêdî ber bi bakur ve dihat. Ev bayê ku wisa dihat ji germahiyê re wek derman bû. Ji vî bayî re digotin bayê benderan. Dema ku ev ba dihat, mirovên li ser benderan radihiştin melhebên xwe û dest bi dêranê dikirin. Piranî danê êvarê ev ba dihat. Him dinya hênîk dikir û him jî erd. Ji ber wê di vê dema rojê de miletê dehlên xwe jî av didan. Dema av digihîşt nav dehlan bacan, îsot, xiyar û hwd. pelên wan bi carekê te digot qey te bi dest vekirine, wisa geş dibûn. Bi hêza wê geşbûnê roja din bê hed û hesab ber didan.

Xezalê kirasê xwe ji xwe kir, tûman bi ser xwe de anî û binkiraskê xwe jî xist bin tûman. Milên wê rût man. Jixwe çiqas avdaniya dehlê dikir, xwe wisa dipêça. Ji ber ku di dehlê wan de sêv, xox, mişmiş û hwd. hebûn, ev dar jê re dibûn star û ji derve ve tu kesî Xezal nedidît. Hêdî hêdî pêşiya cihokên avê yên ku tê ser mişaran vekir. Bi herikîna avê re erdê av dikişand nava xwe, heta têr venexwara bernedida. Ji ber wê avê hêdî hêdî xwe berdida xwarê. Bi qasî du saetan avdanê domand. Xezalê ji mişarekê av berdida ser a din. Ew jî karekî zor bû. Helbet wisa lê hatibû ku êdî nikaribû gavê biavêje. Ev qasî westiyabû. Pala xwe da qurmê dara mişmiş û berê xwe da bayê hênîk.

Çiqas roj ber bi êvarê ve diçû, ba ew çend pirtir û hêniktir dibû. Bayê li porê Xezalê dida, porê zer libo libo ber bi bayê hênîk diket. Pêşiyê xwêdana nav porê wê ziwa bû paşê jî binçeng û laşê wê. Bayê wekî destekî nav singê wê miz dida. Elî hat bira wê. Dest avêt pêsîrên xwe miz da û gotinên “Ji te pê ve nahêlim kes van pêsîran miz bide û ji te pê ve nahêlim lêvên kesî bigihîjin ber û bedena min” Ji nav lêvên wê yên wek du felqên sêveke sor filitin.

Ji zaroktiya xwe heta niha bavê wê tim jî wê re gotibû “Tu bûka mala apê xwe yî”

Apê wê, jinapa wê û kurapê wê hemûyan bi wî çavî lê dinihêrî. Car caran kurapê wê gotin di ber re diavêt, dixwest bibêje ku “Tu destgirtiya min î.” Lê Xezalê guhê xwe nedidayê. Her tim jî ji hemûyan re digot “Ez bimirim jî wî nakim.” Dema ku ew û dayîka xwe bi tenê diman digot “Dayê ez ê Zirto Axa bikim? Dema ez wî dibînim tevzînek bi laşê min ve tê, jê nefret dikim.” Dayîka wê digot “Keça min ma ez çî bikim, zilaman wisa gotiye, ez nikarim tiştêkî bikim. Qedera me ev e.” Ji bêmecalî hêsirên çavên Xezal û dayîka wê diherikîn. Xezal di nav xeyalan de bû, “Heke min bidinê” di serê wê de wek pêlên avê li hev diqelibîn. Ji çavên wê du dilop hêsir niqutîn, hêdî hêdî bi ser lêvên wê de herikîn. Wek ji xewê şiyar bibe, ji xeyalan şiyar bû. Dem piçekî dereng ketibû. Dest û rû û lingên xwe şûşt, tûman ji xwe kir, kiras bi ser bejn û bala xwe de berda û bi lez vegeriya malê.

Bi lez dimeşiya û li hawirdora xwe jî dinihêrî. Ji bo ku Elî bibîne û randevûyê bidê. Her şev ku reş diket erdê û her kesî şîva xwe dixwar, Elî diçû ser banê wan, sê caran lingên xwe li ban dida. Piştî nîv saetê Xezal ji malê derdiket. Di binê mala Xezalê de kadînek hebû. Li wir digihîştin hev û ji xwe re diaxivîn. Hîn şevê din dîsa li wir hev dîtibûn lê bêrikirineke wisa ketibû dilê wê te digot qey ev salek e nedîtîye. Ji ber wê dixwest ku wî bibîne. Him wê bêriya xwe kêmîr bikirina, him jî wê ji bo êvarê randevû dabûna hev. Beriya ku bikeve hundirê hewşê cara dawîn li dora xwe nihêrî. Dît ku wa ye Elî li hemberî wê rûniştîye û lê dinihêre. Xezalê jî lê nihêrî, kefa destê xwe danî ser lêvên xwe, maç kir û bi ser Elî de pif kir. Bi îşareta destan randevûya êvarê dan hev û Xezal bi lez ket hewşê. Devliken û bi coş bû.

Gava ku ket hewşê bêhna xwarinê li nav rûyê wê da. Wê demê fêr kir ku birçî

bûye. Derbasî medbexê bû û ji paş ve destê xwe di stûyê dayîka xwe re bir û rûyê wê maç kir. Dayîka wê got “Xêr e dînê îro kêfa te li cih e.” Wê jî got “Weleh nizamî dayê, îro pir bi kêf im, bêhna xwarina te ez pirtir birçî kirim.” Hema li ser lingan hinek bacan, xirtik û balicanên qelandî xwar û derbasî odeya xwe bû.

Di odeyê de çû vî aliyî û wî aliyî, carinan li ser qenepeyê rûdinişt, serê xwe dixist nav her du destên xwe û wê êvarî çî ji Elî re bibêje, yek bi yek bi dengekî bilind ji xwe re digot; “Elî ez ji te pir hez dikim, bêtî te ez ne rojekê, saetekê jî najîm.” Û bi sedan tişt di hişê wê de derbas dibû. Tiştên ku wê êvarê bibêje yek bi yek di hişê xwe de derbas kir. Qedereke din jî di odeyê de çû û hat, piştî li ber dolaba xwe sekinî, devê wê vekir, kil û kildank, dermanê lêv û rûyan derxist, deriyê dolabê girt, eynik danî ser dolabê û li xwe nihêrî. Destê xwe li rûyê xwe gerand. Ji nav birûyên xwe çend mû bi mûçingê kişand, bi qelemê birûyên xwe reş kirin. Hinek krem bi rûyê xwe da û bi destan baş miz da. Piştî hinek pûdra û piştî wê jî hinek dermanê sor li hinarikên rûyê xwe da.

Xezal jixwe xweşik bû, piştî ku xwe meqyaj ji kir, hîn zêdetir xweşik bû. Mirov digot qey hîva çardehşevî ye. Mirov şerm dikir ku lê binihêre, alavên xwe yên meqyajê kirin dolabê û kirasekî zer derxist, li xwe kir. Çû ber eyneya mezin, li xwe nihêrî, li vî aliyî û li wî aliyî zivirî û baş li xwe nihêrî. Wek ku tiştê jî bîr kiribe hat ber dolabê cotek guhar derxist û bi guhê xwe ve kir. Roniyê da guharan, guhar biriqîn. Şewqa wan da hinarikên rûyê wê, xweşikiya wê zêdetir bû. Heger horî hebin, wê kêlikê Xezal horiyek bû. Hinek misk û ember li xwe kir, dawiyê paşla xwe vekir û hinek misk li nav singên xwe jî kir. Dîsa çû ber eynê û bi lez zivirî, bi zivirandina wê re bêhna misk û emberê li odeyê belav bû. Di wê rewşê de dengê dayîka wê melûl hat guhên wê “Keça min were şivê bixwe.”

Li ser sifreyê Xezal xwişk, bira, dê û bavê wê kom bûbûn. Xwarina xwe xwarin. Xezalê jixwe dema ku ji nav dehlê

hatibû xwaribû. Heyecana li ser jî pir bûbû. Ji ber wê xwarin nedixwar û te digot qey ne li wir e. Lixwekirina cilên nû, meqyaj û bêhna misk û emberê bala bavê wê kişand.

- Keça min xêr e te xwe wisa xemilandiye.

- Ez ji nav dehlê hatim, min pir xwê dabû, ji ber wê min xwe şûst û min xwest ez bizanibim ev kiras li min tê yan nayê.

Dayîka Xezalê dizanibû ku Xezal rast nabêje lê qet dengê xwe nekir. Jixwe dema ku Xezal ji nav dehlê hatibû, ev guherîn pê re dîtibû. Û zanibû ku ew û Elî hema bê her şev hev dibînin. Dengê xwe ji wê re nedikir. Carekê got; “Keça min, tu û Elî êvaran hev dibînin, rojekê bavê te, birayê te, kurapê te we bibîne dê we bikuje, ji ber wê hay ji xwe hebin.” Tu deng ji Xezalê derneket û ji wê rojê pê ve jî dengê xwe qet nekir.

Piştî şivê çaya xwe vexwarin, Xezalê dixwest ku bavê wê here. Jixwe her êvar bavê wê diçû civatan. Lê îşev qet xwe tevnedar. Wisa rûniştibû. Dengê gumeguma lingan ji ser ban hat. Ev îşareta Elî bû. Xezal ji ber bavê xwe nikaribû here randevûyê. Piştî qederekê bavê Xezalê xwe kom kir û ji malê derket. Qederê pênc deqîqeyan Xezal jî derket û li devê kadînê Elî li benda wê bû. Çawa gihişt cem Elî, xwe bi şid avêt stûyê wî û tevde ketin kadînê.

Destên wan di stûyê hev de, li ser kayê rûniştin. Elî matmayî mabû, ev çend sal bûn têtikiya wan bi hev re hebû. Kêm şevan ne tê de her şev hev didîtin. Lê belê tu caran wekî niha nêzî hev nebûbûn. Carinan dema ji hev qut dibûn bi serê lêvan rûyê hev maç dikirin lê îro çawa Xezalê Elî dît xwe dadayê û ew hembêz kir. Lê ew ji Elî re ne xem bû, niha Xezal li cem rûniştiye û destê wê di stûyê wî de ye, bes e. Bêhneke xweş ji Xezalê dihat, vê bêhna xweş dikir ku firnikên Elî rabin û rûnên. Elî bêhna ku ji Xezalê dihat hemû dikişand nava xwe û di dilê xwe de digot “Xwezî ev bêhn her dem di nava min de bima.” Qedereke wisa bê deng bêhna hev kişandin nava xwe. Xezalê ev bédengî xera kir.

- Elî tu dizanî ez ji te pir hez dikim. Ez bêtî te nikarim bijîm, dixwazin van rojan min bidin kurapê min ê Miho. Ez ji te re sond dixwim ku tiştêkî wisa çêbibe, di şeva pêşin de ez ê xwe bixeniqînim, jiyana bêtî te bila bikeve bin erdê.

Piştî axaftinê hîn bêtir xwe bi Elî ve şîdand. Bêhna xwêdan û cixareya Elî dikîşand nav kezeba xwe.

Elî jî Xezal ber bi xwe ve kişand, eniya wê maç kir. Xezal ji heyecanê wisa sor bûbû ku nayê gotin. Bêhna xwe bi şîd dida û distend. Qefesa singê wê radibû û rûdinişt. Te digot qey wê ji cihê xwe derkeve. Elî xwe ji eniyê ber da rû, ji wir xwe berda lêvan, qederekê lêvên wan li hev aliqîn, di wê kêliyê de Xezalê dest avêt bişkoka lampeyê û vemirand. Piştî demeke din laşê wan bi hev re bû yek. Di perestgeha pîroz, erda tovê jiyanê de bûn yek. Di tariya şevê de nalîneke wisa hêdî ji Xezalê hat.

Elî û Xezalê cilên xwe li xwe kirin, qederekê bédeng li hev nihêrin. Hê nedixwestin ji hev qut bibin, lê mixabin dema qutbûnê hatibû. Elî Xezal hembêz kir û maç kir. “Êdî tu ya min î ez jî bêtî te nikarim bijîm, em ji hev biqetin heta sibehê, ez ê çareseriyekê jê re bibînim.” Xatir ji hev xwestin û Elî berê xwe da malê û Xezal jî hilkişiya jor. Dema dayîka Xezalê ew dît şik ket dilê wê, baş bala xwe da Xezalê, li dawîya kirasê wê çav bi xwînê ket. Wê demê fêr kir û got “Xezal keça min te baş nekir.” Û hêşiran xwe ji her du çavên wê berdan xwarê. Xezal çû odeya xwe û lambe vemirand.

Derengî şevê deriyê Elî hat lêdan. Rabû ser xwe û hat ber derî û got “Ew kî ye?” Dengê li paş derî got “Elî derî veke, tu belkî me nas nakî lê em te nas dikin, Xebat em şandin.”

Elî ji wan bawer nekir, jixwe van rojan êvaran hinek tîn mirovan dibin û dûre kes wan nabîne. Xebat jî gotibû “Elî, êvaran bê randevû kî were bila were, ez jî bim derî veneke.” Elî bîstekê fikirî û dûre got “Ez Xebat nas nakim û derî jî ji we re venakim.” Yên li paş derî, derî şikandin, çewalek kişandin serê Elî û bi lez derketin çûn. Dayîk û bavê wî, cîranên wan

şiyar bûn û nalîn bi gund ket. “Elî revandin, kontrayan Elî bir.”

Li biniya gund çewal ji serê Elî derxistin, destên wî li pişt wî girêdan, yekî cixareya xwe danî ser eniya wî û got “Tu û kê ne? Ew ên din li ku ne, bibêje... tu jî were bibe alîkar, em tiştêkî bi te nakin...” Elî bi tenê tiştêk digot; “Vir e, nizamim” Qederê du saetan wilo domiya yekî ji wan kêra xwe ya bi sûsta ji berika xwe derxist û avêt guhê Elî. Xwînê xwe bi qirixê de berda xwarê. “Ev ji mifteya min re” Yekî ji wan got “Ka bêvîla wî ji min re pêwîst e” kêr avêt wir jî. Elî got “Tirsonekino, min bikujin” Li wir çalek kolan û Elî bi saxî xistinê. Li welatê rojê yekî din ê ku dê neyê dîtin jî winda bû.

Dem derbas bû, roj li rojan qulibîn, meh di navberê de çûn, şeş meh derbas bûn. Vir de Elî, wir de Elî, Elî winda bû. Xezal her êvar diçû kadînê û bi dizî ji xwe re digiriya. Di vê navberê de Xezal jî ducanî bûbû. Dayîka wê pê dizanibû, lê ne ji Xezalê re û ne ji jî bavê Xezalê re digot. Bédeng dima. Bédengiya wê ji bêmecaliya wê bû. Bavê Xezalê guherîna di Xezalê de didît lê baş nizanibû ku çi ye. Rojekê Xezalê kar kir ku deriyê odeyê veke, nihêrî ku dê û bavê wê bi dengêkî nizm diaxivin. Bavê Xezalê digot “Zikê Xezalê werimiye, tu pê dizanî, çima wisa ye?” Dayîka wê got “Tiştêk tune ye, hinekî xurt bûye...” “Ez nizamim, heke tiştin hebin û hûn ji min veşêrin, hela Xezal tiştê ku ez difikirim kiribe, ez ê we bikujim. Ha sibê ez ê ji birayê xwe re bibêjim bila werin şîraniya wê bixwin.” Çawa ku Xezalê ev gotin bihîstin bi lez çû ket odeya xwe. Şeva ku çûbû ba Elî xwe çawa xemilandibû dîsa wisa xwe xemiland, ew kirasê zer li xwe kir, kiras piçêkî jê re teng bû. Destê xwe bi ser zikê xwe ve anî “Eliyê min” û dest bi girî kir. Piştî guharên xwe kirin guhên xwe û ji malê derket. Tevlî tariya şevê bû û ber bi çemê Dicleyê ve meşiya. Gotinek ji nav lêvên wê filitî “Elî ez a te me...Elî...Elî...E...lîîî” û di tariya şevê de winda bû.

Şanoya bê dik

Tilîkên bi pirç, ji koncala navikê derketin, li qûna qumandayê lefiyan, bişkok dewisî. Bîst zilam li dû gogeke biçûk. Bîst hezar dev bi dengê... Hîrîna qebe, odeya biçûk hejand. Tilîkên nermik qumanda ji nava tilîkên bi pirç rakişand, qûna bişkokê tune bû, wê rovî tê re derketina. Çipên tenik û dirêj li nava stûr dişidiyan, porê zerik seriyê rewisî bawêşîn dikir.

Axîna odeya piçûk tevî ya televîzyonê bû.

-Ka tu jî wilo bikêr bihatayî.

Tilîkên bi pirç keviya navikê firkand.

-Hevala te baş zane bê ez bi kêrî çî tîm û çî nayê.

Çentê milan li mil (ne)edilî, kabokên qonderê ya dirêj di bin pahniyên tehenî de hejyan. Derî çiriya, tu guh li ser giriyê derî bel nebûn. Li derketinê, rûyekî zafêranî di bin porekî gij de fetilî.

-Hevala xwe nizamim, lê mîrê wê bi kêrî gelek tiştan tê.

Nevroz

- A soxî te ez kirim mîr.

- Çî mîrêkî bêsiûd im.

Qedera min bûye tog.

- Çî çaxa ku didim te, li bavê min xweş tê. Aaaaax! Hestî û jan, giran, giran û giran.

- Tu sêwiyeke deh salî yî û sih sal in ku qedera min tog e.

- Bavê min belqitî

û tu berî wî binax bûyî.

Demokrasî

Dît ku hat. Tilîkên wî bi bismika derî re kenîyan. Stûyê derî bi minetdarî veleriziya.

- Xewên şevan li min neherimîne. Qedexe, sêra deriyê xewnan jî betal bike, mifte di destê te de be, ez ê bibim demoqrasiyekî temam. Ez kêr bim, tu tune yî.

Qedexe hişk daçiviya. Devê nermik veleriziya:

- Heger ez lawê te bim, ji niha û wê de, kî tazî derket kolanan, ez ê wan nixumandî vegeirînim cihê ku jê derketine.

Roja ewil, ji nihanê pê ve tiştêk nema li ser bala tu kesî.

Roja duyem, nihan bi kêrî têrbûna tu kesekî/ê nehat. Dest nema ku her ro neyê gadan.

Bi zêdebûna zinêkarên darvekirî re, heywan jî bûn bênamûs.

H. Kovan BAQÎ